

**KT**  
**ZANÎNGEHA ÇEWLÎKÊ**  
**ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ**  
**BEŞA MAKEZANISTA ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ**

**HELBESTA ARJEN ARÎ**  
**(Naverok- Şêwe- Binyad)**

**TEZA LISANSA BILIND**

**Abdurrahim PESEN**

**(121302108)**

**Şêwirmend: Alk. Doç. Dr. Hüseyin ÇALDAK**

**ÇEWLIK-2015**

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Wêje ya Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmza)

Serok : .....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzayên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmza

.....

Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

## NAVEROK

|   |    |
|---|----|
| NAVEROK .....   | 2  |
| KURTE .....   | 6  |
| ÖZET.....   | 7  |
| SUMMARY .....   | 8  |
| PÊŞGOTÎN .....  | 9  |
| KURTEBÊJE .....   | 11 |
| DESPÊK.....   | 12 |
| BEŞA YEKEM .....  | 13 |
| 1. JIYANA ARJEN ARÎ Û ŞEXSIYETA WÎ YA EDEBÎ.....          | 13 |
| 1.1. JIYANA ARJEN ARÎ.....                                | 13 |
| 1.2. ŞEXSIYETA WÎ YA EDEBÎ .....                          | 16 |
| 1.3. Berhemên Wî .....                                    | 24 |
| 1.3.1. Helbest .....                                      | 24 |
| 1.3.2. Antolojî .....                                     | 24 |
| 1.3.1. Pexşan .....                                       | 24 |
| BEŞA DUYEMÎN .....  | 25 |
| 2. JI ALİYÊ MIJARÊ VE LÊKOLÎNA HELBESTÊN ARJEN ARÎ.....   | 25 |
| 2.1. Azadî .....  | 25 |
| 2.2. Çiya .....   | 30 |
| 2.3. Xwîn.....  | 33 |
| 2.4. Bajar .....  | 35 |
| 2.5. Ax.....  | 37 |
| 2.6. Mirin.....   | 40 |
| 2.7. Çîçek .....  | 42 |
| 2.8. Ajal.....  | 45 |
| 2.9. Erotîzm.....   | 48 |
| BEŞA SÊYEMÎN.....   | 51 |
| 3. JI ALİYÊ BINYADÊ VE LÊKOLÎNA HELBESTÊN ARJEN ARÎ ..... | 51 |
| 3.1. Çarîn.....   | 51 |
| 3.2. Nezma Serbest.....                                   | 55 |
| 3.3. Malik(Beyît).....                                    | 56 |
| 3.4. Şêweyên Din .....                                    | 57 |

|   |    |
|---|----|
| BEŞA ÇAREMÎN .....                              | 59 |
| 4. DI HELBESTÊN ARJEN ARÎ DE ZIMAN Û ŞÊWE ..... | 59 |
| 4.1. Hilbijartina Peyvan.....                   | 59 |
| 4.2. Dubarekirina Peyvan û Dengan .....         | 60 |
| 4.3. Nîgaş û Rêberdana Peyvan .....             | 63 |
| 4.3.1.Nîgaşên Belavbûyî .....                   | 63 |
| 4.3.2.Nîgaşên Noqbûyî.....                      | 63 |
| 4.3.3.Nîgaşên Radikal .....                     | 63 |
| 4.3.4.Nîgaşên Tîr.....                          | 63 |
| BEŞA PÛNCÊMÎN .....                             | 69 |
| 5.ŞÎR Û ŞÎROVE .....                            | 69 |
| 5.1. Ev Çiya Rûspî Ne.....                      | 69 |
| Sebra mino çiya.....                            | 69 |
| Cûdî.....                                       | 70 |
| Çarîn.....                                      | 71 |
| Berê min ketiye Xozatê.....                     | 72 |
| Ehzemeallahû ecrekûm .....                      | 74 |
| Çûkên Şer.....                                  | 74 |
| Nûçe .....                                      | 75 |
| Çûbe.....                                       | 75 |
| Her êvar.....                                   | 76 |
| Heyrano .....                                   | 76 |
| Çarînke .....                                   | 78 |
| Besê.....                                       | 78 |
| Dem payîz e.....                                | 78 |
| Gazîn .....                                     | 79 |
| Çarîn.....                                      | 79 |
| Tu jî dipê! .....                               | 80 |
| Çengek ax an jî rojekê helbet.....              | 80 |
| Çarîn.....                                      | 81 |
| Ev çiya rûspî ne.....                           | 81 |
| Xalxalokê .....                                 | 82 |
| Ev xwîna rijiyayî.....                          | 82 |
| Hij ceng e .....                                | 83 |
| Dilodîn im .....                                | 83 |
| Wêneya berêvarê û sikak .....                   | 84 |

|                                   |     |
|-----------------------------------|-----|
| Hewar!.....                       | 84  |
| Çarîn û xewn .....                | 84  |
| Yarê, bihar e!.....               | 85  |
| Axa bexşînkar.....                | 85  |
| Kol î poşman .....                | 85  |
| Tu bihata.....                    | 86  |
| 5.2. Şêrgele.....                 | 86  |
| Newal .....                       | 86  |
| Hey hewar! .....                  | 87  |
| Hesen.....                        | 87  |
| Ey ax! .....                      | 88  |
| Sirûda xorto.....                 | 89  |
| Koyê spî .....                    | 89  |
| Vegerim, te nebînim.....          | 90  |
| Keziyên kulîlkan .....            | 90  |
| Zayîn .....                       | 91  |
| Şêrgele.....                      | 91  |
| Hest û êvar.....                  | 93  |
| Behî .....                        | 94  |
| Hêvî.....                         | 94  |
| Îremkê .....                      | 95  |
| Ey yar .....                      | 95  |
| Serencam .....                    | 95  |
| Hewlêr im ez .....                | 95  |
| Şîrove .....                      | 96  |
| Kurmikek im .....                 | 97  |
| Assam ango oxir.....              | 97  |
| Ene Beyrût.....                   | 98  |
| .../07/2006 .....                 | 99  |
| Mamik .....                       | 99  |
| Sûretên hisretê û keservedan..... | 100 |
| Bihar.....                        | 100 |
| Û tu neyê? .....                  | 100 |
| Şeş rêz gazîn.....                | 101 |
| Li dû .....                       | 101 |
| Bendî .....                       | 102 |

|                                 |     |
|---------------------------------|-----|
| Bêbavê.....                     | 103 |
| Têm .....                       | 103 |
| Kulîlk hene .....               | 104 |
| Pîrs .....                      | 104 |
| Ji kişweran payîz e niha! ..... | 104 |
| Tembî .....                     | 106 |
| Çarîn.....                      | 107 |
| ENCAM .....                     | 108 |
| ÇAVKANÎ .....                   | 110 |

## KURTE

Arjen Arî nivîskarekî/helbestvanekî Kurd ê nûjen e. Wêjeya nûjen piştî şoreşa pîşesaziyê geş bûye û li nav gelan belav bûye. Taybetmendiya wê bi qayde û rêzikan ve girêdayî nîne. Di helbestê de her mijar hatiye ceribandin. Helbest piranî bi nezma serbest hatine nivîsandin. Arjen Arî beşa ziman û wêjeya Tirkî qedandiye. Ango wêje di rihê wî û qedera wî de heye. Hevîrtirşê helbesta xwe ji dîroka gelê xwe û cîhanê girtiye û piştî hevîrê xwe straye. Her çiqas pirtûkên wî yê din hebin jî hunera wî ya eslî helbest e.

Arî, di wêjeya Kurdi ya nûjen de helbestvanekî serbixwe ye. Di aliyê mijar û şeweyê de dengê zelal û rengê xweş li helbesta kurmancî kiriye. Ji bo vê yekê me xwest em li ser helbestên wî bixebitin.

Xebata me ji pênc beşan pêk tê. Me di beşa yekemîn de di derheqê jiyan û berhemên wî de agahî dan. Di beşa duyemîn de me ji alî mijarê ve berhemên wî nirxandin û mijarên ku di helbestên wî de derketine pêş, me raxiste ber çavan. Me di beşa sêyemîn de helbestên wî ji aliyê binyadê ve nirxandin û di beşa çaremîn de me ziman û şeweya helbesta wî lêkoland. Beşa pêncemîn jî me bi navê “şî’r û şîrove” çêkir û helbestên ku di sê pirtûkên wî de cî digirin me şîrove kirin. Bi vî şiklî me helbestvanî û poetîka Arjen Arî derxiste holê.

## ÖZET

Arjen Arî modern bir Kürt yazar/şairdir. Modern edebiyat sanayi devriminden sonra gelişmiş ve milletler arasında gelişim göstermiştir. Önemi, kurallara bağlı olmamasıdır. Şiirde her konu denenmiştir. Şiirler genellikle serbest tarza yazılmıştır. Arjen Arî Türk Dili ve Edebiyatı bölümünü bitirmiştir. Yani edebiyat hem ruhunda hem kaderinde vardır. Şiirinin mayasını kendi milletinin ve dünyanın tarihinden alıp kendi şiirinin hamurunu yoğurmuştur. Diğer alanlarda kitapları bulunsa da asıl hüneri şiirdir.

Modern Kürt edebiyatında bağımsız bir şairdir. Konu ve üslup bakımından Kürt şiirine berrak bir ses, farklı bir renk katmıştır. Bu nedenden ötürü onun şiirleri üzerinde çalışmak istedik.

Çalışmamız beş bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde yaşamı ve eserleri hakkında bilgi verdik. İkinci bölümde şiirlerini tema bakımından değerlendirip öne çıkan temalar üzerinde durduk. Üçüncü bölümde şiirlerini yapı bakımından incelerken dördüncü bölümde şiirlerini dil ve üslup bakımından inceledik. Beşinci bölümde ise “Şiir ve Yorum” adı altında üç kitabındaki şiirleri yorumladık. Bu şekilde Arjen Arî’nin şiir dünyasına yolculuk ettik.



## **SUMMARY**

Arjen Ari is a modern Kurdish author and poet. In 1956, he was born in Çale village in Ömerli town in Mardin, Turkey. He studied Turkish Literature and Language Department and graduated from it. The new literature was both in his soul and his fate. He took the essence of poetry from his own people and world`s history and mixed it with his own style and created a new style. He has books about other areas and his main mastery is poetry.

He is an independent poet in modern Kurdish Literature. In terms of subject and manner, he brought a new tone and a different color. That is why, we wanted focus on his poetries.

Our study contains five parts. In the first part, we have given information concerning his life and his pieces. We evaluated his poetries in terms of theme and focused on important themes in the second part. In the third part, we examined the poetries in respect to structure. We tried to survey his poetries with regard to manner and language in the forth part. And in the last part, we interpreted his poetries in his three poetry books with the name of “ Comment and Poetry”. In this way, we made a journey in Arjen Ari`s poetries` world.

## PÊŞGOTÎN

Wêjeya her milletî li ser sê kokan diedile. Ev; ya gelerî, ya klasîk û ya nûjen e. Wêjeya Kurdî jî bi vî awayî peyda bûye û heta îro dewam kiriye. Arjen Arî bi nasnameya xwe ya helbestvanî gelek balkêşe. Me xwest ku em li ser mîrateya Arî bisekinin.

Navê xebata me “Helbesta Arjen Arî, Naverok-Şêwe-Binyad” e. Nigaş û şibandinên wî, zanyariya wî ya dîrokî û wêjeyî, hunera wî ya helbestê wî nemir dike. Ji aliyê psîkanalîzmê de jî nirxandina helbestên wî pêwîst e.

Xebata me ji pênc beşan pêk tê. Me di beşa yekem de derheqê jîyan û huner û berhemên wî de agahî dan. Di beşa duduyan de helbestên wî ji alî mijarê ve me nirxandin. Binyada helbesta wî di beşa sêyemîn de hate lêkolandin. Di beşa çaremîn de şêwe û zimanê helbesta wî me da ber çavan. Di beşa dawîn de jî me hinek şîrên wî şîrove kirin.

Destpêkirina min a vê xebatê di vê gotina me ya pêşiyar de vêşartiyê: “Min da avê, avê da navê.” Min nizanibû ez dê çawa bixebitim, dê çawa vî karî bibim sêrî. Piştî min li tezên ku li ser wêjeya Tirkî hatine amadekirin mêtandin, di nava van de jî teza Ahmet Faruk Güler a ku li ser helbestên Cemal Süreya xebitîbû ji bo min bû nîşandek.

Zehmetiya me ew e ku li ser wêjeya Kurdî li Tirkiyê xebatên akademîk gelek kêmtir in. Xebatên ku hene jî bi piranî li ser wêjeya kevî û gelerî ne. Ev xebat jî ne akademîk in ku hin wêjehezên Kurdî keda xwe ya şexsî ew amade kirine.

Min di serî de pirtûkên helbestên Arî xwendin û piştî xwendina pirtûkan, tesnîfkirina wan û tespîtkirina mijar û şeweyên ku bikar anîne kirin. Dûvre di pirtûkên wî yê pexşan de jî min fikr û ramanên wî yê li ser wêjeyê derxistin holê.

Ez di pirtûkên Arjen Arî de bi piranî li ser “Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî”, “Ev Çiya Rûspî Ne” û “Şêrgele” sekinîm. Ev her sê pirtûk ji aliyê şêwe û mijarê ve binyada helbesta wî çêdikin. Pirtûka wî ya “Çil Çarîn” terzek cuda û serbixwe ye. Pirtûkek Arî jî bi navê “Erotîka”yê heye. Pirtûka wî ya “Şî’ir û Sînor” û “Payîza Peyvê” ji aliyê hunerê ve bi qasî pirtûkên wî yê din xurt nînin. “Destana Kawa û Azhî Dehaq” jî bi şiklê mesnewiyê hatiye nivîsandin. Naveroka xwe ji “Destana Kawa” girtiye. Ji bo vê yekê ez bi kurtasî li ser sekinîm.

Ez bawer im ku ev xebat tevî kêmasiyên xwe ji bo wêjeya Kurdî ya nûjen bibe gavekî piçûk. Hêviya me ew e ku helbestvan û helbestên Kurdî ji vir şûn de bi hişmendiyek rûmetdar bînin nirxandin. Hest û ramanên ku di nava rêzên helbestê de veşartîne dê derkevin holê. Bi vî awayî dê di nava wêjeya dinê de cih û warê helbesta Kurdî kifş bibe.

Di amadekirina vê tezê de cefa û keda pir kesan heye. Di serî de birêz Doç. Dr. Nusrettin Boleli, şêwirmendê min birêz Alk.Doç.Dr. Huseyin Çaldak, Alk.Doç.Dr.Zahir Ertekin û mamosteyên ku bi hestên kurdewarî dihatin dersa min û xwendevanên pola min re gelek spas dikim. Di peydakirina pirtûkan de ji bo alikariya hevalê min ê hêja Ömer Faruk Kaya re, ji bo nişandana rê û rêbaza tezê alikariya hevalê min ê hêja mamoste Nedim Altın re jî gelek spas dikim.

**Abdurrahim PESEN**

**Çewlik-2015**

## KURTEBÊJE

|                 |         |
|-----------------|---------|
| Binêrin         | bnr.    |
| Berawird bikin  | ber.    |
| Heman berhem    | h.b.    |
| Berhema navborî | b.n.    |
| Li jor binêrin  | bnr.jor |
| Li jêr binêrin  | bnr.jêr |
| rûpel           | r.      |
| Amadekar        | amd.    |
| Wergêr          | wer.    |
| Çap             | ç.      |
| Cild            | c.      |
| Jimare          | j.      |
| her wekî din    | hwd.    |

## DESPÊK

Wêjeya her milletî li ser sê kokan diedile. Ev; ya gelerî, ya klasîk û ya nûjen e. Wêjeya Kurdî jî bi vî awayî peyda bûye û heta îro dewam kiriye. Çi ji warê klasîk de, çi ji edebiyata gelêrî de, çi jî ji warê edebiyata nûjen de be kurdî zimanekî dewlemend e.

Edebiyata kurdî ya nûjen di vê sedsala dawî de ji dayîk bûye, mezin dibe û ber bi kemilînê ve diçe. Ji gelek cureyên edebiyata kurdî ya nûjen; helbest, roman, çîrok, ceribîn û hwd. berhem hatine dayîn û di vî warî de helbestvan û nivîskarên jêhatî derketine. Ji ekola Hawarê bigre heta Kurdên dîasporayê li dor kovarên edebî û çandî gelek nivîskar û helbestvan gihiyane.

Helbesta kurdî, piştî serdema helbesta klasîk di serê sedsala 20. de modernîzm jî naskiriye û êdî bi tevî helbesta klasîk helbesta nûjen jî ketiye nav jiyana rewşenbîrên kurdan. Di edebiyata nûjen a kurd de gelek helbestvanan bi nezma serbest helbest nivîsandine ku yek ji van helbestvanan jî Arjen Arî ye.

Navê xebata me “Helbesta Arjen Arî, Naverok-Şêwe-Binyad”e. Nigaş û şibandinên wî, zanyariya wî ya dîrokî û wêjeyî, hunera wî ya helbestê wî nemir dike. Ji aliyê psîkanalîzmê de jî nixandina helbestên wî pêwîst e.

Xebata me ji pênc beşan pêk tê. Me di beşa yekem de derheqê jiyana û hunera û berhemên wî de agahî dan. Di beşa duduyan de helbestên wî ji alî mijarê ve me nixandin. Binyada helbesta wî di beşa sêyemîn de hate lêkolandin. Di beşa çaremîn de şêwe û zimanê helbesta wî me da ber çavan. Di beşa dawîn de jî me hinek şîrên wî şîrove kirin.

Min di serî de pirtûkên helbestên Arî xwendin û piştî xwendina pirtûkan, tesnifkirina wan û tespîtkirina mijar û şêweyên ku bi kar anîne kirin. Dûvre di pirtûkên wî yê pexşan de jî min fikr û ramanên wî yê li ser wêjeyê derxistin holê.

Ez di pirtûkên Arjen Arî de bi piranî li ser “Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî”, “Ev Çiya Rûspî Ne” û “Şêrgele” sekinîm. Ev her sê pirtûk ji aliyê şêwe û mijarê ve binyada helbesta wî çêdikin. Pirtûka wî ya “Çil Çarîn” terzek cuda û serbixwe ye. Pirtûkek Arî jî bi navê “Erotîka”yê heye. Pirtûka wî ya “Şî’ir û Sînor” û “Payîza Peyvê” ji aliyê hunerê ve bi qasî pirtûkên wî yê din xurt nînin. “Destana Kawa û Azhî Dehaq” jî bi şiklê mesnewiyê hatiye nivîsandin. Naveroka xwe ji “Destana Kawa” girtiye. Ji bo vê yekê ez bi kurtasî li ser sekinîm.

## BEŞA YEKEM

### 1. JIYANA ARJEN ARÎ Û ŞEXSIYETA WÎ YA EDEBÎ

#### 1.1. JIYANA ARJEN ARÎ

Arjen Arî li bajarê Mêrdînê li herêma Omeryan li gundê Çalê di sala 1956an de hatiye dinyayê. Navê wî yê rastîn Daraulkeys Akay e. Bi gotina wî “Ji wî welatî me; welatê helbestên nebihîstî...”<sup>1</sup> Hê çar pênc salî bûye ji gund bar dîkin diçin navçeya Nisêbînê. Wê demê bavê wî bi kuştina leşkerekî tê tawanbarkirin û sê salan di hepsê de dimîne. Heps Arî hînî cixareyê dîke. “Ez bi saya wê hepsê hînî cixareyê bûm.”<sup>2</sup> Jiyan rengê wî diguherîne, bozîkbûna wî diçe, esmeriya genimgûnî xwe lê dipêçe. Diya wî dibêje qey xwe boyax kiriye. “Hetanî 1969an jî bozîk bûm, bû 1970, ez hatim Mêrdînê û ez guherîm. Piştî çend heyvan diya min got ‘Wî lawo te porê xwe boyax kiriye?’”<sup>3</sup>

Dibistana seretayî li Nisêbînê ya navendî û lîsê jî li Mêrdînê li “Vakıflar Yurdu” yê dixwîne. Ew dixwaze beşa edebiyatê an jî ya rojnamegeriyê bixwîne. Bi zexta apê xwe pêşiyê beşa matematîkê hildibijêre, paşê xwe li “Türkçe”yê digire.<sup>4</sup> Li Enqerê serî li rojnamegeriyê bixe jî ji ber ku mesrefên wê zêde ne naxwîne. Di sala 1974an de diçe Stenbolê, “Kızıltoprak Eğitim Enstitüsü” lê bi gotina wî nizane ji bo çî çûyê.<sup>5</sup>

Hê beşa mamostetiyê neqedandiyê li “*Su İşleri*”yê wek teknîsyenê avahiyên dest bi xebatê dîke. Piştî ku dibistan diqede bi emrê qeymeqam li Nisêbinê dersên edebiyatê dide. Lê xwendevan piçekî beredayî ne. Beriya 12ê Îlona 1980an ji wan re helbestên Cegerxwîn dixwîne. Ev yek li xweşa xwendevanan diçe. Dema ku 5, 10 deqîqeyan dereng dikeve xwendevanên halxweş bi teqşiyên xwe diçin dû. Lê ev hal zêde nadome. Di wan salan de êrîşek pêk tê û di wê êrîşê de beqçiyek tê kuştin, polîsek birîndar dibe û ji rûyê vê yekê 27 rojan li tûgaya Mêrdînê tê girtin. Piştî 12ê Îlonê jî 53 rojan di hundir de dimîne û mamostetiyê wî jî diqede.<sup>6</sup> Vê girtinê, bi navê “Çîroka 13 şev û 13 rojan” dîke helbest. Li wê derê gelek îşkence dîtiye. “Min nizanibû ku ez mirovekî ev çend zexm û xwedî xwe û hedan im. Piştî ku min ew qasî lêxistin xwar, min di dilê xwe

<sup>1</sup> Arjen, Arî, *Xasenezêr*, Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol 2013, r.15

<sup>2</sup> Arî, (2010, Gulan-Pûşber) Ji devê Arjen Arî jînenîgariya wî, Kovara W, 32, 56

<sup>3</sup> b.n., r.56.

<sup>4</sup> b.n., r.56.

<sup>5</sup> b.n., r.56.

<sup>6</sup> b.n., r.56.

de got: ‘Madem tu ev qasî dikarî li ber xwe bidî, çima te tiştên mezintir nekirin?’ Di 13 rojan de malik li min xera kirin. Wan ez biribûm cihekî taybet, cihekî kuştinê. Febrîqeya pembû hebû. Bêxwediyê te digot qey ji bo îşkencekirinê çêkirine. Min “Filistin askısı” li wir dît. Ev qas sal jî bihorîne rehtbûna çengê min hê jî wê demê ve ne. Nêzî 6, 7 heyvan jî min nikaribû pêl lingê yê çepê bikim. Ji ber ku dema îşkence kirin, ne jop bû, bi destîbivirekî li binê piyên min didan. Tesîr li hestî jî kiribû. Piştî wê lêdanê min nema tu lêdan xwar. Kaxizek bi min dan îmzekirin, xwedêgiravî îşkenceya ku li min hatiye kirin, ne wan kiriye.”<sup>7</sup> Bandora hepsê û îşkenceyan her tim di nava jiyana wî de ye. Dengê bêtêlan dema ku dibihîse bêhemdî xwe serê xwe dizivirîne.<sup>8</sup>

Di yazde saliya xwe de bavê xwe winda dike. Bi mirina bavê wî giraniya jiyane û semyantiya malê dikeve stûyê wî. “Bi mirina bavê min re du tişt man ji min re: semyantî û cixarekêşî! Her roj salek dihat ser temenê min.”<sup>9</sup>

Di zaroktiya xwe de trêna ku tê navçeyê meraq dike. Dixwaze lê siwar bibe û biçê û biçê. “Difikirim di ber xwe de û ji xwe dipirsim; ‘Ev trêna her roj çî dibe ji vî bajarî, çî tîne?’ Dixwazim rojekê li wê trêne siwar bibim û biçim û hey biçim...”<sup>10</sup> Herî zêde ji leyistika qalûç hez dike. Ji bapîrê xwe û ji kêra wî ya Mîdyadî hez dike.<sup>11</sup> Dapîra wî Fînce Xelîl mamosteyê wî yê ewil e, peyvên wê şîrîn şîrîn stranî ne. Her êvar çîrokên wê guhdarî dike. “...Her peyva wê mina şekirekî qulqulî, şîrîn şîrîn stranî bû. Û xweş wisa bû; piştî her vegotinê ekla çîroka ku digot di binê zimanê min de dihişt û diqedand. Lewma, her êvar mîna kitikeke bi pîrnîsîn xwe nêzî xwediyê xwe bike; bi qûnxişkê berûpê diçûm û min serê xwe yê ji paş de mîna şûnikekî li ser çonga wê diediland... Wekî niha tê bîra min: her şev xewnên min bi wan çîrokan dixemilîn. Ji wan çîrokan fêr dibûm ku mar kare xwe li zîlana derî bipêçe, dûpişk dikare bikeve sola meriv...”<sup>12</sup>

Piştî axa xwe diterikîne û li Amedê bi cih dibe û heta mirina xwe jî jiyana xwe li wê derê didomîne. Lê darên berû li wê derê tunene. Ev yek wî gelek xemgîn dike. “... ji roja ku ji ser wê axê dûr ketim û hatim di vî bajarî re derketim, çavên min bi dareke berûyê neketin! Hûn bibêjin; li bajareki ku darên berû tune bin çilo bijîm, çilo bimirim?”<sup>13</sup> Di karê dewletê de 25 sal û şeş mehan dixebite. Lê şa’irtî û karê dewletê bi hev re naçe.

<sup>7</sup> b.n., r.57.

<sup>8</sup> b.n., r.57.

<sup>9</sup> Arî, Arjen, *Bihoka Li Pişt Sînor*, Weşanên Avesta, Stembol 2010, r.50

<sup>10</sup> b.n., r.37.

<sup>11</sup> b.n., r.19.

<sup>12</sup> Arî, Arjen, *Kulîkên Be’îvan*, Weşanên Ronahî, Amed 2012, r.45

<sup>13</sup> b.n., r.49.

Xwe temamî dide nivîsê û heta diçe ser dilovaniya Xwedê jî dinivîse. Di sala 2012an de di 12ê Çiriya Ewil de li Amedê diçe ser dilovaniya Xwedê.

Di pirtûka xwe ya *Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekê* de jînenîgariya xwe bi zimanê helbestê wiha tîne ziman:

Ji herêma Omeriya, yekî Çalî

Digel ku diya min dibêje

“...dema miştaxan bû...”

Di nasnameyê de rojbûn 01.04.1956 e

Min du qîz hene û du kur, ma ne bese

Bîst sal e

Derwêşê tekiya helbestê me!...

El qise;

Nepênc carên binçavkirinê

Ne jî di sikaka wî bajarî de

Birîndariya birayê mirinê

Bû

Sedema ku vî welatî bihêlim

û biçim...

li dû bûyerekê hê jî di niçniçînim

ax xûşkê

kûçik nedan xatirê xwedî?!

992 de min rûyê jar yê Amedê dî

hûn bibêjin nişteçî

ez bibêjim penaberî heft sal e didome

qirika bi qul

axa bindest

jana dil

helbest...

min hij binefşê kir li dû çavên yekê!

û min temenek li ser nekir

geh ez westiyam, geh ew

geh bû rastiyek geh bû leylana derew



şox î helbest e ew!  
û ez li pey şaîrî evdal im  
merivno bê neweyî  
ev e name î halim!...

## 1.2. ŞEXSIYETA WÎ YA EDEBÎ

Şexsiyeta Arjen Arî ya edebî bi ziman ve girêdayiye. Ziman ji bo wî ewqas girîng e wek şertê îmanê dibîne. “Şertên îmanê şeş bin, şertê mirovbûnê li gel şert û erkên din, hima bêje yek e: ziman.”<sup>14</sup> Helbestên xwe cara yekem bi zimanê serdestan, bi zimanê biyanî nivîsandiye. Karê wî yê yekem rizgarkirin û fêrbûna ziman e. Ev tişt ne karekî hêsan e çimkî bi zimanê xwe perwerde nebûye, cardin zimanê wî qedexe ye. Piştî çend bûyeran, biryarê dide ku vî zimanê biyanî ji devê xwe biavêje. Ji ber tehd û lédana polês û leşkeran û gotina Mûsa Anter dev ji tirkî berdide. “Piştî hepsîtiya şeş heft rojan û pîrsa Mûsa Anter ya di rêwîtiyeke trêne de mişt bi gilî û gazinc ‘ma tu jî lawo?’ Min biryar da ku telaqê tirkîya têxime dest û ta ebed wê berdim.”<sup>15</sup> Rojekî leşker dev û bivêla wî di xwîne de dihêlin û ew jî biryarê digre ku telaqê tirkî bike destan. “Soxî; di berêvareke ku leşkerên bi zimanê wê diaxivîn, bi mahneya ku min xwe zêde nêzî têlên sînor kiriye ez dam ber hurmizk û pehînan û dev û bivêla min di gevzika xwîne de hiştin; û bi wî halî ji texma Kanîkan tela tela, bi mirûzekî tirş vegeyriyam malê; pîrqiniya ku bi ‘tirkîya’ ket û got, ‘ooxxx yaaan’, kir ku wê kêlikê telaqê wê têxim mistê!”<sup>16</sup> Bi telaq sondxwarin hêsan e lê bi kurdî nivîsandin pîrsgirêkek mezin e ji bo Arjen Arî. Bi hînbûna sê tîpan derê zimanê kurdî lê vedibe. “...Min telaqê ‘tirkîya’ xist destên wê, lê ez û vê ‘kurdiya’ ji zimanê hev fam nakin, heyran! Seyidxan, mîna ku zanibe derdê min çiyê, bişirî û got, tu li acizîya vî meyzên, lo...kuro ew Q, ev X ye, ev jî W ye... tiştêkî din?’ Piştî vê sohbetê ez bi ser zarê kurdiya vebûm.”<sup>17</sup> Carekê jî leşker li bavê wî didin û diya wî bi zimanê xwe dextlê ji wan dike lê kes wê guhdarî nake. Piştî çûna wan difikire ku zimanê wan maye di devê zarokên Kurdan de. Vê bûyerê jî wiha vedibêje: “Ji lew piştî 16 salên xitme ên di bişaftgehên bi al û sirûd de, di rojêke ku ew ziman bû serpozka postaleke reş û bi hiçka

<sup>14</sup> Arî, Arjen, *Xasenezêr*, Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol 2013, r.97.

<sup>15</sup> Arî, Arjen, *Bihoka Li Pişt Sînor*, Weşanên Avesta, Îstanbûl 2010, r.85.

<sup>16</sup> b.n., r.86.

<sup>17</sup> b.n., r.87.

li hestiyê birçî yê piyê bavê min ket; diya min xwe dexîlî xwediyê potînê reş kiribû, ku bi hurmizkan, bi pehînan li bavê min nedin. Lê xwediyê potînên reş guh nedabûn zimanê diya min û bi potînên reş û zimanê reş bavê min dabûn ber dahf û potînên reş werkiribû: ‘Rebbê min bela we bide !...biqêşitin...biqêşitin! Zimanê xwe jî bi xwe re bibin û herin!...’ Biçûna jî ji ber deriyê diya min ji ser axa wê zimanê xwe hiştibûn di devê milyon milyon zarokên mîna min de. Wê kêlikê bi kerbeke xwedîkuj min destê xwe avêtibû devê xwe û min zimanê wan kişandibû ji şikefta devê xwe... her ku min dikişand û derdixist ew dirêj dibû...”<sup>18</sup> Ev zimanê ku di devê wî de dirêj dibe ne zimanê goştinî ye. Zimanê ku meriv pê lihev dike ye, ji bo derhatina hest û ramanên merivan alavek e. “Bêşik û bêguman; ziman ne qetegoşteke di şikefta devê mirovî de; nasnameya mirov ya mirovî, nijadî û wêjeyî ye jî.”<sup>19</sup> Berhemên wêjeyî bi karê ziman tînin holê. Bi gotinek din ziman kirde ye. “Di wêjeyê de ziman, ne tenê alavek e: avahî, avakarî, şêwe û şêwaz, kewn û kemilandin û bi watekirina berhemê bi xwe ye.”<sup>20</sup> Cudahiya di nav mirovan de ya yekem ziman e, ziman nijadî û wêjeya merivan kifşe dike. Ew, ziman hebûna xwe dibîne, heger ew tunebe ziman jî tune ye. “Dibêjin ziman hebûn e, neyîna ziman jî tunebûn e. Ez jî dibêjim ziman ez bi xwe me. Ez tune bim, ziman jî tune. Ziman tune be, jixwe ez jî tune me!”<sup>21</sup>

Helbest û ziman hev û din xwedî dikin. Di helbesta Arjen Arî de ev yek gelek girîng e. Ji ber ku ew ji zimanekî bindest helbestekî nemir derdixe holê. Peyvên xwe ji şikefta ziman derdixe ber roja modernîteyê. Guliyê helbesta xwe bi toqeyên biwêj û bi gotinên pêşiyên şoret dike. “Helbest kaniya ku ziman jê dizê ye...”<sup>22</sup> Berê ziman hebe jî ji bo geşbûn û pêşveçûna wê helbest girîng e ku ziman bi xêra helbesta gelerî jiyana xwe domandiye.

Helbest dara peyvan e. Hêz û qeweta xwe ji wateya peyvan hildigre. Peyvên ji rêzê dikevin, rêzek din û helbest çêdibe. “Bi peyvên ji rêzê be jî helbest, helbest ne ji rêzê ye...”<sup>23</sup> Arî pênaseya helbestê wiha rave dike: “Helbest; peyva herî bi raz û efsûn û

<sup>18</sup> Arî, Arjen, *Xasenezzer*, Weşanên Evrensêl Basım Yayın, Stembol 2013, r.17.

<sup>19</sup> b.n., r.53.

<sup>20</sup> b.n., r.105.

<sup>21</sup> b.n., r.59.

<sup>22</sup> Arî, Arjen, *Xame Sihurî Kaxiz Şiyar Ma*, Weşanên Ronahî, Amed 2013, r.135.

<sup>23</sup> b.n., r.134.

evçend jî dilsoj! Evçend dilsoj e; mîna pirpirîneka bask mişt hez, li dora rewnaqa sotîner perwaneye geh, geh diwane...<sup>24</sup>

Di mabeyna helbestvanan û welatên wan de têkiliyên zexm hene. Erdnigar rengê jiyana merivan a rojane, dengê mirina merivan a xwezayî kifş dike. Bandorên li ser jiyane, merivan neçarî jiyaneke sun'î dike. Meriv wek jûjiyan serê xwe dixê nav striyên xwe. Li welatê Arjen Arî jî helbestên nebihîstî hene. “Ji wî welatî me; welatê helbestên nebihîstî...”<sup>25</sup> Çiyayên welatê wî helbestên evînên bêmirad dinehwirînin. “Ez ji wî welatî me... ji welatê ku çiyayên wê helbestên evînên bêmirad dinehwirînin û digorînin di ber xwe de...”<sup>26</sup>

Hêviya helbestvanan tunebe dibe ku helbest jî çênebe. Di jiyane de helbest kulek be hêvî derî ye. Arjen Arî jî hêvî û eşqê wek derî dibîne.<sup>27</sup> Hêviya herkesî heye. “Nanê tisî be jî hêvî, her mirov hêviyê dipurîsîne.”<sup>28</sup> Hêvî li aliyekî ala xwe ba dike li aliyê din mirin dara jiyane dipurîsîne.

Piştî van agahiyan em li ramanên wî yê li ser helbestê binêrin. Gelo Arjen Arî di bin bandora helbestvanan de maye an na? Wekî din ew ji kîjan cûreyên helbestê hez dike? Helbestê çawa dibîne? “Kî çi dibêje bila bibêje, bi min helbest ne qasekî; tibabekî bîr e! ku ne bîr be, helbest dê çawa karibe duh bîne îro, îro bi sibe, sibe bi siberojê ve ke...”<sup>29</sup> Di vir de eşkere kiriye ku helbestê mîna bîrê dihesibîne. Bîr di mabeyna duh û sibe de rola pirê dibîne. Fonksiyona ku daye helbestê armanc e, ango armancekî helbestê jî ev pir e. Heger bi vî çavî em li helbesta wî mêze bikin dê di honaka helbestê de raman û bîrdoz zêde bên dîtî. Azadî, mirin, xwîn çend temayên helbesta wî ne.

“Azadî kurd e mamo!

Azadî gerîn e bi fikîn li sirtên Kolk.

Azadî nêrîn e têr têr li yarê

Azadî meşîn e di kolanên Amedê de bê tirs

Û azadî mirin e ji kurd re, mamo

<sup>24</sup> Arî, Arjen, *Xasenezêr*, Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol 2013, r.15.

<sup>25</sup> b.n., r.15.

<sup>26</sup> b.n., r.16.

<sup>27</sup> Arî, Arjen, *Xame Sihurî Kaxiz Şiyar Ma*, Weşanên Ronahî, Amed 2013, r.73.

<sup>28</sup> b.n., r.86.

<sup>29</sup> Arî, Arjen, *Xasenezêr*, Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol 2013, r.71.

Nemirine, kî miribe li dû azadî.”<sup>30</sup>

Azadî û Kurd di nava ristên helbestê de bi ramanî hatine honandin. Azadiya di bîra Kurdan de hebûye dê sibe jî hebe. Helbest bi zimanekî sivik vê pirê ava dike.

Li Zanîngeha Dicleyê dema beşa zimanê Tirkî dixwîne di derbarê hin helbestvanên Tirk de dibe xwedî me’lûmat. “Ji bilî yên ku di dema perwerdehiyê de: Yahya Kemal, Cahit Sıtkı, Orhan Welî... nav û jiyan û hunera wan bi me dane zanîn, weke xwendevanekî şî’îrê, haya min ji Ulku Tamer, Salah Birsal, Hasan İzzettin Dinamo jî heye.”<sup>31</sup>

Ji şî’îra Ahmet Arîf a me’ala êş û kulan e hez dike lê cihê Nazim Hîkmet ji bo wî cuda ye. “Erê karteka li dil û li ruh a şî’îra Arîf, bi zimanekî din weke “me’ala”kul û êşan bû, lê cihê Nazim ê di dilê min de wê gavê jî cuda bû ji ber dengê wî yê bi qeb – qeb... û mîna çemekî boş.”<sup>32</sup>

Arjen Arî helbestvanekî dil nizm e, xwe gir nabîne. Ji ber ku helbest ne karê rojêkê ye. Helbest di destpêkê de dest pê dike û hê jî didome. “Her helbestkar bi qasî xwe, tevahiya helbestkarên beriya xwe ye.”<sup>33</sup> Wî jî hin helbest li wêjeya Kurdî zêde kirine û cihê xwe girtiye di nava helbestvanan de. Helbestvanên ku ji wan hez dike wek ‘bavê xwe’ dibîne. “Ez ne wekî mirov ne jî wekî helbestkarekî ne ‘bêberî’ me, ne jî ‘bêdawî’! Çawa ku ez ‘bavek’im wisa jî ez ne ‘bêbav’im! Ji bilî ‘baviti’ya biyolojîk; bavên helbesta min hene. Navê ‘bavekî’ min Xanî ye, yê yekî din Cegerxwîn e, yê yekî din Osman Sebrî ye...Û ez ‘bavitiya’ her bavî şanaz, kêfxweş û bextewar im!”<sup>34</sup> Arjen Arî rasterast di bin bandora helbestvanekî de nîne. Hezkirina wî ya Xanî, Cegerxwîn û Osman Sebrî ji fikrên wan ên netewî tê. Di alî şêweyê de helbesta wî serbixwe ye. Di cihekî din de jî wiha dibê je: “Wekî şa’îrekî feqîrhal, wekî kurdekî di nava kurdan de bi halê kurdan re hemhal; digel bindestî û bêderfetiye min xwestiye bi çavên neviyekî ji neviyên Xanî li xwe meyzînim. Ligel afirîneriya xwe ew hunerbazek e, hişmend û endazyarê hişê milî, zadeganekî hemû dewr û dewranan e!..”<sup>35</sup>

<sup>30</sup> Arî, Arjen, *Ev Çiya Ruspî ne*, Wêşanên Avesta, Stenbol, 2002, r.33.

<sup>31</sup> Arî, Arjen, *Xasenezzer*, Wêşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol 2013, r.74.

<sup>32</sup> b.n., r.74.

<sup>33</sup> b.n., r.125.

<sup>34</sup> b.n., r.126.

<sup>35</sup> b.n., r.61.

“Seydayê min ê ku ez xwe wekî şagirtekî ji dibistana wî dibînim Cegerxwînê mêlak û ceger bi xwîn...”<sup>36</sup>

Arjen Arî ji wêjeya kevn, ya modern û ya gelêrî haydar e. Seydayê Xanî wêjeya kevn de lûtke ye, seydayê Cegerxwîn hem ya kevn hem jî ya nûjen de lûtke ye. Wêjeya gelerî jî bi biwêj û gotinên pêşiyên di helbesta wî de cih digrin. Kêfa wî zêdetir ji helbesta gelerî re tê. “Gava ku dihizirim, têdigihim ku wê deme jî mîna aniha ji helbest û helbestkariya nêzî helbesta gelêrî hatiye!...”<sup>37</sup>

Pirtûka wî ya “Destana Kawa û Azhî Dehaq” bi formata mesnewiyê hatiye nivîsandin. Pirtûka wî ya “Çil Çarîn” bi formata “rûba’î/çarîn”ê hatiye nivîsandin. Helbestên wî yên din bi şeweyeke nûjen bi nezma serbest hatine nivîsandin.

Pêwendiya muzîkê û helbestê xurt e. Di helbestên wî de muzîkalîtek balkêş heye. “Pêwendiya muzîk û helbestê ne hewceyî destnîşankirin û ravekirinê cuda be jî; bi her helbestkarî re her helbesthez dizane ku di navbera helbest û newayê de pevgerîdanekê xurt, têkiliyê zexm heye.”<sup>38</sup> Hinek helbestên wî hatine bestekirin.

‘Jin’ temayeke cuda ye di nava helbestên wî de. Carinan xwîşk, carinan dayik û piranî hezkiriyên wî ne. Jin mîna findan ronahî ne. “Jixwe, jin findek e ku ne şev; roja meriv bi xwe ronî dike.”<sup>39</sup> Pirtûka wî ‘Eroûtîka’ bi van hestan hatiye nivîsandin. Wêje û jinê ji hev cuda nafîkire. Wêjeya ku jin têde tunebe dişibîne savara rijî. “Ji bilî jiyane; wêjeya bêjin ma ne ‘savara’ rijî ye.”<sup>40</sup>

Helbestvan bi hestên azadî helbestan binivîsin jî ji alî aboriyê ve tim azad nînin. Arjen Arî dixwaze ku helbestvan, nivîskar ji her aliyê ve azad bin. “Ez bi xwe hem azad im, hem jî girêdayî! Girêdana min berpirsiyariya li pêşberî civakê ye.”<sup>41</sup> Heger qewmên wan lê xwedî dernekevin dibêje ku azadiyê heq nakin. “Hûn bi Xwedayê min û xwe kin, qewmekî ku nikaribe şa’irê xwe xwedî bike meşrûiyeta nivîskar/helbeskar/hunermend di nava lep û lêvên bizavînan de be, ew qewm, ew gel, ew ax... azadiyê heq dike?!”<sup>42</sup>

<sup>36</sup> b.n., r.67.

<sup>37</sup> Arî, Arjen, *Xasenezêr*, Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol 2013, r.74.

<sup>38</sup> b.n., r.94.

<sup>39</sup> b.n., r.112.

<sup>40</sup> b.n., r.112.

<sup>41</sup> Loran, E. (2010, Gulan-Pûşber)Elîxan Loran bi Arjen Arî re Hevpeyvîn, Kovara W,32, 61

<sup>42</sup> b.n., r.29.

Têkiliya helbestvan û axa wan cuda dibîne. Dibêje axa xwe li xwe mahr kirine. Mahra merivan namûsa merivan e. Ji ber vê yekê barê helbestvanan giran e. “Her şa’irî mahra xwe bi axa xwe re birriye...”<sup>43</sup>

Karê nivîsê karekî pîrozwer dibîne.<sup>44</sup> Ew nivîskarê helbestan e ango ew helbestvan e. Lê ji xeynî helbestan pexşan jî nivîsandine. Bîranîn, kurteçîrok û ceribandîn... Zimanê wî yê pexşanê jî nêzikî helbestê ye. Wexta ku helbest têra wî nake dixwaze çîrok an jî gotarekî binivîse. “Carinan bi helbestekê bi ser dermanê vê nexweşiya xwe ve bim jî, mîna nexweşê ku êdî şirûb û hebik” têrî nekin, dixwazim “şiringa gotarekê” an jî a “çîrokeke kurt” li damara hestên xwe bidim, û bibêjim, “de... bikewin, de bihewin!”<sup>45</sup>

Nivîsandin aramiyekê dide ruhê wî. “Wek xwedê, piştî qedandina her helbestê bi qasî zarokek şîre ku ji pêsîrên dêya xwe têr têr vexwe, û pê re serî bixile bi ser xewa şîrîn de, ez jî piştî her nivîsê di xewlegeha wê kêlikê de bi ser aramiyeke Xudayî ve dibim.”<sup>46</sup>

Nivîsandin ne karekî hêsan e. Îlham tunebe nivîs jî naniqute ser kaxezê. “Lê carinan... carinan ku xulqê min teng dibe û ditengijim, tu teqerofê têxî cênîka min, ne destê min diçe pêûsê, ne jî pêûs diçe ber bi kaxizê ve.”<sup>47</sup>

Navê nivîskariyê giran e. Carinan poşman dibe lê karê din jî wêrekiyê dixwazin. “Me çi bi xwe kir ku me navê nivîskariyê bi pey xwe ve kir! Sih sal e min himaltî bikira ne çêtir bû? Yan jî daketima qada siyasetê û min zend û bend li hev badana û li ser navê wî gelê bindest û bêmêjk û bêhest bibûma şaremînê navçeyekê, bajarekî...?Lê ka...ka ew ceger ka ew wêrekî?”<sup>48</sup>

Di cihekî de şensê nivîskaran û yê qumarbazan dişibîne hev.<sup>49</sup> Ev têkilî ecêb e. Wekî din di mabeyna şa’ir û dara berûyê de têkiliyekî çêdike. “Li ser axa min şa’ir dara berû ye: Zexm, qurmstûr, qayimî, pîrgulî...”<sup>50</sup>

Kovara Wyê di jimara 32an de ji bo Arjen Arî dosye vekirîye. Di wir de pirsên Elixan Loran dibersivîne. Ji van pirsan yek sedemê di sêrê sê pirtûkên- Ramûsan Min Veşartin li Geliyekî, Ev Çiya Rûspî ne, Şêrgele- wî de bikaranîna gotinên pêşyan e. Ji bo vê yekê bersiva wî wiha ye: “Kek Berken Bereh jî ev tişt destnîşan kiribû. Lê ne şaş bim

<sup>43</sup> b.n., r.27.

<sup>44</sup> b.n., r.24.

<sup>45</sup> Arî, Arjen, *Gorî û Bindest*, Weşanên Ronahî, Amed 2012, r.45.

<sup>46</sup> b.n., r.45.

<sup>47</sup> b.n., r.46.

<sup>48</sup> b.n., r.46.

<sup>49</sup> Arî, Arjen, *Xame Sihurî Kaxiz Şiyar Ma*, Weşanên Ronahî, Amed 2013, r.59.

<sup>50</sup> Arî, Arjen, *Gorî û Bindest*, Weşanên Ronahî, Amed 2012, r.66

wî gotibû ‘Xwezî ev tişt nekiribûya.’ Ev bi zanîn hatiye kirin. Bi hersên gotinên pêşiyên min xwestiye ez deriyekî ji xwendevanan re vekim û bibêjim ‘Tu yê li van rast bêyî.’ Lê ya din jî temafîkiya wan e.”<sup>51</sup> Di pirtûka wî ya “Çil Çarîn”ê de gotinên pêşiyên û biwêj wek temayê hatine bikaranîn. Mebesta wî ew e ku çanda bav û kalan bi formateke nû ji mere bihêle.<sup>52</sup> Ji bo şeweya nivîsandinê jî wiha dibêje: “Min gotin hildibijartin û wisa dinivîsî.”<sup>53</sup>

Yek ji taybetiyên helbesta Arjen Arî jî dubarekirina deng e. Hema di hemû helbestên wî de dubarekirina peyvan heye. “Li gorî min ristesazî û bendesaziya di helbestê de rasterast notakirina peyvan a li ser kaxizê ye, jixwe.”<sup>54</sup>

“Ku dil bidî ji dil bide  
Dil didî dil bi dil bide  
Di ber de ser û cil bide  
Dil sa ye, dê bireyê!”<sup>55</sup>

Wexta ku meriv bala xwe didê dibîne ku tîpa ‘i, l, b, d’yê pir zêde dubare kiriye. Tîpa ‘d’yê 15, tîpa ‘i’yê 16, tîpa ‘b’yê 7, tîpa ‘l’yê 7 caran bikar aniye.

Arjen Arî li dû tiştên nû ye. Naxwaze kesekî din texlît bike. Di pirtûkên xwe de hertim şeweyên cuda bikar aniye. Çarîn, nezma serbest, mesnewî û şeweyên din peyitandina wê ye. “Çi çîrokê, çi helbestê tu nûtiyekê neynî, wê demê nivîs dê beyhûde be. Lêgerîna min a li xweserîya teşeyî û naverokî misoger e. Ev taybetmendiyeke min e.”<sup>56</sup>

Helbestvaniya wî hê lîse neqediya dest pê dike. “Berîya ku ez lîseyê biqedînim bi salekê, min dest bi helbestê kir.”<sup>57</sup> Helbest li serê wî dibe bela û helbestan bi şeweya klasîk dinivîse. Dixwaze here Swêdê bibe şa’ir. “Sala xwe amadekirina zanîngehê bû, lê helbest li serê min bû bela. Helbestên min bi şeweya klasîk bûn. Min dixwest biçim Ewrûpayê di sala 1969, 1970, 1971ê di wan deman de. Ez û Şerefxan Cizirî. Min digot ez ê herim Swêdê û bibim şa’ir.”<sup>58</sup> Li Tirkîyê bêdengîya helbestên Kurdî ya nûjen bi Kovara Tîrêjê deng dide. Kovar berî 12ê Îlonê 3 jîmaran derdixe. Arjen Arî, Berken Bereh, Rojen Barnas,

---

<sup>51</sup> Loran, E. (2010, Gulan-Pûşber)Elîxan Loran bi Arjen Arî re Hevpeyvîn, Kovara W,32, 60

<sup>52</sup> b.n., r.63.

<sup>53</sup> b.n., r.63.

<sup>54</sup> b.n., r.64.

<sup>55</sup> Arî, Arjen, *Çil Çarîn*, Wêşanên Enstîtuya Kurdî Ya Amedê, Stenbol, 2008, r.49.

<sup>56</sup> Loran, E. (2010, Gulan-Pûşber)Elîxan Loran bi Arjen Arî re Hevpeyvîn, Kovara W,32, 65

<sup>57</sup> Arî, A. (2010, Gulan-Pûşber)Ji devê Arjen Arî jînenîgariya wî, Kovara W,32, 56

<sup>58</sup> b.n., r.56.

Mem Ronga wek nifşên Tîrêjê derdikevin holê. Ji ber şertên siyasî emrê Tîrêjê pir dewam nake. “...Tîrêjê nikaribû bibe rojêke pir tîrêj û biçîrûse.”<sup>59</sup>

Edebiyat ji bo wî karê aboriyê nîne. Ji bo vê yekê xwe şa’ir nabîne. “Edebiyat, ne benê herî zexm ê di jiyânê de ez pê digrim e. Ji bo min edebiyat wek xwesêwixandinekê ye. Min ji xwe re nekiriye kar... Dema ku ez dinivîsim şa’ir im, jê pê ve ez mirovekî beredayî me.”<sup>60</sup>

Nivîs ji bo wî belkî ne karê aboriyê ye lê karê nivîsê jî her tim kiriye. Wexta ku dinivîse dixwaze aram be. “Taybetiya her nivîskarî cuda ye. Dema ku ez aciz dibim ez nikarim binivîsim... Divê pariyekî aram bim, pêlên min pariyekî rawestin.”<sup>61</sup>

Arjen Arî dibêje ku “wêje neteweyî ye, ya civatê ye. Wêje wêjeya zimanekî ye.” Tevgera wî bi vî rihî ye. Di helbestên wî de êş û elemên gelê wî hene. Lê tu carî jî helbest nekiriye qurbana mijarê. Mijar û şêwe mîna du baskên teyrê baz in di helbesta wî de. Piştî mirina Arjen Arî li ser navê wî salê carekê pêşbaziya helbestê tê saz kirin.

Ji bo helbesta Arjen Arî tiştên hatine gotin jî ev in:

Berken Bereh: “Arjen Arî di helbesta kurdî de bêguman stûneke qahîm û epîgrafeke çeleng e. Ew wek erdnîgariya xwe bi ber û rikeber û nêr e. Ew li tu kirasan nayê; xweser û resen e. Tu çi bikî jî nikarî wî li cihekî bi cih bikî û konê wî deynî.”<sup>62</sup>

Lal Laleş: “Qutabiyê zimanê xwe ye li mekteba şûaran.”<sup>63</sup>

Omer Dilsoz: “Ji ber hindê, mirov dişê bibêje ku Arjen Arî, ne tenê helbestvanî kiriye, di heman demê de bi peyva xwe endezyariya hest û ruhê zimanekî birîndar jî kiriye û ew aniyê di helbestên xwe de ji nû ve ‘xwedanrûmet’ kiriye.”<sup>64</sup>

Ferzan Şêr: “Û Arjen ramanek e... Di helbestên wî de tu carî mirov pêrgî perçebûnan nayê. Di helbestên wî de welatekî çarparçe nîn e.”<sup>65</sup>

---

<sup>59</sup> Loran, E. (2010, Gulan-Pûşber)Elîxan Loran bi Arjen Arî re Hevpeyvîn, Kovara W,32, 63

<sup>60</sup> b.n., r.56.

<sup>61</sup> b.n., r.56.

<sup>62</sup> Bereh, B. (2010, Gulan-Pûşber)Derwêşê tekiyeya helbestê Arjen Arî, Kovara W,32, 72

<sup>63</sup> Laleş, L. (2010, Gulan-Pûşber)Ji bo poetîkaya Arjen Arî çil deqdeqûsk, Kovara W,32, 74

<sup>64</sup> Dilsoz, O, A. (2010, Gulan-Pûşber)Di ‘arî’ya peyvê de ‘arjen’êke h-ar, Kovara W,32, 75

<sup>65</sup> Şêr, F. (2010, Gulan-Pûşber)Di helbestê de simbêlên Arjen, Kovara W,32, 76



### **1.3. Berhemên Wî**

Berhemên wî helbest, ceribandin û bîranîn in. Heşt pirtûk helbest in, yek bîranîn e sê pirtûk jî ceribandin in. Ji xeynî van Antolojiya Helbesta Bakûr weşandiye. Weşandina berhemên wî li gorî dîrokê wiha ne:

#### **1.3.1. Helbest**

- 1-Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, Wêşanên Avesta, (Çapa Yekem) Stenbol,1999.
- 2-Ev Çiya Rûspî ne, Weşanên Avesta, (Çapa Yekem) Stenbol, 2002.
- 3-Destana Kawa û Azhî Dehaq(Kurdî-Tirkî),Weşanên Evrensel Basım Yayın, (Çapa Yekem),İstanbul, 2011.
- 4-Eroûtîka, Weşanên Lîs, (Çapa Yekem), Stenbol, 2006.
- 5-Şêrgele, Weşanên Avesta, (Çapa Yekem), İstanbul, 2008.
- 6-Çil Çarîn, Weşanên Enstituya Kurdi ya Amedê, (Çapa Yekem), 2008.
- 7-Payîza Peyvê, Weşanên Belkî, (Çapa Yekem),Diyarbakır, 2011.
- 8-Şi'ir û Sînor, Evrensel Basım Yayın, (Çapa Yekem), İstanbul, 2013.

#### **1.3.2. Antoloji**

- 1-Bakûrê Helbestê/Antolojiya Helbesta Bakûr, Weşanên Evrensel Basım Yayın, (Çapa Yekem), İstanbul, 2011.

#### **1.3.1. Pexşan**

- 1- Bîhoka Li Pişt Sînor, Çîrok/Bîranîn, Wêşanên Avesta, (Çapa Yekem), Stenbol, 2010.
- 2- Kulîlkên Be'îvan, Hevbestîn, Wêşanên Ronahî, (Çapa Yekem), Amed, 2012.
- 3- Gorî û Bîndest, Vebêjî, Wêşanên Ronahî, (Çapa Yekem), Amed, 2012.
- 4- Xasenezêr, Ceribîn, Evrensel Basım Yayın, (Çapa Yekem), Stenbol, 2013.
- 5- Xame Sihurî Kaxiz Şiyar Ma, Ceribandin, Wêşanên Ronahî, (Çapa Yekem), Amed, 2013.

## BEŞA DUYEMÎN

### 2.JI ALIYÊ MIJARÊ VE LÊKOLÎNA HELBESTÊN ARJEN ARÎ

#### 2.1.Azadî

Azadî mijareke gerdûnî ye. Pir şa'îr û nivîskar li ser azadiyê mijûl bûne. Ji bo azadiyê di heps û zîndanên de emrê xwe derbas kirine û heta ji canê xwe bûne. Helbestvanê Tirk İsmet Özel ji bo azadî û helbestê wiha dibêje: “Hewceya helbestê bi azadiyê tune lê ya azadiyê bi helbestê heye.”<sup>66</sup> Helbesta Arjen Arî di binyadê de li ser du lîngan bilind dibe. Dûvre mijaran şaxên xwe dane. Ji van her du lîngan yek azadî ye yek jî evîn e. Şaxên azadiyê welat, bajar, xwîn, mirin û ax in. Ên evînê yar, jin û erotîzm in. Têkiliya wî û azadiyê mîna têkiliya ax û rojê ye. Azadiya ku dixwaze tev li xwezayê ye.

“Dîsa jî  
Masîko, dîsa jî  
Li ber xwe bide  
Behrên bêbinî li hêviya te ne;  
Li paşiya min e azadî...” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî r.12)

Navê vê helbestê “masîko” ye. Masî ajalek ku di nava avan de dijî. Av ji bo me parçeyeke ji jiyane be ji bo masiyan jiyane bixwe ye. Her tim li dora wan kemîn tî avêtin, tor tî girtin. Azadiya xwe û masiyê dide berhev. Ji ber ku pîr çem, pîr behr bi destên mirovên dest biqirêj hatine lewitandin. Di nava van şertan de jî masiyê hêvîtir dibîne ji xwe. Dibêje “Behrên bêbinî li hêviya te ne.” Dibe ku tu xwe bigihîniyê, lê li pêşiya min azadî tune, li paşiya min e azadî.

Li dû azadiyê dimeşe, lê digere dixwaze li gorî dilê xwe azad bibe. Ev azadî carinan bi *hebûna nanê tenûrê* ye.

“Nanek tenûrê jî hebûya  
Azad bûma hê çêtir;  
Jixwe bindest im...” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.16)

<sup>66</sup> Özel, İsmet, *Şiir Okuma Klavuzu*, Şûle Yayınları, İstanbul, 1997, r.55.

Ewqas li hesretî azadiyê maye ku nanê tenûrê jî parçeyeke ji azadiyê dibîne. Bindestiya xwe dizane lê hesreta azadiya xwe ji nanê tenûrê derdixe.

“Pale me li palûteyên biratiyê  
Tasa ava min spartî bayê çiyê  
Ji kaniyên mirovahiyê, ji avsarkên beriyê  
Devê min de bêlûteyên azadiyê”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî r.32)

Azadî û biratî destbirayên hev in. Ji bo biratiyê bi palûteyî dixebite. Kaniyên wî yên biratiyê ne. Kilama devê jî li ser azadiyê ye: *Devê min de bêlûteyên azadiyê*

Azadî û ax tevlîhev in. Azadî li ser axê ji binê axê tê der. Hesreta azadiya helbestvan di newayên bilûra şivên de dimeyên.

“Dêvla wê niha  
Serî min danîbûya çonga çemekî  
Li bilûrê bixista şivanekî  
Û azad bûma, tevlî axê...”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî r.46)

Azadiya tev li xwezayê azadiya rasteqîn e. Helbestvan bi hunera teşxîsê çem dişibîne însanan û dixwaze serê xwe dayne ser çonga wê. Meriv serê xwe yan dide ser çonga diya xwe yan jî ser çonga yara xwe. Çem diherike û li derdora xwe jiyaneke kesk ava dike û bêtirs diherike. Dê, yar û azadî bi hev re di têkiliyê de ne. Helbestvan tevlî axê, bi bilûra şivên, li ser çonga çemekî azadiyê xeyal dike.

“Azadî gotibim û bilandibim,  
...  
Azadî roj û bihar e, bi te  
Ji min re mirr e xanim!  
Ne kêm ne zêde  
Azadiyek divim canim  
Te bivê bide min di ser re  
Mînekar im;

Cotê memikan û xwe!” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.61)

Di vir de azadiya helbestvan bi yarê re ye. Azadî ne tiştêkî erzan e, rihet nakeve destê merivan. Yar jî ewqas zor û zehmet e. Yar û azadî li merivan nazên xwe dikin. Di nava xwezayê de bi tiştên xwezayê dide pêşberî merivan.

“Xwerrû buharek e serhildana êşa min

Van wexta

Li çiya arek e

Loma dil ketime azadiyê

Diya min got, dil mediyê!

Dil e ma naxwe?

Pî dame piyê çiyê

....

Loo ma ev jî bazarek e?!”

(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.68)

Êşa dilê helbestvan li biharek xwerû çûye. Êşa dilan ji arê evînê be û li ser çiyana be evîndara merivan azadî ye. Ji xwezayê hez dike ku hevîrê wî jî ji wê ye. Diya wî tembî dike, dibêje dil mede azadiyê lê ji bo helbestvan dildayîna azadiyê bazarek e. Di bazarê de qezenckirin jî heye windakirin jî.

“...

Sernişûv, fedîkar kê hiştim?

Star im, paxil im, al im.

Nebûm keleh neketim destên zalim

Bi xwedan û xwedî. Cûdî me

Ji şervanên azadiyê re pal im.” (Ev Çiya Rûspî Ne, r.12)

Di lîteratura Arjen Arî de azadî û çiya ji hev nayên qetandin. Mirov wexta ku li dû azadiya xwe dikeve berê xwe dide çiyana. Lê her çiya ji merivan re nabe star. Çiyayê Cûdî hem star e, hem jî pal e ji şervanên azadiyê re.

“..."

Zelal, ava qir qeşa

Çeng bi çeng bidim te jî,

Tu tî yî, tu tî!

Heyrano,

Tu têhnî li qurtek azadî!”(Ev Çiya Rûspî Ne, r.24)

Di virde jî azadî û jîyanê wekhev dibîne. Meriv wexta ku tî be dilê merivan ava zelal û sar dixwaze. Lê lehengê helbesta wî ya ku bi dengê “heyrano” bang dikê, tiyê azadiyê ye. Qurtek azadî jî tîbûna wî dibe.

“..."

Azadî kurd e mamo!

Azadî gerîn e bi fikîn li sirtên Kolik.

Azadî nêrîn e têr têr li yarê

Azadî meşîn e di kolanên Amedê de bê tirs

Û azadî mirin e ji kurd re, mamo

Nemirine, kî miribe li dû azadî.” (Ev Çiya Rûspî Ne, r.33)

Di vê helbestê de azadiyê bi pênc pênaseyên cuda bi lêv dike. Di rêza ewil de dibêje azadî kurd e, lê dizane ku kurd azad nînin. Vê paradoksa bêyom dixwe nav çavên mirovên sed sala bîstemîn. Piştî azadiyê dişibîne gerîna li sirtên Kolik. Û ew kesên ku ji evîndara xwe fedî dikin û bi rihetî lê nanêrin ne azad in, ji bo wan jî azadî bêtirs li yarê mêzekirin e. Di kolanên Amedê de bêtirs meşîn jî azadî ye. Di fînalê helbestê de mirin dibe azadî û di destên kurdan de diteqe.

“..."

Reş bûn ji xwe

Zivr zivr, kevanî

Reştir dibûn bi kilên siphani

Her çiya bi evînekê bi nav dibû

Û te, di çavên xwe de azadî xwedî dikir.” (Ev Çiya Rûspî Ne, r.58)

Helbestvan di navbera çavên yarê û azadiyê de têkiliyeke giran derxistiye holê. Ev yar ji bo azadiyeke mezin dibe ku terka evîndara xwe bike. Heger helbestvan azad bibûya wî sirf li ser kilên çavê yaran binivîsya. Navê yarê Sarya ye. Sarya ji heyatê koç kiriye. Û helbestvan ji mirina Saryayê hez kiriye. Sarya ev yara ku di çavên xwe de azadî xwedî kiriye.

“Azadî spî be, mirin jî spî ye  
Ne yek, artêşek lek bi lek li dû min  
Gelek kemînan kefen avêtin pêşiya min...” ( Şêrgele, r.16)

Di hişê helbestvan de azadî ewqas cih girtiye ku rengê xwe kifşe kiriye. Bi rastî di nava mirovan de rengê hêşîn rengê azadiyê ye. Û pir caran kevokên spî ber bi ezmanê şîn difirin û dibin sembola aşitîyê. Helbestvan jî rengê azadiyê dipirse. Ji bo çi rengê spî bala wî kişandiye? Di rêzên derbasbûyî de helbestvan qala mirin û azadiyê bi hev re kiribû. Kesên dimirin dikin nav kefenên spî û di qebra tarî de hiltînin. Wexta ku dikin binê axê azadiya wî bi wateyek din tê sînorkirin. Ew mirina ku di hişê Arjen Arî de ye, li piştî jiyaneke li dû azadiyê derbas bûye tê.

Li ser jiyana Arjen Arî azadî, yar û çiya gelek bibandor in. Ev hersê mijar di gelek helbestên wî de derbas dibin.

“Azadî rind, tu rind, çiya bilind.” ( Şêrgele, r.18)  
“Her taht pastarek, her şikeft parestgeh  
Kêlên namdariyê ne esseh, qûçên bêminetiyê  
Di tûrikê min de nanekî hişk, di destekî de mishef  
Bê xatir, min berê xwe da çiyayên azadiyê!” ( Şêrgele, r.20)

Helbestvan li dû azadiyê ye. Azadiya ku wîndî kiriye an jî ji destan hatiye girtin dibêje qey li serê çiyana e. Wexta berê xwe dide çiyayên azadiyê di tûrê wî de nanê hişk û di destê wî de jî mishef heye. Helbestvan li dû azadiyeke dilnizm e. Qure nîne, baweriyeke zexm têra wî dike.

“Şêrgele hene; bê kêl û bê gorn  
Şêrgele hene; şevçirax û heyve ron  
Şêrgele hene; ji azadiya bi gon  
Di bin axa sar de b’ axîn razayî!” ( Şêrgele, r.28)

Di virde jî azadiya helbestvan bi reng e. “ji azadiya bi gon” dibêje. Lê em nizanin ev reng spî ye an nîne. Lê azadi hertim di bin goran de ye. Azadiyek bi mirinê xwedî û kedî be bi zehmet e.

## 2.2. Çiya

Mijarên helbesta Arjen Arî ji cihên ku jiyana mirovan û sirûştê dikeve nav hev tê. Çiyayên li ser axa Kurdan gelek bi nav û deng in. Kurd û çiya û deşt wekhev tên zanîn. Çiya bi bilindbûna xwe xelkê diheyirînin. Çiya tiştêkî berze ye. Himmet Uç dibêje ku: “Tiştên berze hebûna xwe ne bi tiştêkî ecibandinê, bi awayekî helecanî didin hîskirin.”<sup>67</sup> Çiya di Qurana pîroz de jî derbas dibe. Hz. Mûsa(s.x.l) diçe ser çiyayê Tûr, Hz. Mihemmed(s.x.l) diçe ser çiyayê Nûr. Tiştên berze sînore tiştên bi sînor ji holê radike. Em dizanin ku çiya ji bo dinê hêmanên muwazenê ne. Em ê niha mêzeyî helbesta Arjen Arî bikin da ku çiya çawa di helbestên wî de hatine honandin, bibinin. Arjen Arî bi piranî li ser çiyayê Cûdî sekiniye, dûvre li ser çiyayê Sîpan, Mûnzûr, Agirî, Gabar û Omerya sekiniye. Çiya û evîn jî nasê hev in. “Her çiya bi evînekê bi nav dibû.”

“Berfê te bar li vir danî  
Li vî Cûdî li vî Sîpanî  
Kuliyên bê pî û bê pahnî  
Lîstin xopanî xopanî” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r. 25)

Çiya di wateya xwe de hatiye bikaranîn û tev li xwezayê û demsalê bi berfê xemiliye. Cûdî û Sîpan di bin barê berfê de ne.

“Ramûsan min veşartin li geliyekî  
Ew gelî yan ê Elî, yan jî li Cûdî  
Bi têhn dimînin li wir bi hij dimînin ramûsanên min..”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, s.52)

Di vir de çiya bûye parastgeha ramûsanên şa’ir. Vêşartina ramûsanên tê wateya demên xweş ên ku bihurîne. Şa’ir dibêje ku ez li ser van çiyayan jiyame, min demên xweş

<sup>67</sup> Uç, Himmet, *Şiirimize Estetik ve Felsefî Bakışlar*, Bizim Büro Basimevi, Ankara, 2005, r.10.

li ser derbas kirine. Ez dixwazim carek din werim ser wan çiyayan û wexta werim ramûsanên xwe yên vêşartî bibînim. Çiya xwediyê raza helbestvan e. Govanê hevdîtina wî û yara wî ye.

“Dor bi rêşî, çarçik  
Û pitiksor e çefiya min.  
Dotmama min kiriye xelat.  
Ji sûka Qamişlokê kirriye û şandiye  
Bîhna bîhokê jê dihat, hê tê  
**Sebra mino çiya bihar vaye tê.**  
Çav kil kiriye di sûret de  
Û porê reşî, bi ser de daye ber bê...  
**Heyrano çiya,**  
Kiras û xeftan wisa  
Ka  
Li bejna kê tê!” (Ev Çiya Rûspî ne, r.10)

Em di vê helbestê de jî dibînin ku qedera şaîr û çiyar ketiye nav hev. Çiyê wek hevaleyê xwe dibîne, pê re qise dike. Çiya di bin berfê de li benda biharê ye. Hişê şaîr di bin çefiya pitiksor de li ser dotmama wî ye. Dilan dide xwe û çiya; çiya ji bo wî sebr e, bihar jî ji bo çiya.

“Cih dabime Nûh  
Bi geh kiribim qewmê sefînê  
Paxila min e zozanê jînê  
Awirên te bigerin li pelçimek zeytûnê  
Li dû kevokekê tu binihêrî  
Di bûkên çavên te de me  
Serî hilde, siha min diavêje ser te  
Cûdî me, Cûdiyê mirada me.” (Ev Çiya Rûspî ne, r.11)

Vê helbestê rasterast li ser çiyayê Cûdî dinivîse. Serpêhatiya Cûdî ya qedîm derdixe hole. Ji wê rojê heta îro rola xwe baş listiye.

“Di qada şer de piştî me negihişt erdê.



Te şahid bivê, va Herekol.  
Miradkar, bi bext û ol  
Va Cûdî  
Û va ye ev ax!” (Ev Çiya Rûspî ne, r.36)

Di vir de jî Çiyayê Herekol û Cûdî derbas dibe. Herekol şahidê vî şerî ye, Cûdî jî miradkar, bi bext û ol e.

“Ronakê lêda çûrisî  
Kirasê l’bejnê qerisî, qelemsiltan e  
Enîmêr e û Dêrsimî,  
Ev çiya Tûjik e, heyran!” (Ev Çiya Rûspî ne, r.37)

“Berfê girtiye Bêrika Mêrdînê  
Tu bibîne, li Çiyayê Omerya tê kabê.” (Ev Çiya Rûspî ne, r.14)

“Kirasê bûkaniyê li xwe girtiye Nemrûd”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.48)

Şa’ir hertim çiyayê di bin berfê de dibîne. Çiyayên wî tu carî azad nînin. Eşqa xwe ya azadiyê li ser çiyayê tîne ziman. Çiya bi heybet in, bilind in, berze ne.

“Li pişteke bigerî, va ne:  
Ev Nemrûd e  
Ev Agirî ye  
Ev Sîpan e.  
Kîjan e nerûspî  
Heyran  
Bêrûmet kî ji van e?” (Ev Çiya Rûspî ne, r.36)

Di vir de çiya li dû hev rêz kirine. Çiyayên destbirayê hev dibîne. Çiya ji bo çî rûspî ne? Ev pirs him bi wateyek rastî him jî bi mecazî hatiye emilandin. Di demsalê herêma van çiyayan de zivistan bi çetinayî derbas dibin. Berf û baran serê çiyayan bi xemla spî dixemilînin. Wekî din jî ev çiya şahidê gelek bûyerên kevn in. Şa’ir mezinatî û berzebûna çiyayan qebûl dike.

“Koyê Spî dibe merqeda min!” (Şêrgele, r.16)

Evîna merivan çiqas mezin be bedêla wê jî ewqas mezin dibe. Evîna şa'ir azadi ye, berê wî li çiyê ye. Azadî û evîn pir caran bi jiyana merivan têr dibin. Helbestvan çiya ji xwe re dike merqed, bi vê yekê hem qedr û qîmeta xwe zêde dike hem jî qîmeta çiyayan dide ber çavan.

“Ev çiya bejn-agir, Agirî  
Yanî tacîdarê tacîdaran, textê rojê  
Serî çîk sayî, dor bi mij û moran  
Niha bindestê cemedê, qirê qeşayê”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.22)

Çiyayê Agirî li Tirkiyê çiyayê herî bilind e; li ser tu carî mij û dûman û cemed kêmbabe.

### 2.3. Xwîn

Heger di helbestekî de xwîn derbas bibe ji wê helbestê bi gelemperî bêhna azadiyê an jî ya evînê tê. Azadî û evîn merivan dikin hêsîrên xwe. Zû zû xwe nadin destê merivan. Bedêla van herdu tiştan gelek buha ye. Mijara helbesta Arjen Arî jî bi piranî li ser van herdu tiştan e. Di çarînekê de evîn, azadî û xwîn li nav hev dikevin.

“Axa sor –evîn xweziya jiya min  
Min **xwîn** dayê, wê nav daye min  
Pê hebin ez, bi wê ye paya min  
Bê Xweda dibim, bê ax û al na!”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.11)

Jiyana ku jê hez dike axa sor û evîn e. Wî xwîn daye axê, axê jî nav daye wî. Bi rastî jî rengê axê jî sor e. Şerên ku li ser axê pêk hatine jî ji bo axê ne. Mirov ji bo yê ser axê li ser axê şer dikin û xwîn diherike bin axê.

Şa'ir di helbesta bi navê “Bang”ê de peyva xwînê pir dubare dike. Ewqas dubare dike ku meriv wexta ku dixwîne hertişt li ber çavê merivan sor dibe.

“**Xwîn, xwîn!**...”

Çiya **xwîn**, zîndan **xwîn**!

Sikak **xwîn**, bajar **xwîn**!

Bi lilîn dîsa dijîm

**Xwînrêj**

**Xwînê** bes birijîn!...

**Xwîna** diya, **xwîna** bira

**Xwîna** Amed, ya Çarçira

Li nav ava, li binê pira

**Xwîn**, **xwîn**!

Neyê serê kafira!...

Hooo biraaa!

Vê **xwînê** gene

Tu nerijîne, heyra!” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.26)

Ev helbest bi teknîka sînemayê hatiye nivîsandin. Bi dubarekirina peyvan **xwînê** di hişê merivan de niqîtbûna **xwînê** disêwirîne. “**Xwîn**, **xwîn**!...” nivîsiye û baneşan û sê xal li dawîya wan daniye. Bi kêşanek giranî li ber çavê merivan disêwire.

“Axa min, axa min

Axîn û deyaxa min

Kaniyên te çikiyabin

Va **xwîna** min, **xwîna** min

Diherike, ez bi gorî.” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.75)

Hevîrê axa wî bi **xwîna** wî hatiye strandin. Ax bi avê dijî û dide jiyandin. Bi germî û bi tekrari bangî axa xwe dike. Heger avên te biçikilin vaye **xwîna** min, dibêje.

“**Xwîna** te ye diherike nolî êrîş bike axê

...

**Xwîna** me di mazatê de

Zêrê zer re serbiser e.

Her **xwîn**vedigere axê

Axa bê xwîn xwelîser e  
Azadî her kêxwestibe  
**Xwîn** rakiriye di ber re” (Ev Çiya Rûspî ne, r.25)

Xwîn û ax ji hev naqetin di ferhenga Arjen Arî de. Ji bo azadiya xwe û axê ji mirinê natirse, heta xwîna wî *nolî êrîşî axê bike* diherike.

“Xec sor î soring vebûbin  
Fenek e gwînên wan; **xwîn in xwîn!**” (Ev Çiya Rûspî ne, r.44)

Tiştêkî ecêb e ku şaîr gul û çiçekan bi rengê xwînê dide şayesandin. Di helbestên wî de jî kifşe ew axa ku tîne ziman dizane bi xwînê hatine avdan. Ew çiçekên ku pel vedidin jî bi rengê xwînê ne.

“Ew tav azayî bû, ew av azayî bû;  
Dilopek xwîn li dû, bû şetek li vê navê!” (Ev Çiya Rûspî ne, r.53)

Azadî bê xwîn nabe. Şaîr li dû tiştêkî ye. Ev tişt tav e, av e lê tav û av jî *azadî* ye. Dilopek xwîn a ji bo azadiyê mîna şetekî ye.

## 2.4.Bajar

Helbestvanê tirk Edîp Cansever dibêje ku mirov dişibe bajarê ku lê dijî.<sup>68</sup> Nivîskar û helbestvan li ser çol û çolistanan, behr û çeman û li ser hin bajarên dîrokî gelek sekinîne. Bexda, Amed, Şam, Stenbol, Beyrût, Parîs... Ev bajar pir bi nav û deng in. Li ser wan helbest, çîrok, destan hatine nivîsandin. Ji ber ku ev bajar dîrokî ne, siyasî ne, çîrokî ne û li ser jiyana mirovan bi bandor in. Hinek caran jî bajar bi zilma zordaran tîne bilêvkerin. Hinek bajar di Qurana pîroz de jî derbas dibin; mîna Sodom, Gomore, Ninova hwd. Bajar şiklê jiyana merivan a rojane digre. Rihê bajarên jî heye mîna rihê qewmên li ser jiyane. Helbestvanê ereban Nîzar Qebbanî jî li ser Beyrûdê dinivîse.<sup>69</sup>

Bajar pir caran dibin qedera merivan. Arjen Arî li ser ev bajarên ku li ser qedera kurdan bi bandor bûne sekiniye. Ev bajar Amed, Dêrsim, Qamişlog, Mêrdîn, Nisêbîn in.

<sup>68</sup><http://www.cekulvakfi.org.tr/haber/insan-yasadigi-yere-benzer>, 24.12.2014

<sup>69</sup><http://www.antoloji.com/ey-savasin-bassehri-beyrut-siiri/> 24.12.2014

Digel vê yeke Arjen Arî bajarên ku ew bi xwe li ser wan jiyaye dişibîne wan bajarên ku bi zilm û zordariya li wan hatine kirin, navdar in.

“Ka goka te kurik?  
Xilçê xwe te li ku danî?  
Hevalên te li ku ne, koza karên te kanî?  
Dê bavê te, mamên te?...  
Kurik, ka bêje çi bû?!  
Ji Bosna-Licê yî tu, ji Şirnex-Somalî?”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.13)

Honaka helbesta Arjen Arî dişibe çîrok û romanên. Pir caran bi pirsan dest pê dibe û merivan meraqî dibe. Lehengê helbestê kurik e, cih û warê wî ji Bosnayê heta Licê, ji Şirnexê heta Somaliyê ye. Ji ber ku hemû mezlûm birayê hev in. Serpêhatiya merivan û bajarên merivan nêzî hev dibe.

Bajarekî din jî Helepçe ye ku Arjen Arî li ser sekiniye. Helepçe di dilê her Kurdî de êşek xedar e. Birayên Helepçeyê Hîroşîma û Nagazakî ne. Emerîqayê bombeya atomê avêtiye van bajarên û xerab kirine.

“Û ez  
Helbestkarek im di hêlekê de  
Birînên min Nagazakî  
Êşa'm piç-piç Hîroşîma  
Bi dû ewrên jehrî  
Tiştêk nema  
Di Helepçê de ji nêrgîza  
Ji bilbizêqa,  
Ji beybûna...” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.36)

Bombeyên jehrî jiyana pir merivan bidawî dikin. Birînên wî Nagazakî ne, êşa wî Hîroşîma ye. Bombeyan tu tişt nehiştiye, nêrgîz û beybûn neman.

Bajarê Hewlêrê û Beyrûdê jî bi hev re tîne ziman. Di virde behsa Nizar Qebbanî dibe. Qebbanî li ser Beyrûdê dinivîse û dibêje ezim Beyrûd, Arjen jî dibêje ez jî Hewlêr

im. Bajar û helbestvan di qederekî dîrokî de dibin heval. Yek dinyayek heye û ax ji hev tu carî naqete. Her ax hinekî muqeddes e û şî'îra wî wilo bi rêz dibe.

“Li ber Hîmê Girî Rondikên Mûsa  
Kîjan xak ne Quds e, kîjan bajar ne minewwer?  
Min welatek divê, herûwer!  
Li Çola Kenan, li berpalên Cûdî  
Çîroka şer ji Harût û Marût  
Ez dibêjim Hewlêr im, Qebbanî  
Tu dibêjî: Ene Beyrûd!” (Şêrgele, r.45)

Em mêze dikin ku ev bajar bi piranî ji bo olan gelek girîng in. Ji bo Cihûyan Hîmê Girî, ji bo hersê dînen semawî Quds, di qissa Hz.Ûsiv de Çola Kenanê, ji bo Kurdan û Hz.Nûh Çiyayê Cûdî û dîsan Hewlêr ji bo Kurdan gelek muhîm in.

Carinan jî bajar bi rasteqînî diçirûsin di helbesta Arjen Arî de.

“Ji dûrve dibînim:  
Diçurise mal bi mal xopana Qamişlokê” (Şêrgele, r.17)  
“Berfê girtiye Bêrika Mêrdînê.”(Ev Çiya Rûspî ne, r.14)  
“Berê min ketiye Xozatê” (Ev Çiya Rûspî ne, r.17)  
“Dilşikestiye Ziving” (Ev Çiya Rûspî ne, r.18)  
“Zeynelebdînê Nisêbînê ma,  
Siltan Şêxmûsê Mêrdînê?”( Ev Çiya Rûspî ne, r.42)  
“Kirasek berf im vê zivistanê  
Kûr kûr dibarim li Dara Hênê  
...  
Vê da hanê pêsîra Pasûrê  
Qeşa girtiye ba lê dizûre”(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.53)

### 2.5.Ax

Hevîrê laşê merivan ji axa merivan hatiye girtin. Meriv dixwaze ku li ser axa xwe bêtirs, bi azadî bijî. Meriv ji bo vê axê xwîna xwe dirijîne. Arjen Arî peyva axê gelek caran bi kar aniyê. Ax tê du wateyan: hesret û xak. Şa'îr axînan ji bo axê dikişîne.

“Reqên qeraxa behran bi xwedî ne  
Û ax berdane ji wan re, azad bûne.  
Çengek ax de biratî, kî navê”  
Masîko (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.12)

Ax û avê komî ser hev dike. Ax bê av nabe, ax nebe jî av bê war dibe û di çengekî ax de biratî ne zor e.

“Axa min, axa min  
Axîn û deyaxa min  
...  
Axa min axîna min  
Birîn û nalîna min  
Hêlana min, hêlîna min  
Ya ku navê xwe da min  
Axa min jinistanê” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.75)

Peyva axê sê caran bi kar aniye û bi şewaza kilamên wêjeya gelerî helbest çêkiriye. Axê axîn jî bi xwe re aniye. Ax him birîn e, him nalîn e him jî hêlîn e. Peyva “jinîstanê” jî di alî rêberdana peyvan de bala me dikişîne.

“...  
Her xwîn vedigere axê  
Axa bêxwîn xwelîser e.” (Ev Çiya Rûspî ne, r.25)

Di vir de têkiliya ax û xwînê derdixe holê. Li jor me têkiliya mirovan û axê gotibû. Rengê xwînê sor e, rengê axê jî sor e, dibe ku ax rengê xwe ji xwînê girtibe. Şa’ir axa bêxwîn qîmetê nadiyê. Dibêje xwelîser e.

“Çengek ax te dawerîne ji hisretê,  
Ji biyanetiyê ger te derîne çengek ax” (Ev Çiya Rûspî ne, r. 33)

“Çengek ax” biwêjeke meşhur e di nav gel de. Meriv ji bo çengeke ax xwîna xwe dirijîne û tenê çengek ax çavê merivan têr dike. Ger axa merivan çengek be jî meriv biyanî nîne û meriv hesreta axê nakêşîne.

“Bibexşîn xayînên qewmekî  
Û min jî, axa bexşînkâr!” (Ev Çiya Rûspî ne, r.47)

Ax ji bo helbestvan tiştekî pir bi qîmet e. Û ax dil nizm e, herkes li ser dijî. Hin kes ji bo çengeke ax tédikoşin hinek jî xayîntiyê dikin. Ax bexşînkâr e, helbestvan dixwaze ax wî jî bibexşîne.

“Bibare berfê  
Li ber xwe bide kulîlkê  
Tu ji vê axê yî, ez ji vê axê...”(Şêrgele, r.37)

Di vir de jî helbesta Arjen Arî tev li xwezayê ye. Berf û ax û kulîlk û helbestvan li ser axê ne. Berf ne ji axê ye, tiştekî biyanî ye, cemidî ye; ji bo jiyana kulîlkê û şaîr asteng e. Bangî kulîlkê dike, dibêje berxwe bide.

“Di himbêza axê de min çavên xwe vekir  
Diya min ax, şîrê min, pêçeka min ax,  
Kurmikek im ji betnê axê, xwarina min ax  
Ax xakeax, bi ku de biçim, li te vedigerim!  
Ax xakê ax....”(Şêrgele, r.43)

Di vê helbestê de hest û ramanên şa’ir gelek êşkere hatiye nivîsandin. Meriv dibêje qey təkiliya wî û axê jiyana wî bixwe ye. Helbestvan çavê xwe di nav axê de vekiriye. Ax hem diya wî hem şîrê wî hem jî pêçeka wî ye. Gelo ev ax xak e an hisret e? Bi rastî di ristina vê helbestê de tê her du wateyan jî. Dibe ku meriv di nav ax û hesretek mezin de were dinê. Wê çaxê her tişt derd e, hesret e ji merivan re. Helbestvan ax dike ji bo axê, tevgera wî li ser axê ji bo axê ye, para wî axîn e, vegera wî jî ax e.

“Kê negot, ax! Û neçû?  
Kî nebû ax...û neçû?  
Felek, qajikê bicû  
Arjen jî dil bi dax neçû?”(Şêrgele, r.63)



Ev çarîn jî behre ya Arjen Arî ya helbestê nîşan dide. Her kes bi hesretekî koç dike ji vê dinê û herkes dibe ax û diçe. Di vê çûnê de Arjen jî dil bi dax e. Felek bi gotina kesî nake.

## 2.6.Mirin

Mirin mijareke kevn e. Mirin û jiyan bi hev ve ne. Li kolanê jiyanê konê xwe datîne mirin. Mirin merivan ji hev diqetîne. Reng û dengê mirinê sar e. Mirin û ax mihtacê hev in. Ax zikê xwe bi miriyan, mirin jî zikê xwe bi zindiyan têr dike. Pênûsa Arjen Arî jî şahidê vê yekê ye.

“Min hij te kir  
Li dû her koçberiyê pirrtir  
Û gelektir ji xwe ji gelekî gelektir  
Her ku mirina kevokan dihat tu jî dimir  
Baz xayîn derketin Sarya min  
Min hij mirina te kir” (Ev Çiya Rûspî ne, r.58)

Mirin, koçberî, baz û kevok nigaş û rastiya helbestê ne. Mirin jî koçberî ye. Mirî kevok û Sarya ne. Kevok nigaşa aştiyê ye, baz dijminê kevokê ye. Sarya jî kevoka aştiyê ye û ew jî miriye. Şaîr ji mirina wê ya bi rûmet hez dike.

“...  
Qesab in  
Dest bi qezetore, keftar!  
Segên har insegên har!  
Hey hewar,  
Miriyan jî dikujin di vî şerî de!” (Şêrgele, r.11)

Qeyde û rêzikên şer tune ne. Şer bi piranî bi mirinan diqedin. Hinek şer hene jiyan bi xwe dimire têde. Lê ev nigaşa ku şa'ir lê daniye bala merivan gelek dikişîne. *Miriyan jî dikujin di vî şerî de!* Gelo mirî çawa tên kuştin, ev çi şerekî xedar e?

“...  
Bi qasî bimrin ji te hez kirin

Û mirin... mirin... mirin!  
Bi her mirinê mirin bi min şîrîntir kirin  
Bi kêl bê kêl, kîjan dildarî rakim ji qebrê?  
Her yekî temenek bexşî te kirin!” (Şêrgele, r.13)

Meriv carê dimire, lê hinek mirin di nava heyata mirovan de dijîn. Mirin li ser şa’ir ewqas tesîr çêkiriye ku li dû hev sê caran dubare kiriye. Tirsê şa’ir ji mirinê nîne, hetta ji mirinê hez jî kiriye. Ew kesên ku temenên xwe bexşî axê kirine ji bo şa’ir mirin şîrîn kirine. Mijara mirinê ji bo hinekan tirsek mezin e, mînak şaîrê wêjeya Tirkan Cahît Sıtkı Tarancı pir ji mirinê ditirse, naxwaze ku roj ji şibaka wî kêmbibe.<sup>70</sup> Şa’ir mirinê wek wehêsanê dibîne.

*Wehêsanek e mirin, jiyan çem e.* (Şêrgele, r.14)

Şaîr dev ji mirinê bernade. Dibe ku mirin li ser wî dibare. Ewqas mirin heye ku êdî mirin serê xwe diçimîne.

*Mirinê serê xwe çimand li ber mirina wan* (Şêrgele, r.29)

Di nav şer û pevçûnan de zarok jî karîgerî dibin. Şaîr li dû mirina zarokan dibe mirin.

*Mirinek kezîzer im, li dû zarokan!* (Şêrgele, r.44)

Carinan jî mirin sekinandina benda evînê ye.

*Her roj dimirim di mextela bendemayînê de* (Şêrgele, r.52)

“Mirin bêl te bûn e

Mirin ji te dûrbûn, li cem te nebûn e

Dimirim dimirim bêl te

Ku ez bimirim, tu ê çî bikî bi tenê?” (Şêrgele, r.59)

Di vir de jî mijar ferdî ye. Mirin bêyî hezkiriya dildarê wî ye, ji wê dûrbûn e. Peyva mirinê peyveke giran e, şa’ir ji bo vê yekê dubare dike ku bandora wê zêde bibe.

<sup>70</sup>[http://turkishstudies.net/Makaleler/167994447\\_14Ak%C4%B1nC%C3%BCneyt-edb\\_S-185-193.pdf](http://turkishstudies.net/Makaleler/167994447_14Ak%C4%B1nC%C3%BCneyt-edb_S-185-193.pdf),  
25.12.2014

## 2.7.Çîçek

Çîroknivîsê Tirkan Saît Faik Abasiyanik dibêje ku ew kesên ku navê çîçekan û masiyan nizanibe nikare çîrokan binivîse.<sup>71</sup> Arjen Arî ev ji bo helbestê emilandiye. Di nava helbestên wî de çîçek û ajal gelek zêde ne. Rihê wî yê azad li ser sirûştê axa li ser dijî dixwaze ku her tişt bi şoreta xwe bimîne. Lê destên mirovên qirêj her tişt lewitandiye. Helbesta wî bûye deng û serhildana sirûştê.

“Ar girtiye qurm  
Û li dorê dileyîze  
Çi kiribû  
Çi bû gunehê **dara berû?**  
Bi min re wê jî şer nexwestibû  
Bi min re zarokan, bi min re **kulîlkê**  
Û wê qîza xama...  
...  
Rondik herikîbin şer herikand  
Û xwîn pijiqand **pelê kulîlkê...**”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.50)

Di helbesta Arjen Arî de zêdetir navê ‘dara berûyê’ derbas dibe. Dû wê re ‘kulîlk’ zêde bi kar aniye. Em dibînin ku êşa sirûştê ku hatiye şewitandin di dilê helbestvan de cih girtiye. Dipirse, gunehê dara berû. Lê bersiva wê nîne. Zarokan, qîza xama, kulîlkê yekî jî şer nexwestiye. Lê bandora şer li ser hemûyan e.

“**Kulîlkê** dirêjî min bik  
Te **kulîlk** nebe ramûsanekê...”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.59)

Di vê malikê de jî kulîlk nîşaneyê hezkirinê ye. Ji yara xwe tama ramûsanekê dixwaze.

“**Behîv** bişkivîn, pêşî

<sup>71</sup><http://turkoloji.cu.edu.tr/YENI%20TURK%20DILI/9.php>, 25.12.2014

Dû re, buharxêrê serî hilda  
Dar û ber ketine **kulîlka**  
Pir nema li van erda  
Ji buharê re pîrr nema” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.66)

Bişkivandina behîvê mizgîniya biharê ye. Di biharê de nebatat serî hildidin ji erdê. Û kulîlk vedidin. Dilê merivan xweş dibe bi şoretbûna erdê. Hêviya helbestvan heye. Bihar hatiye, dibe ku bigihêje hezkiriya xwe.

“Qut bûn ji buharek din  
Bi jînê şa nebûn,  
Hinek pûç bûn  
Di Helepçê de hinek kor  
Hinarkên ruwa sor sor  
Ji heyva nîsanê **nêrgîz**  
**Bilbizêq**  
Û **beybûn**  
Tev... zarok bûn...  
...” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.36)

Di komkujiya ku li Helepçê pêk hat de zêdetirîn zarok û jin mirin. Şêr, hertiştî bi xwînê sor kir. Hatina biharê kêfa kesî neanî. Çîçek û zarok wek hevîn di nava helbesta Arjen Arî de.

“...  
Mexîne ber xwe b’fediyokî  
Di kerînekan de çavan meke du **binevşên** stûxwar.”  
(Ev Çiya Rûspî ne, r.23)

...

Çavên hezkiriya xwe dişibîne binevşan. Binevş masûm e, stûxware, naxwaze ku hezkiriya xwe wilo bibîne.

“Hij bîhna **sosinê** kir,  
Hij zerahiya **nêrgîzê**  
Hij sorahiya **xecê**...”

Ji axê hezkirin bê guneh bû!” (Ev Çiya Rûspî ne, r.23)

...

Çîçek bi şikl û rengên xwe tên watêyên tiştan. Lehengê vê helbestê Besê ye. Besê bîhna sosinê, zerahiya nêrgîzê, sorahiya xecê hez dike.

“**Xec** sor î soring vebûbin  
Fenek e gwînên wan; xwîn in xwîn!  
**Nêrgîzên** stûxwar bi lûlan gevizîn  
Û **beybûn** peritîn bi destê neyar” (Ev Çiya Rûspî ne, r.44)

Neyar dijminê hertiştî ne. Rêza wan ji tu tiştî re tune. Sorahiya xecê xwîn dibînin. Destên wan li çî dikeve diperitîne.

“Sed **pîvok** derbûn, sed **kulîlk** zer bûn  
Sortir vebûne yek ji yekê  
Ev **xec** e ev **lîloz** ev bûba pembî...  
Seqem tenibî, roj dibisire  
Yarê, ka bêje  
Kîjan **kulîlkê** bixim berbiska te!...” (Ev Çiya Rûspî ne, r.46)

Bi hatina biharê şa’ir kêfxweş e. Resmê biharê dikişîne bi peyvan. Pîvok, kulîlk, lîloz vebûne bi dilê wî. Dixwaze yekî bixe ber biskê yara xwe.

“Her zarok terhek bihar  
Her zarok stêr stêr qetek hetav  
**Kulîlka** minî çav bi xunav  
Hîva min, hêviya min, Îremka min  
Tu, qetek nan, û tasek av!...”(Şêrgele, r.38)

Bihar, hêvî zarok û çîçek di dilê şaîr de ne û cihên wan gelek muhîm in. Bihar serbixwe ye, hêvî ye, serhildan e lê dîsa jî demsaleke ewle nîne.

Çavên te: du **binefsên** reng tenik (Şêrgele, r.56)

Rengê çîçekan rengê jiyanê ne. Zarok şoreta jiyanê ne, dergîstî, yar kêfxweşiya dilê merivan in. Helbestvan dixwaze ku di vê bexçeya mezin de bêderd bijî, zarok nemirin, gul venemirin.

## 2.8. Ajal

Taybetmendiya helbesta Arjen Arî ev e ku di nav sirûştê de zaye. Çîçek, ajal gelek caran di helbestan de derbas dibin. Ajalên ku di helbestan de derbas dibin ev in: pepûk, kar, mîh, berxik, quling, qumrî, kevok, kundok, çivîk, çêlek, kurmik, kew, asik, şalûl, endelîp, piling, xezal, gur, kûçik(se), xalxalok, torik, belçimok, şeytanok, kîvroşk, sûsik, tûjîk, hesp, bizin, pîrebok, hûtê heft serî, bozê rewan, dûpişk û baz. Ji vanan kar, mîh, hesp, bizin, berxik û kûçik ajalên kedîkirîn e; pîrebok, hûtê heft serî, bozê rewan ajalên destanan û çîrçîrokan in. Şalûl, endelîp, qumrî di edebiyata kevn de gelek hatine bikaranîn. Asik, kîvroşk, kew ajalên nêçîrê ne. Piling, gur, torik ajalên hov in. Kundok ajala bêyomiyê ye. Ango her ajal di wateya tişteki de emilandiye. Em çend mînakên bidin.

“**Mîhên** zayî cot anî ne

Spî spî, belek belekî

**Berxikên** nêr û mê

Di çêrê de ne li dû makê

Roj hatiye hatiye, ketiye şibakê

Tê bibêjî ji tirsan xwe daye alî

Ji vî alî, ji wî alî

**Piling** dadaye sermê!”( Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.66)

Ev helbest dîmenek xweşik di hişê merivan de çêdike. Bihar e, çêre hêşîn bûye, berx li diya xwe dikalin û diçêrin. Ajalan, dîmenê temam kirine. Bi aramî meriv dixwaze lê mêze bike.

“**Qulingê** baskîkestî ye dilê min

Ji bin milê çepê birîn xedar!

Evdalo, kê li me neda tivingê?

Ne ez têr geriyam, ne te têr ax xar!..”

( Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.77)

Di vir de şa'ir meteloka Evdalê Zeynikê dixê bîra me. Çavê Evdal nabînin ew derdê xwe ji qulingê re dibêje. Şa'ir jî derdê xwe ji xeyala Evdal re dibêje.

“Ji vê milê rabûn  
Ji ser darên vî gelî  
**Qumrî** pev re firîn  
Û **kevok** çûne gilî  
**Quling** koçî koçber in  
Û **çivîk** li vî milî  
Ev mil milkek e,  
Milkek  
Wêran e anha!” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.72)

Bandora şer ekosîstema dinyayê xerab kiriye. Her tişt ji şer dikişîne. Di vî şerî de jî qumrî firîne, kevok çûne gilî, quling koçber bûne. Û ev der wêran maye. Û bandora şer dibe sedema xerabûna jiyana ajalên bê sûc û tawan.

“Tu û Xwedê, nêrgîzê çi kiribû?  
**Şalûl** çi kiribû, **endelî** çi kiri bû?  
**Çûkê** beytik hê nû pûş biribû  
Gunehê wê çi bû vê êvarê?”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.71)

Helbestvan vê yekê didarizîne. Ji bo çi vê dema êvarê ku ajal diçin hêlînên xwe lê hêlînên wan serde tînin xarê?

“...  
**Mî** ketine çêrê, bilûr stranê dide bê  
Ne birqek vedide, ne birûskek belayî  
Xweza aram e, aso çîk-sayî  
**Dûpişk** razayî, **mar** razayî  
**Xilt** axê vedipexêre, **çivîk** qirşekî din tîne,  
Ava kaniyê sar, qeşîn e

**Kevok** têne perr, baz têne qeraxê...” (Ev Çiya Rûspî ne, r.31)

“...

Têra me dikeve çiya

Daristan e mala me teviya

Ez dara berûyê me,

Ev guher tijî sincik in.

Li vî kendalî **tijûk** bang dikan

Dakevî vê şewlî xişxişok distirên...

Li ser va tehtikan bi çirrê dileyistin

Rojê da wan, westiyan, sist in

Li bin ferşekî çar **gumgumok!**

**Şeytanok**, spî û kofendîl

Pal daye erdê, dîl, feqîrek e.

Ev der gevzikek e

**Kewên gozel** niha tê de bûn,

Firiyan bi refek;

Nêçîrvan bi dû wan de çûn!...

**Sûsikek** hate xarê li vî milî.

**Kîvroşkekê** bazda, bazda

**Tajiyê** dabû pey, westiya

Xwe pîrnisand li ber tûmekî.”(Ev Çiya Rûspî ne, r.55)

Ev her du helbestên jor dişibin çîrokan. Teswîra sirûştê bi dilkî westiyayî tîne ziman. Ev helbest mîna dîmenên kartpostalan in. Li ser honaka çîrokan hatine daxistin. Şa’ir dîmenek kişandiye û bi rêza helbestê hêdî hêdî diherike. Ev der çiya ye, daristan e, xweza ye û ajal jiyana xwe ya normal didomînin. Şa’ir bê şîrove dide ber çavan.

Di hinek helbestên din de jî ajal derbas dibin. Bi pîranî ajal li serê çiyayan parçeyek ji xwezayê ne. An ji ber şer koçkirine, an jî ji vî şerî heyirî ne.



## 2.9. Erotîzm

Di hebûna mirovên ewil de helbest jî hebûye.<sup>72</sup> Piştî Hz. Adem Xwedê diya me Hewa jî afirandiyê. Ji wê rojê heta îro mijara helbestê bi piranî “jin” bûye. Jinan bi evîndarî konê xwe di nava helbestê de vegirtiye. Jin, bi desgirtî, bi xwengî, bi dayikî û bi têkoşîna xwe bala mêran kişandiyê. Jin herî zêde bi evîniyê li ser heyata mêran bi bandor dibin. Evîn mijarek kevn e û heta îro li ser bi hezaran helbest hatine nivîsandin. Nurullah Çetin hesta evînê di çar kategoriyan de rêz dike. “Ev kategorî evîna serveyî, evîna şehewî, evîna romantîk û evîna berzeyî.”<sup>73</sup> Erotîzma ku di helbestên Arjen Arî de heye evîna şehewî ye. Ev helbesta sansualîtê ye. “Di helbesta xwe de cih dabûna zayendîtîya jina ku meriv jê hez dike, qalkirina bedena wê bi vî qeydeyî dîtina jinê re, evîna şehewî tê gotin. Ev metnên ha tîn holê, materyalîst in, ku aliyê evînê yê ruhî û manewî zêdetir hêla wê ya bedenî û maddî didin ber çavan. Ji wan yên ku edebî, hunerî û estetîk re erotîk tê gotin ji yên pespaye, fediyokî re jî pornografîk tê gotin.”<sup>74</sup> Di zargotina Kurdan de jî erôtîzma tişteki biyanî nîne. Kurd di alîkî de di bin bandora dînê Îslamê de ne, di aliyê din de jî çanda xwe bi temamî winda nekirine. Dengbêj Ehmedê Bêrtî di kilameke xwe de wiha dibêje: “destê xwe di ber kemberî qolî jêr de nebe” cihekî mahrem e. Dengbêj vê gotinê bêtirs dibêje. Cardin ev erotîzma di dîwanên helbestvanên mîna Ehmedê Xanî de jî derbas dibin.<sup>75</sup> Arjen Arî vê yekê di serê pirtûka xwe de diyar dike. Ji dîwana Ehmedê Xanî ev herdu malik nivîsine.

“Cannan teleb in hinek ji bo can

Canteleb in hinek ji boyê canan

Hin wesleheb in ji rengê Tajdîn

Hin derdegûzin weke Mem û Zîn” (Xanî, 2010:63)

Xanî behsa bext û qedera evîndaran dike. Hin evîndar ji bo nefsa xwe ji yekî hez dikin, hin evîndar jî ji bo hezkirîya xwe can dixwazin. Erotîzma Arjen Arî di vê ristê de xwe bi cih dike. “Cannan teleb in hinek ji bo can.” Ji ber ku erotîzma hestek ber bi xwe ye.

“Qulzema dil işq e: Mella

<sup>72</sup><https://tr.wikipedia.org/wiki/%C5%9Eiir> 12.06.2015

<sup>73</sup> Çetin, Nurullah, *Şiir Çözümleme Yöntemi*, Öncü Kitap yayınları, Ankara, 2013, r.63.

<sup>74</sup> b.n., r.64.

<sup>75</sup><http://web.telia.com/~u63802125/Xaneper/Hemsida/Nivisar/Kurdimak/xanievin.html> 12.06.2105

Çi xwedayî, çi beşerî  
Sohtî be b'arê seqerî  
Her evîn ala ye, Mella  
Dil li me bela ye, Mella!" (Erotîka, 2006, r.7)

Melayê Cizîrî jî helbestvanê îşqê ye. Îşqa Mela ya mecazî nîne, ya heqîqî ye. Arjen van gotinan ji xwe mînak digre ku di nava civatê de were qebûl kirin. Dibêje ku mela û alimên we yên olî jî li ser vê mijarê sekinîne. Qulzem navê behra Sor e. Îşq heger carê di nav dil de agir bigre dil disotîne, sor dike. Ji wî dilê ku sor bûye ava hesret û kederan diherike. Helbestvan "Dil li me bela ye, Mella!" dibêje û belayên wê rêz dike.

Di warê erotîzmê de hin zanyar û nivîskaran jî tişt gotine.  
Andre Breton: "Erotîzm ew huner e ku bêkêmasî li mirovan tê."<sup>76</sup>  
"Erotîzm, îfadeya zayendîtiya li mirovan tê ye."<sup>77</sup>

Em dibînin ku gelek kesên navdar di bin bandora erotîzmê de mane. Ev tişt tişteki ne şerm e lê şiklê bikaranîna wan muhîm e.

Erotîzma Arjen Arî nêzî pornografîyê ye. Lê ev navên mêraniyê û jintiyê raste rast nabêje. Lê tevgera di nav nivînan de bê perde raste rast dibêje. Ew kirde ya vî karî ye. Birçiyê laşê jinê ye. Rihê xwe ne, laşê xwe têr dike. Ev "esmera biçûk" ne jina wî ye. Tirsek di dilê wî de heye.

"Minêkar im, minêkar  
Tu min nedî bi tu kesî!" (Erotîka, r.11)

Çavnebariya mêran a sedsalan di Arjen Arî de jî heye. Minêkar e lê bi tirs e jî. Ewqas bi laşê wê ve hatiye girêdan wexta ku teswîra wê dike tişteki ji ber çavan naçe. Navê wesleyên wê nabêje, di nava hal û hereketê wê de meriv dibîne.

"Tew; ku tu dimeşî tena tena  
Û digihînî hev herdu felqe!" (Erotîka, r.21)  
"Ziyanok bû bavê min jî  
Ademê adem, sêvxwirê weke min

<sup>76</sup> Batur, Enis, *Yazının Ucu*, Yapı Kredi Yay, İstanbul, 1993, r.127.

<sup>77</sup> Akar, Atilla, *Erotizm*, BDS Yay., İstanbul 1999, r.11.

Qewitî seba nefsê ew jî

Ez ji milkekî, ew ji kolanên bihuştê!” (Erotîka, r.37)

Behsa qewitbûna Hz. Adem a ji bihuştê dike. Hz. Adem û Hewa yê bi nefsa xwe nikaribûn çûbûn sêv xaribûn û ji bihuştê hatibûn derkirin. Dibêje ez jî kurê wî me, bi nefsa xwe nikarim. Berê van rêzan jî qala Habilê ku Qabil kuştiye dike. Qabil jî ji bo jinê birayê xwe kuştibû.

*Habil bi destên Qabil kuştê*

Rindbûn û bedewiya yara wî dibe sedema pir tiştan. Di Qur’ana pîroz de jî behsa têkiliya mêran û jinan tê kirin. Ayeta 222 a sûreya Beqere wiha bi helbestî dibêje.

“Ji jinên xwe hez bikin

‘ji milkên xwe yê ku zarokan tînin

Zeviyê we yê beyar in,

We çawa bivê, tov welê bireşînin.” (Erotîka, r.43)

Erotîzm û hez di helbesta Arjen Arî de gelek cih girtiye. Bi helbestekî erotîk vê mijarê diqedînim.

“Êvarekê xwe ji min re anî

Tena tena, qitikî, kubar

Di hembêza te de hemû team:

Sêngûber

Gerdena ter

Lêvên erxewanî...

Û tu şilfî tazî

Û tu es î esmer

Û ez ketim ser

Heta ku rojê şev hilanî!” (Erotîka, r.27)

## BEŞA SÊYEMÎN

### 3. JI ALIYÊ BINYADÊ VE LÊKOLÎNA HELBESTÊN ARJEN ARÎ

Wexta ku meriv behsa wêjeyê dike bi pirani di hişê merivan de şî'r cih digre. Di edebiyata hemû gelan de helbest heye û destpêka wêjeyê ye. Wêjeya Kurdî ya gelerî gelek pêşve çûye. Bi kilam û stranên dengbêjan jiyana xwe domandiyê. Ji aliye din ve bandora medreseyan gelek girîng e. Wêjeya Kurdi ya nivîskî bi saya mele û feqeyên medreseyan heta roja me hatiye. Di serê sedsala 20. de Kurdan jî berê xwe daye Ewropayê û wêjeya Kurdî di vê rê de gelek pêşve çûye. Edebiyata tu gelî bi serê xwe nîne. Têkiliya wêjeyê bi hest û ramanên mirovan belav bûye li ser dinê. Arjen Arî di nava van sê rêyan de ye. Edebiyata gelerî bi gotinên pêşiyên û biwêjan; edebiyata medreseyan bi şêwaza rûba'îyan(çarînan) û edebiyata nûjen jî bi şêwaz û mijarên nûjen di helbestên Arjen Arî de cih girtine. Dîsan jî formata Arjen Arî pir belav nebûye.

#### 3.1. Çarîn

“Çarîn(rûba'î) nezmek ji çar rêzan pêk tê û rêzên yekemîn, duyemîn û ya çaremîn bi hev re qafîye ne, ya sêyemîn jî serbest e. Ji rêza sêyemîn re hasî jî tê gotin. Ji çarîne re terâne, du-beyt, çâr misra', çehâr misra jî tê gotin. Helbestvan di çarînan de fikr û ramanên xwe yên felsefî, tesewufî, 'eşqa xwe ya maddî û manewî tîne ziman.”<sup>78</sup>

Çarîn ji çar rêzan pêk tê. Şiklê qafîya wê aaxa ye. Çarînen helbestvan bi şiklê aax'yê hatine qafîyekirin. Pirtûkeke wî bi temamî ji çarînan hatiye nivîsîn. Ji xeynî pirtûka *Destana Kawa û Azhî Dehaq* di hemû pirtûkên wî de çarîn hene. Di nava helbestên wî de heftê û du çarîn hene. Di serê pirtûka xwe ya *Çil Çarîne* de dirêj dirêj qala çarînan kiriye.

“Eynil yeqîn îlmil yeqîn  
Bawer neke bi xwe bibîn  
Bide dû ta çîn û maçîn  
Zanîn ku rêberê te be!” (Çil Çarîn, r.48)

<sup>78</sup>Dilçin, Cem, Örneklerle Türk Şiir Bilgisi, Türk Dil Kurumu yayınları, Ankara, 2004. r. 207

Çarîn ji heşt kîteyan çêbûye. Ji bo ku jimara kiteyan xirab nebe peyva *heta* yê bi kurtasî *ta* nivîsiye.

“Ne peya be, ne siwar be  
Nebe ker, ne bi hevsar be  
Bi hefsar bî, ne binbar be  
Tê minetkêş bî ta mirinê!” (Çil Çarîn, r.67)

Her sê rêzên ewil bi qertafa *-ar* bûye qafîya tam. Peyva *beyê* redîf e. Honaka qafiyê aaax ye.

Wekî din; ji hinek helbestên Arjen Arî, ji çend çarînan jî pêk hatine, lê ev ne rûba'î ne.

“Xalxalokê, xalxalokê  
Pitikreşê, xecxecokê  
Tu qird didî kê û kê  
Para'm kanî xalxalokê?

Xwe deyne tiliya girde  
Mede xwe bi vir de wir de  
Bide min piçikek qerd e  
Kêzaxatûnê, xalxalokê

Nefelek çarpel bibîne  
Sola yarê ve werîne  
Ji bêqirdî min derîne  
Firmizgînê, xalxalokê

Xalxalokê, kêzika Hecê  
Min tu danî baskê pacê  
Weke tu derî Mîracê  
Qasidê min be xalxalokê

Bifire hêla Binxetê

Xwe bigihînê, lêv şerbetê

Digihê min milkê serxetê

Bextê te me xalxalokê.” (Ev Çiya Rûspî ne, r.38)

Bi vî şêwazî pênc- şeş helbest nivîsiye. Ev bi xwe formateke din e. Di wêjeya tirkan û ereban û farisan de jî heye ev format. Helbest ji pênc çarînan pêk hatiye. Her sê rêzên çarînan di nava xwe de bi qafiye ne, ên çaran jî di nava xwe de bi qafiye ne. Pîvana kiteyan heşt e. Honaka qafiye *aaax* ye. Çarîn û gotinên pêşyan ên ku di pirtûka wî ya “Çilçarîn”ê de derbas dibin di tabloya jêr de ne:

| Çil Çarîn   |                            |       |
|---|----------------------------|-------|
| Gotinê Pêşyan an Biwêj                                | Di helbestê de derbasbûn   | rûpel |
| Dêlik dêla xwe nehejîne se nadin dû                   | Nehejîne dêl dêl xwe       | 27    |
| Zikê birçî dike qurequr                               | Zikê birçî dike qurequr    | 28    |
| Leglegê emrê xwe bi leqleqê derbas kir                | Legê borand bi leqleqê     | 30    |
| Devê rovî negihîşt tirî, got tirş e!                  | Dev negihiyê tirîtirş e    | 31    |
| Kûçik goştê kûçik naxwe                               | Kûçik goştê kûçik naxwe    | 32    |
| Yê ku xwe neke kûçik pera nake hûçik                  | Di hûçik de dike taxe      | 32    |
| Heyî be kurê seyî be                                  | Heyî be kurê seyî be       | 33    |
| Nû dîtî bi xwe de rîfî                                | Bi dû re bi xwe vev rî be  | 33    |
| Ku ga bikeve kêr pir dibin                            | Ku bikeve kêr pir dibin    | 34    |
| Malê dinê qirêja desta ye                             | Dibêje qirêja dest e       | 35    |
| Ku te berda bi dû mekeve                              | Kê wenda kir, tu lê digerî | 36    |
| Bo tu yekê/î bixapînî an pereyekî pir, an çewalek vir | Pereyê pir çewalê vir      | 37    |
| Kûçik li ber deriyê xwediyê xwe direyê                | Yek jê se ye, yê din pe ye | 38    |
| Pepûkê dawa jinê                                      | Pepûkê l'berdawa jinê      | 38    |
| Yê ku neçe şer şêr e                                  | Rûxîn û xwîn û rêwîfî      | 39    |
| Roviyê b'dek û dolab e                                | Rovîfî bi dek û dolab      | 40    |
| Rizqê evdan li Xweda ye                               | Xaliq mezin û rizqseyn e   | 41    |
| Nanê mêran li mêran bideyn e                          | Nanê mêran li kê deyn e    | 41    |

|  |                                     |    |
|--|-------------------------------------|----|
| Malê dinê qiloçê mêra ye   | Çi ye? qiloçê mêra ye!              | 42 |
| Fermana deveyê rabû, rovî berê deveyê<br>reviya                    | Rovî berê deveyê d'reve             | 43 |
| Aqilê sivik barê giran   | Barê giran aqilê sivik              | 44 |
| Bi jinê bişêwire bi ya xwe bike                                    | Bişêwire bi dû re bik               | 44 |
| Ku dil şikest nacebire   | Şûşeya dil ne ji kevir e            | 45 |
| Peyva nexweş ji şûr tûjtir e                                       | Peyv heye j'şûrf tûjtir e           | 45 |
| Kerê çar ling  | Çarlingî bi lê dikeve               | 46 |
| Dê bibîne keçe bîne  | Dê bibîne dotê bîne                 | 47 |
| Ji çavên xwe bawer bikim, ji gotina te<br>bawer bikim              | Eynel yeqîn îlmel yeqîn             | 48 |
| Mirov ne ji teştâ xwe tênan, ne ji jina<br>xwe têrgan be têr nabe. | Têr têr bixwe ji teştâ xwe          | 50 |
| Xwedê nokan dide yê bê diran                                       | Nokan dide yê bê diran              | 51 |
| Eniya mirî ku li ferş dikeve nû bixwe<br>dihese ku mirî ye         | Eniya mirî l'iferş dikeve           | 52 |
| Golikek garanekî diherimîne  | Golikek çi dike ji garanê           | 53 |
| Aşê hinekan ji ber xwe digere                                      | Aşê hinan ji ber xwe ve             | 54 |
| Tîra me li tehtê ket   | Tîra me l'tehtê dikeve              | 54 |
| Ji serî çavan dixwe  | Ji serî çav, ji goşt parxan         | 55 |
| Pisika çav li mişk keve  |                                     | 55 |
| Margestî ji weris ditirse  | Margestî ji çi ditirse              | 56 |
| Ji jêhatinê j'lêhatinê?  | Lêhatin ji jêhatinê çêtir e dibêjin | 57 |
| Derpiyê min li xwe ke tir û fisan tê de<br>neke                    | Li xwe ke lê çi tê neke             | 58 |
| Rastî şûrê Xwedê ye  | Bila rastî şûrê te be               | 58 |
| Şûşeya dil ku şikest nacebire                                      | Nacebire, ku şikest şûşe            | 59 |
| Ku ker ket terî pahra xwedî ye                                     | Tehrî pahra kê dikeve               | 60 |
| Ew ketin arava te  | Ji sa bikişe, zolta jiye            | 61 |
| Hevalê lingê şemitî tune   | Ling şemitî heval nîne              | 62 |
| Jinê bîne esla, kêrê bide wesla                                    | Jinê bînî ji esla bîne              | 62 |
| Heta mirinê çav li kirinê  | Ta sax bî çav li kirinê             | 63 |
| Peyva ketî ser zimana, digere li şehrîstana                        | Tu xwe mexe ser zimana              | 64 |

|   |                              |    |
|---|------------------------------|----|
| Devê kê doxina min e                          | Dê devê kê doxina te be      | 64 |
| Nekeve tora mêrê teres                        | Nekev tora mêrê teres        | 65 |
| Li qirdê me yî bi gû!                         | Torvano li qirdê te be       | 65 |
| Ha vaj ha vaj                                 | Vaje begê mino vaje          | 66 |
| Qirdê bi gû                                   | Qirdê bi gû, gû têkevê       | 69 |
| Ji xezalê bezatir tune, rizqê xwe dixwe       | Xezal beziya, rizqê xwe xwar | 70 |
| Serê dêr bi gû, binê dêr bi gû                | Ji serê ço ji binê ço        | 73 |
| Qenc kiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro | Qenc kiro bi xwe kiro        | 74 |
| Dê bibîne dotê bine                           | Dê bibîne bi dû re keçê      | 75 |
| Taba xelef çû bertelef                        | Xelefo, li taba te bê        | 75 |
| Yê ku neçe malekê, nizane bi hewalekê         | Her mal bi halekî dikeve     | 77 |
| Xêrê bike bi avê de berde                     | Xêrê bike b'avê d'berde      | 78 |
| Her ku me got çiriya bot                      | Vê gotgotê qûş li me dirand  | 80 |
|   |                              |    |

### 3.2. Nezma Serbest

“Helbesta ku bi pîvan û qafiyê nayê nivîsandin re nezma serbest tê gotin.”<sup>79</sup> Vê formatê ji bo helbestvanan gelek rehetî çêkiriye. Ji edebiyata Ewrûpayê belav bûye. Helbestvan li gorî dilê xwe dinivîse. Dişibe şêwaza nezma edebiyata kevn a bi navê *mustezata serbest*. Helbestên Arjen Arî ji nivî zêdetir bi vê şêwazê hatine nivîsandin. Ev helbestên ku navên xwe dane pirtûkên Arjen Arî *Şêrgele, Ev Çiya Rûspî Ne, Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî* bi nazma serbest hatine nivîsandin. Ev helbestên ku dirêj in ji çend beşan/bendan çêdibin.

“...

Xwezî, lewitîn di kirêtiyê de

û şer dizî ji me xewnên mîrekî

li herêmekê em ji gundekî

dijmin jî bûna malê me pev dima

neyariya me nedigih qewmekî

kengî bûya lev dihatin

em eydekê, erefatekê...”(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.50)

<sup>79</sup> Dilçin, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu yayınları, Ankara, 2004, r.385.



Ev helbest ji şeş bendan/beşan pêk tê. Kinbûn û dirêjbûna hevokan yek nîne. Hinek dirêj in hinek kin in û qafiyeye bi pergal jî tê de tune.

Helbesta *Şêrgele* jî gelek dirêj e. Ji deh beşan çêbûye. Her beş di nav xwe de bi şewazekê çêkiriye. Ji van sê beş bi formata çarînan hatine nivîsandin. Hin beş ji donzdeh rêzan çêbûne.

(....)

“Ew ên çeng eylo, ew ên bejn hey lo

Kî bû lo, kî bûn

Ew ên dil pola

Û gurçik risas? !” (Şêrgele, r.27)

Ev beşa jor bi nezma serbest hatiye nivîsandin, rêza ewil deh kîte yên dû wê pênc rêz in. Ev beşa jêr bi şiklê çarînê hatiye nivîsandin û deh kîte ne.

“Şêrgele hene; bê kêl û bê gorn

Şêrgele hene; şevçirax û heyve ron

Şêrgele hene; ji azadiya bi gon

Di bin axa sar de b’ axîn razayî!” (Şêrgele, r.28)

### 3.3. Malik(Beyît)

“Wateya beyîte ya ferhengê mal(xanî) e. Ev nezma ku ji du rêzan pêk tê û ji aliyê wateyê û kiteyê ve nêzî hev in jêre beyît/malik tê gotin.”<sup>80</sup> Di edebiyata diwanê de pir hatiye bikaranîn. Arjen Arî pirtûka xwe ya bi navê *Dastana Kawa û Azhî Dehaq* bi malikan nivîsandiye û sed û nod û yek malik tê de hene. Di pirtûka *Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî* de helbesta *Dêrsim Dêrsim* bi malikan hatiye nivîsandin.

“Çîroka Kawa û ê Babîlî

Arek gewez e hê li vî milî

Qetek jiyan e b’ peyv û çîrokî

<sup>80</sup> Dilçin, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu yayınları, Ankara, 2004, r.101.

Wejiya b'ar re dema dîrokî

Û bû hemberî, têhn da Adaran

Her vêketî ma li şûna waran” (Dastana Kawa û Azhî Dehaq, r.8)

(...)

“Êşek ket serî, hiş pê ve nema

Dehaqê mezin ket behra xema” (Dastana Kawa û Azhî Dehaq, r.14)

(...)

“Li dora Dehaq pev re civiyan

Bi reml û rûlan li ders geriyan” (Dastana Kawa û Azhî Dehaq, r.44)

“Di nav Kurdan de mêrxas û malbat

Merivek hebû: Kawayê heddat!” (Dastana Kawa û Azhî Dehaq,

r.62)

(...)

“Kawa got: bext me neda bi text

Te zilm dikir, û te şer dixwest!” (Dastana Kawa û Azhî Dehaq,

r.82)

Destana Kawa bi vî qeydeyî didome. Temamê wê malik in, her malik di nava xwe de bi qafiye ye. Honaka bûyeran bi zilma piştî nexweşiya Dehaq dest pê dike. Bi kuştina ciwanên Kurdan geş dibe. Û piştî Kawa derdikeve holê û Dehaq dikuje.

### 3.4. Şeweyên Din

Di nav dîwanên wî de du helbestên bi şeweyên cuda hatine nivîsandin jî hene. Ev şewe dişibin helbestên futurîzmê. Helbesta yekem bi navê “çîroka sêzdeh şev û sêzdeh rojan” e.

“di binê lingan de êşa behran

di binê lingan de agirê hêtûnan...

janê

dida kezebê

dîqîqîqî.

û laş

çar alî  
diricifî...

êş:

di binê lingan de...” (Payîza Peyvê, r.50)

Helbesta din bi navê “ji biharê re serhawe” ye. Ev jî bi şêweyek cuda hatiye nivîsandin.

“Lê biharê

Şox û arê

Gewrî rengê dinyayê

Qazûqerê

Şa û şer e

Xeml û ola Medyayê

...”(Payîza Peyvê, r.66)

## BEŞA ÇAREMÎN

### 4. DI HELBESTÊN ARJEN ARÎ DE ZIMAN Û ŞÊWE

Şêwe û dirûvê helbestê li ser rihê helbestê radibe. Helbest her çiqas ji nav civatê were der jî formata wê cuda ye. “Zimanê ku di helbestê de tê bikaranîn zimanê rojane nîne.”<sup>81</sup> Li gor van agahiyan em ê li ziman û şêweyê helbesta Arjen Arî mêze bikin.

#### 4.1. Hilbijartina Peyvan

“Geya di bin tehtan de namîne” bi vê gotina pêşiyên dest pê dibe pirtûka Arjen Arî ya ewil *Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî*. Ev gotin mizgîniya helbestên wî ne. Zimanê helbestê ji nav jiyane were der jî bi xwe jiyane din e. Em dibînin ku Arjen Arî ji wêjeya gelêrî gelek sûd girtiye. Lê peyvên wî sabît nînin. Li gor hestên wî reng digrin. Cardin jî Arî helbestvanekî nûjen e. Ji aliyê nûjeniyê ve tamek din daye helbesta kurdî. Pir caran peyvên di wateya wan a ewil de bi kar tîne. Helbesta wî yekhûne nîne, ji ber vê yekê jî gelek nîgaşên zexm di helbestên wî de hene.

“Şorbenîsk min ji bîr kir  
Tilîşewitî, hevrêşk û meyr  
Ji xweziya  
Tasek dims li ber min bûya  
Niha li vir...”(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.16)

Peyvên bi kar anîne ji nava jiyane derketine û hatine helbestê. Helbesta wî ji jiyane xerîb nîne. Doğan Aksan di nava helbestê de ji bo bikaranîna zimanê axaftinê wiha dibêje: “Bi rastî jî zimanê axaftinê bêtir nêzikî yê helbestê ye.”<sup>82</sup>

“Çavên min di hidûd de  
Du kanî ne li dû te  
Diherikin ji zû de  
Ava Bûnisra ez im” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.31)

<sup>81</sup> Yalçın, Mehmet, *Şiirin Ortak Paydası 1*, İkaros Yayınları, İstanbul, 2010, r.71.

<sup>82</sup> <http://dergipark.ulakbim.gov.tr/merisnjll/article/download/> 17.06.2015

Çavên xwe dişîbîne kaniyan. Çav hidûdê laşê merivan e. Du kanî ne li dû te, gotineke nava gel e. Piştî herikandina hêsrên û ava Bûnisrayê jî germahiya gel dide dilê merivan. Çav, kanî, herikîn di stranên gelêrî de jî gelek caran derbas dibin.

“Çalê Çalê gundê min  
Lê man tîrb û rezê min  
Cotê min, kesaxa min  
Qesra Silêman li wê bû”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.38)

Gotina van rêzan dişibe lorîkan. Navê gund, tîrb, rez, cot rasterast ketine helbestê. Helbestvan bêriya hertiştî kiriye. “Çalê Çalê gundê min” dubarekirina navê gund dilê merivan dilerizîne.

“Hij meyira kîs kir  
Nanê şilikî pê xweş bû  
Û çurtanê mîna kevir”(Ev Çiya Rûspîne, r.27)

Ev helbest bi zimanekî xwerû hatiye nivîsandin meriv bi rehetî jê fêm dike.

#### **4.2. Dubarekirina Peyvan û Dengan**

“Dubarekirina dengên û peyvên ji bo rîtm û ahenga nava helbestê ji hêmanên bingehîn in... Pir caran ev dubarekirin dibê sedemê dewlemendiya wateya helbestê.”<sup>83</sup>

Di helbesta Arjen Arî de dubarekirin bi du qeydan dibê: dubarekirina dengên û ya peyvên. Alîterasyon, asosans û tekrara peyvên gelek zêde ne. Ev yek kêmasî nîne.

“Herakol im ez, ez Herakol im”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.10)

“Dîsa jî  
Masîko dîsa jî”

<sup>83</sup>Korkmaz, Ramazan, *İkarosun Yeni Yüzü Cahit Sırkı Tarancı*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2002, r.312.

(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.12)

Peyv du caran hatiye dubarekirin, rast û çep. Wek hunera rucû' ê ye. Ev wateyê zixm dike.

“Berfê tu berfa serheda

Ba li te da, kur li te da”

(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.25)

Peyva “berfê” û “li te da” du caran bi kar aniye.

“Xwîn, xwîn!

Çiya xwîn, zîndan xwîn!

Sikak xwîn, bajar xwîn

Bi lilîn dîsa dijîm

Xwînêj

Xwînê bes birijîn” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.26)

Meriv xwe di nava gola xwînê de dibîne. Heşt caran bi kar aniye. Piştî peyva xwînê baneşan danîne û bala merivan dikişîne ser.

“Mebêj, çilo?

Mebêj, çi lo?

Do bû hêna do”

(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.34)

Peyva “çilo” û “çi lo” hevdeng in. Nivîsandina wan yek e lê wateyên wan cuda ne. Bi gotinekî fermanî bang dike.

“Ezê celî bibim

Ezê bê rez, ezê bê werz bimînîm.”

(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.35)

“Cih li me çiya ne

Cih le me niha

Nefî

Cêlî

Penaberî...” (Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.45)

Di van rêzan de jî peyva “ezê” û “cîh”, di dangan de jî ‘e’, ‘z’, ‘ê’ dubare kirine. Ev deng ji bo herikandina helbestê gelek muhîm e.

Helbesta *Mihemedo* jî pênc çarînan pêk tê. Di mabeyna her çarînê de peyva Mihemedo bi şiklê

Mi

hee

mee

dooo! hatiye nivîsandin. Ev şêwe di çend helbestê wî yê din de ji dewam dike. Helbesta “Koçerê” de “koçerêêê!”, helbesta “Kirîvê Kêvo” de “sersebebno”, helbesta “Noşîn Be” de “vexwe mamo, vexwe, ez xulamo”, di helbesta “Heyrano” de peyva heyrono yê, şervano yê, şerzano yê

heyy

şerr

şerr

raaa

vaaa

zaaa

nooo...

nooo...

nooo!

bi vî şiklî nivîsandiye. Ev ji bo helbesta Arjen Arî tiştekî sereke ye.

“Min hij te kir

Pirr pirr pirr

Dibû pirpira çivîkan li he

Qefesê” (Ev Çiya Rûspî ne, r.58)

Helbestvan bi peyva “pir” ê him dengê firînê dide him jî pîrbûna hezkirina xwe dide berçavan. Ev di aliyê helbestê de dewlemendî ye.

Ev terz di helbesta “mirî mirî” de jî didome.

“Û got: pe pû...bû!

Pe pû... bû!

Pe pû...bû!” (Şêgele, r.10)

“Bi qasî bimirin ji te hez kirin

Û mirin... mirin... mirin!

Bi her mirinê mirin bi min şîrîntir kirin  
Bi kêl bê kêl, kîjan dildarî rakim ji qebrê?  
Her yekî temenek bexşî te kirin!” (Şêrgele, r.13)

Di vê helbestê de jî meriv bi dubarekirina peyva mirinê û kêlê ve, xwe nêzîkî mirinê dibîne.

“Ku dil bidî ji dil bide  
Dil didî dil bi dil bide  
Di ber de ser û cil bide  
Dil sa ye, dê bireyê” (Çilçarîn, r.49)

Di pirtûka wî ya bi navê “Çilçarînê” de hema bêje di hemû çarînan de dubarekirina dangan heye. Di nav wan de ya herî baş ev çarîn e. Bê şîrove min li jor nivîsî.

### **4.3. Nîgaş û Rêberdana Peyvan**

“Ew tiştên ku di helbestê de tişteki, hebûnekî, ramanekî dixin bîra merivan jê re nîgaş tê gotin.”<sup>84</sup> Ji bo nîgaşan Ramazan Korkmaz jî wiha dibêje: “Ev rihê ku ji raperandina rastiyê bîhteng dibe; ji tiştên bi dawî, bi sînor û sinêde ber bi tiştên bê dawî, bê sînor û jêbihurî ve vebûn e.”<sup>85</sup> Nîgaşan vediqetîne çaran. Ev nîgaş ev in:

#### **4.3.1. Nîgaşên Belavbûyî**

Ev nîgaş hertim tiştên nû tînin hişê merivan. Meriv di her xwendinekê de rastî wateyên nû tê.

#### **4.3.2. Nîgaşên Noqbûyî**

Ev nîgaş rasterast şibandina tiştan nade ber çavan. Wate di binê lihêfa peyvan de ye. Meriv ji bo têbigihije piçekî li ser mijûl dibe.

#### **4.3.3. Nîgaşên Radikal**

Helecana nîgaşên radîkal kêr in lê di aliyê dijberiya peyvan de girîng in ji bo helbestê. Li ser dijbertiya peyvan ev nîgaş çêdibin.

#### **4.3.4. Nîgaşên Tîr**

Nîgaşên tîr dişibin tabloyên minyaturê. Girîngiya wan ji dîroka çandî tê. Em dê niha li nîgaşên helbestên di Arjen Arî de derbas bûne mêze bikin.

“Çiya behitî, newal heyirî

<sup>84</sup> Alkan, Erdoğan, *Şiir Sanatı*, İnkılap Kitabevi, İstanbul, 2005, r.608.

<sup>85</sup> Korkmaz, Ramazan, *İkarosun Yeni Yüzü Cahit Sırkı Tarancı*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2002, r.274.



Tahtê nekirrî axê neheband...”(Şêrgele, r.10)

Di vir de taybetiyên mirovan ji bo sirûştê bi kar tîne. Heta mînakên wiha gelek zede ne di helbestên Arjen Arî de. Em jî dizanin ku çiya nabehîtin, newal naheyirin lê ji bo giringiya vegotina xwe zixm bike ev rê ecibandiye.

“Miriyan jî dikujin di vî şerî de!” (Şêrgele, r.11)

Wateya helbesta Arî gelek giran e. Rasterast wateyek wê heye lê di bin de hezar derî vedibin. Meriv carekê dimire ango gava mir êdî kuştin ne gengaz e. Bandora mirinê û giringiya şer encax bi vê gotinê temam dibe. Ev nîgaş gelek zexm e.

“Wehêsaneke e mirin  
Jiyan çem e” (Şêrgele, r.14)

Jiyan û mirin birayên hev ên cêwî ne. Lê naşibin hev, rengê zer be ya din rengreş e. Mirin ne xilasbûna jiyane ye; mirin, ew tiştê ku vehêsa xwe digre û dûvre jî di rêya xwe de dewam dike. Jiyanê dişibîne çem. Çem diherike û tê de heyat heye.

“Azadî spî be mirin jî spî ye” (Şêrgele, r.16)

Di mabeyna mirinê û azadiyê de rengê spî daniye. Spî paqijî ye safîtî ye. Nîgaş zixm e, azadiyê dibêje jiyane tîne bîra merivan. Jiyanê azad bi mirinê azad diqede.

“Rûyê te sed şoreş in  
Xewna min qaht e” (Şêrgele, r.18)

Ji bo rûyê dergistiyan hezar tişt hatiye gotin di helbestan de lê tu kesî rûyê hezkiriya xwe neşibandiye şoreşê. Di şoreşê de bizav heye, hêvî heye. Şoreşek jî nîne sed şoreş in.

“Porê her yekê  
Guliyek şevê” (Şêrgele, r.19)  
“Li welatê por roj” (Şêrgele, r.21)

Por di helbesta Arjen Arî de wek guliyê keçên piçûk cih giritiye. Reşbûna poran dişibînî şevê, lê Arî wê dike guliyê şevê. “Welatê por roj” jî nigaşek cuda ye û dijî *guliyê şevê* ye. Şev reş e, tarî ye; roj spî ye ronahi ye.

“Guvîna bê sirûdekê  
Dixulxulîne guhê demê” (Şêrgele, r.22)

*Guhê demê* nigaşek balkêş e. Guhê demê ker e carinan ji bo hinekan. Lê ba peywira xwe bi cîh tîne. Di guhê demê de sirûdê dixulxulîne.

“Mirinê serê xwe çimand li ber mirina wan”  
(Şêrgele, r.29)

Di nava helbesta Arjen Arî de herî pir nîgaşa mirinê heye. Mirina ku ji xwe dizê, dujminê jîyanê ye. Helbestvan ji mirinê bêtir şiklê mirinê dide ber çavan. Mirin dê çawa serê xwe biçimîne?

“Jiyan asikek por ewr bû” (Şêrgele, r.31)  
“Zeman xezaleke bezoke”  
“Temen hespek e rehwan”  
(Ev Çiya Rûspî ne, r.22)

Ev nîgaş gelek giran e. Di mabeyna asikê û jiyana wî de ewr hêsiran dibarînin. Ewr dê bigurên di wê gavê de. Şêr li dû asikê ne. Şêr dibe mirin, asik dibe jîyan lê ev di helbestê de vêşartî ne. Zeman û xezal, temen û hesp di hişê Arjen Arî de zû zû derbas dibin.

“Hêvî serberjêr e.” (Şêrgele, r.34)

Wexta ku li merivan biqewime serê merivan dikeve ber merivan. Hêvî serberjêr e lê naxwaze bibêje hêvî tune.

“Di sêdarê de tifalek bû Mehabad!” (Şêrgele, r.40)

Komara Mehabadê hê nebû dewlet ji holê rakirin. Şa'ir jî mîna zarokan dibîne, dibêje meriv zarokan di sêdarê de darda nake.

“Kerbê li xwe bipêçe” (Şêrgele, r.41)

Li hember hinek bûyeran tu tişt ji destê merivan nayê. Kerb di laşê merivan de sor sor digere. Ew vê yekê dike helbest. Kerbê mîna kincekî dibîne. Vê kincê li helbestê dike.

“Dem di dergûşê de kal bû” (Şêrgele, r.42)

Derbasbûna demê herî baş li ser temenê dergûşan kifş dibe. Salê demê bi emrê me dema xwe digre. Her dergûş temenê wî hebe rojekî dê kal bibe. Arî bi zimanekî arî u kurtasî dineqîşîne nava helbestê.

“Çiyayê xewnan şewitî heyran”  
(Şêrgele, r.46)

Xewn û çiyayê bi hev re bi lêv dike. Mezinahiya xewnên xwe bi bilindbûna çiyayan dide ber çavan. Ev çiya çi ne gelo di xewnan de cih girtine?

“Hêviya hatinekê dipurîsînîm”  
(Şêrgele, r.52)

Meriv dikare tiştên şênber bipurîsîne. *Hêviya hatinekê* razber e. Ew vê yekê bi hêvî dipurîsîne.

“Di çavên te de vemirîn çil biharên hevrişmî”  
(Şêrgele, r.56)

Çav eynika dilan e. Çav carinan bi jîn mêze dikin carinan bi xilmaşî dinêrin. *Çil biharên hevrişmî* ne di çavan de vedimirin. Ev nîgaşên hanê yên zixm ji bo helbesta Kurdî ya nûjen gelek muhîm in.

“Kirasê tebaxê wergirtiye adarê”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.23)

“Kirasê bûkaniyê li xwe girtiye Nemrûdê”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.48)

“Egal xwar kiriye Qerejdaxê”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.48)

Di van her sê rêzan de jî taybetiyên mirovan dane ser sirûştê. *Kirasê tebaxê, kirasê bûkaniyê, egal xar kirin* ji bo helbestê nîgaşên zêr in. Nîgaşên wî ji nava jiyana wî, ji erdnigara wî dertên. Meriv çî bajo wê diçîne.

“Bindestî di gewriya te de ta ye.”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.60)

Azadî ne têrbûna gewriya merivan e. Di vir de gewrî bi du wateyan jî meriv dikare bifikire. Yek qirik: dibe ku mûyekî lê were û meriv bi rehetî jê dike û ji bindestiyê xelas dibe. A diduyan jî gewrî derê zikê merivan e. Ger zikê merivan têr nebe meriv piçekî bindest e.

“Megrî çav deryayê megrî  
Megrî por roavayê megrî”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.65)

Çavên deryayî, porên roavayî dirûvandinek/şibandinek xweş e. Derya û ro tiştên berze û kûr û dûr in. Bi van nîgaşan dûrîtiya xwe û rindbûna wê dide ber çavan.

“Xwerû biharek e serhildana êşa min”  
(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.68)

Serhildan bi piranî di demsala biharê de dest pê dikin. Êşa dilê wî mîna biharê ye lê bihareke xwerû. Heger biharê av, baran tune be serhildana sirûştê pêk nayê. Êşa dil bê av e, serî hildide lê encam ne kifş e.

“Em in hevîrtirşê semaxê”

(Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, r.71)

Semax gelek zor e. Li hember pir tiştan para wî semax maye heta ew bixwe hevîrtirşê semaxê ye. Ji xeynî van ev nîgaş jî bi kar anîne:

“Êşên xwe me tev kuştin r.72”.

“Darên berû ta digrin”

(Ev Çiya Rûspî ne, r.15)

Heft meh e berf e barê me”

“Ku gur xwe li gur dipêçe”

(Ev Çiya Rûspî re, r.16)

Nîgaşa dara berûyê di çend cîhan de derbas dibe. Dar ji serma ta nagrin. Lê ji bo zehmetbûna zivistanê ev gotin hatiye gotin. Wexta ku meriv van rêzan dixwîne matmayî dibe. Ewqas xweş sêwirandiyê ku berf û serma û seqem tu dibêjî qey bûne kêşeya helbestê. Wekî din ev nîgaşên li jêr jî balkêş in.

“Kuştin hêsrên mirinê ne”

(Ev Çiya Rûspî ne, r.19)

“Bi temenê xwe re mam penaber”

(Ev Çiya Rûspî ne, r.35)

“Her hij ceng e”

(Ev Çiya Rûspî ne, r.41)

## BEŞA PÛNCÊMÎN

### 5.ŞÎR Î ŞÎROVE

Şîrovekirina helbestan karekî giran e. Şîrove noqbûna binê hişê helbestvanî/ê ye. Meriv di vê behra peyvan û wateyan de li dû masiyan e. Carinan masî carinan jî mar, kêvjing tên tora merivan. Ev jî tê vê wateyê ku şîrovekirina helbestan rasterast ne ji hişê helbestvanî/ê ye. Şîrovkar dê pêşdaraz an jî alîgir nebe. Di vî warî de Remezan Alan li ser mesnewiya Mem û Zînê rexneyek baş nivîsiye.<sup>86</sup> Me xwest ku em hestên Arjen Arî hîs bikin

#### 5.1. Ev Çiya Rûspî Ne

‘zêr zane, zor zane; devê tivinga dev bi mohr zane!’

Şax dide di dilê min de hisreta te her bihar

Her bihar bi guliyên nû dibişkive her adar

Pirtûk bi van gotinan dest pê dike.

#### Sebra mino çiya

Helbestek ji aliyê mijarê ve bi şax e. Di navenda helbestê de dotmam rûniştiye. Di aliyê din de pismam heye û li dor dotmama xwe sebra xwe li çiyên diwestîne. Hinek romantîk hinek jî lîrik e. Çiya serê xwe di bin berfê de dihecîne. Hatina biharê nêzîk e. Bêrikirin xal bi xal li çefiya wî bûne nexş.

“Dor bi rêşî, çarçik

Û pitiksor e çefiya min.

Dotmama min kiriye xelat.

Ji sûka Qamişlokê kirriye û şandiye

Bîhna bîhokê jê dihat, hê tê

Çav kil kiriye di sûret de

Û porê reşî, bi ser de daye ber bê...

Heyrano çiya,

Kiras û xeftan wisa

<sup>86</sup> Alan, Remezan, *Bendname Li Ser Rihê Edebiyatekê*, Avesta, İstanbul, 2009, r.19-50.

Ka

Li bejna kê tê!” (r. 10)

Bêhna evîneke kevn ji helbestê tê. Evîndar bi diyarî û wêneyan li hev tèn. Dotmamê li sûka Qamişlokê çefiyek pitiksor kiriye ji bo pismamê xwe. Wêneyek xwe jî xistiye navê. Çavên wê bi kil in, porên wê bi ser de li ber bayê ye. Bi çiya re qise dike dibêje *heyran* çiya: dixwaze ku çiya jî rindbûna dotmama wî bibîne. Nazma helbestê serbest e. Ji aliyê hunerê ve tiştêkî pir cuda têde tune. Pejn û ramanên xwe anîne ziman.

### **Cûdî**

Mijara helbestê ji kolanên dîrokê derketiye û heta vî zemanî hatiye. Tofana Hz.Nuh li ser çiyayê Cûdî bi dawî dibe lê ev çiya hertim qada şer e. Qad û qeder tevlihev bûye. Helbest ji pênc beşan pêk tê. Di beşa yekem de çiyayê Cûdî dide qisedan.

“Cih dabime Nûh

Bi geh kiribim qewmê sefînê

Paxila min e zozanê jînê

Awirên te bigerin li pelçimek zeytûnê

Li dû kevokekê tu binihêrî

Di bûkên çavên te de me

Serî hilde, siha min diavêje ser te

Cûdî me, Cûdiyê mirada me.” (r. 11)

Di vê beşê de behsa tofana Hz.Nuh dike. Çiyayê Cûdî qise dike û dibêje ku min cih daye sefîna wan, ez ji wan re bûme rawestgeh. Paxila Cûdî zozana jînê ye. Dibêjê ku heger tu aştxwaz bî û awirên te li pelçimê zeytûnê bigere û tu li kevokên aşitiyê binihêrî dûr meçe. Ez di bûkên çavên te de me. “Bûkên çavan” nîgaşek xurt e. Bûk tê du wateyan ku di mabeyna her du wateyan de jî têkileyek xweş çêdibe. Bûk ji bo merivan dibe jiyan meriv bi bûkan jiyana xwe nû ava dike, bi nêrînek erênî li jiyane mêze dike. Çiyayê Cûdî dibe mirada merivan.

“Birakuj bû Qabîl, lew bê yar û war ma

Yê berê xwe da min stirî, kî hejar ma?

Kevokê haşî gerand, yê jê bêpar ma

Siltanek, qeranek... tacîdar hikumdar ma?” (r. 11)

Destpêka jiyana mirovan biqetl didome. Qabil û Habîl birayên hev in. Lê Qabil çavnebariyê dike. Qabil bi çavsorî birayê xwe dikuje. Cûdî jî naxwaze jêre bibe yar. Cûdî têra feraqên kevn e. Kê berê xwe dayê jêre bûye yar. Kevokên aştiyê haşiyê digêrînin lê yên jê bêpar mane siltan jî bin kesek ji wan nemaye. Helbestvan di vir de çiya bi nêrînek erênî dide pêşberî me. Çiyayê Cûdî aştxwaz e, kevokên aştiyê li ser disekin.

“Ji qewmê mêjû Nûh ên nû rabûne;  
Sêngbetl, çengkevok, awirbaz in.  
Ser û bin haşîşer, daxwaz in  
Û xwe li min girtine.  
Ez Cûdî me,  
Cih dabimê kê mirad jî dame  
Ew; şerkerên daxwazê, ez çepera wa me” (r. 11)

Di dirokê de tofana Nûh pêk hatiye. Li dû qewmê Nûh(a.s) qewmên nû hatine. Di dirokê de Nûh ên nû rabûne. Ev jî mîna Nûh pêxember sêngbetl, çengkevok û awirbaz in, aştiyê dixwazin. Di çengê wan de kevokên aştiyê difirin, awirên wan jî mîna yê teyrê baz in. Ango ew ji aştiyê hez dikin ne ji ber tirsan; ew mîna teyrê baz jî li dujminê xwe dinêrin. Çiyayê Cûdî çepera şer e. Kesayetî daye çiya.

### Çarîn

“Kîjan demsalê bipesinînim bi navê te  
Rûyê te gulan be, nîsan in hinarkên te  
Bihar bi xwe diheside wan çavan  
Û temmûz didexise j’lêvên te!...” (r. 13)

Di vê çarînê de hunera tevriyeyê bi kar aniye. Meriv dikare bibêje ev çarîn ji bo evîndara xwe nivîsiye lê xoşewîstê helbestvan cihê cihê ne. Hinek caran utopîk in hinek caran welat in, çiya ne. Di vê çarînê de em dibînin ku her demsal bi rengekî dixemile û dilê evîndarên xwe li xwe mat dihêle. Ev evîndar pir hêja ye bêhempa ye. Rûyê wê gulan e, hinarikên wê nîsan. Tê zanîn ku barana meha nîsanê gişt bereket e. Ev şilî axê av dide, ax



bi avê tijî dibe. Piştire di axê de gulên sor hêşin dibin, gulên mîna hinarikên yarê. Bi vekirina çavên yarê nêrînên jiyane jê dipekin û piştire bihar bi xwe dihese. Di meha temmûzê de fêkî sor dibin, sorbûna xwe ji lêvên yarê digirin. Demsal û yar û erdnîgarî di pir helbestên Arjen de babetên helbestê ne. Ji çolê hez dike, ji çiyane hez dike lê herî pir ji yarê hez dike.

### **Berê min ketiye Xozatê**

Helbestên Arjen Arî bi gelemperî kin in. Helbestên wî yê dirêj mîna honaka roman û çîrokan didomin. Meriv xwe di nav bûyerên romanane de dibîne. Di vê helbestê de jî çiya û evîndar bi hev re cih girtine. Helbest li herêma Mêrdînê bi barana berfê dest pê dike. Berfa ku hersal nabare ji bextê xezala wî bariye û li benda hatina xezala xwe ye. Naxwaze were, bextê berfê mîna rengê berfê spî nîne. Berfê çiyayê Omerya girtiye û digihîje kaba lingan. Helbestvan dîmenê wiha dikişîne:

“Zû bi zû nagire  
Û nabare her sal  
Ji çirra sîr spî, delal  
Burfê girtiye Berîka Mêrdînê.  
Tu bibînê, li çiyayê Omerya tê kabê  
Dibêjin heta adarê ranabê!  
Xezala'm mekeve rê,  
Tu bi ser min ve nabê!...” (r. 14)

Di berdewama van ristan de helbestvan teswîra xezala xwe dike. Ev xezalek bedew e, serma zêde ye, nêçîrvanên xûnrêj di kemînan de li bendê ne. Lingên vê xezalê hinekirî, porê wê mifil mifil e; di bin hepriya hevrişimî de biskên wê erebî ne, di gerdana wê de mircan, pozê wê de xizem hene... cardin jî xwestine. Lê xezal ji ser van çiyayan reviyane, nenas e, nezan e û çiyayê Mûnzir jî ji aliyê mijeke kor ve hatiye daqulandin.

“Bi lingên hinekirî min tu divê  
Bi porê mifil mifilî  
Di bin hevrişmiya heprî de berbiskên erebî  
Gerdana te de mircan, bêvilê de xizem...”

...

Dîsa dayê...  
Xezala'm mekeve rê;  
Darên berû ta digrin  
Tu û vê sermayê!.." (r. 15)

Di van rêzan de meriv xwe di nava zivistanekê de dibîne. Mîna teswîrên romanên Êris ên realîst zexm e. Ta girtina darên berû hem nigaşek xurt e, hem jî rêzek edebîye.

"Mîrekê demê çile ye niha  
Tu rê naçe ser riya hêviyê  
Çefiyê dipêçim û dikim gilokek xem,  
Li hêviya adarê ye cehinnem  
Ê ez û tu  
Ê ez û Mûnzir  
Ê ez û Tûjik...  
Heft meh e berf e barê me.  
Ku gur xwe li gur dipêçe  
Ê hirç nayê der ji gehê!  
Dîhnek e,  
Difikîne û tê  
Sirra reşemehê!..." (r. 16)

Hêviya helbestvan qet tune û tu rê naçe ser riya hêviyê. Her tişt li hemberî wan e, diwartî para wan e. Ji ber sermayê çefiya xwe li sere xwe dipêçe lê germ nake, li serî dibe gilokek xem. Ango şaîr xwe ji bîr kiriye, xeynî derdê xezalê tu tişt hişê wî de tune. Ev nîgaş di kilameke Dengbêj Ehmedê Bêrtî de jî wiha derbas dibe: "Mîna saûna Helebê dor serê xwe..." cehinnem dixwaze ku meha adarê were. Serma û seqem zede be, hêviya wê ew e. Şert û merc hê jî giran dibin. Gelo çawa "*li hêviya adarê ye cehinnem*". Meriv çawa di nava berfê de tere xwar wer di nava vê helbestê de jî tere xwarê. "Heft meh e berf e barê me" ev gotin ne gotineke şaş e. Li welatê Serhedê zivistan di bin sîsbûna berfê de reş dibe. Pêşiya meha adarê meha sibatê heye. Di meha sibatê de gur bi hev re digerin û êrişî merivan dikin. Gurên birçîn e û di zargotina Kurdan de dibêjin "gurên sibatê"ne. Ev gur jî

ji ber sermayê xwe li hev dipêçin, “*ku gur xwe li gur dipêçe*”. Şa’ir dîmenek wilo dikişîne meriv di orta havînê de dicemide.

“Ji êvar de dayê!  
Xezal’ m mekeve rê,  
Ha riya Dêrsimê ha ya Kerbelayê!” (r. 16)

Bangî xezala xwe dike. Dibêje mekeve rê. Ev rê merivan dibe Kerbelayê, di herikîne xwîna Husênê Fatimayê... Buyera Kerbelayê bi qetla Hz. Husên(r.x.l) dawî dibe. Xelkên Dêrsimê jî kumsurîne ango ehl-î beyt in. Şa’ir vê yekê jî dide ber çavan.

### **Ehzemallahû ecrekûm**

Dilşikestî ye Zivîng  
Û payîza dawî.  
Rêwî  
Xembar in li pêrginiyê...  
-ehzemallahû ecrekûm...  
Mirinê bilikum... (r. 18)

Ev helbest zêmarek/mersiyek nûjen e, li ser kuştina apê Musa (Musa Anter) hatiye nivîsîn. Zivîng gundê Apê Mûsa ye û dilşikestî ye. Rêwî li pêrginiyek xembar in, li pêrginiya mirî kî ne. Porê wî spî ye mîna berfa Cûdî. Wexta ku yek bimire vê gotinê dibêjin: “ehzemallahû ecrekûm.” ango Xwedê xêr û bera wî zêde bike. Bi kuştina wî ew ji holê ranabe. “Me dahişt dîroka azadiyê”. Şa’ir bi van çend gotinan helbesta xwe têr dike ji mirinê:

“Em xwazgîniyê welatekî” , “kuştin, hêsrên mirinê ne”.

### **Çûkên Şer**

Heger çûk û şer di pevçûnekê de cih bigrin, hûn bizanibin ku şer gelek giran e. Cara yekem çûk bi navê “teyrên ehabîl” şer dikin. Ji wê rojê heta sedsala XX. çûk di nava hestên xwe de pûç dibin û çûkên balafir ên agir dibarînin derdikevin holê. Ev çûk “bask pola, nikul pola, yên şer in, mirinê bar dikin û diçin”

“Çûkno,  
Hûn ne yên xêrê ne!

Ne yê şûr û hûn ne yê rimê ne!”

(...) (r. 20)

### **Nûçe**

Di navê helbestê de diyar e ku nûçeyekê tîne ziman. Helbestvan rojeva welêt dişopîne, lê helbestvaniya xwe ji bîr nake. Dilê wî serî hildaye, li ser piyan e, qasî deh çîyan e.

(...)

“Dilê min li ser piyan e

Dilê min bi qasî deh çîyan”

(...)(r. 21)

### **Çûbe...**

Di zimanê helbestvan de pênasoya tiştan diguhere. Zimanê şa’ir zimanekî alegorîk e. Her tiştî dişibîne tiştêkî din. Tişt bi tiştan tê zanîn. Şa’ir hestên xwe wiha diherikîne ser kaxezê:

“Zeman xezaleke bezok e

Temen hespek e, rehwan.

Buhurî li yek tûşê

Revand ciwaniya bê rism

Û serberdayî!” (r. 22)

Xezal û hesp di nava jiyana civatê de gelek cih digrin. Xezal bi bedewiya xwe û beza xwe tê zanîn. Mirov hezkiriyên xwe dişibînin xezalan. Xezal zû baz dide, di çavên xezalan de birûskên jiyane vedidin û tirs tu carî ji çavên wan kêr nabin. Şêr her tim qesda canê wan dikin; helbestvan jî zeman dişibîne xezalê. Dem, zeman zû zû diherike û her tim mirin mîna şêrekî li dû ye. Emrê merivan jî dişibîne hespekî rehwan. Hespên rewan bi leza bazdana xwe tên zanîn. Zeman û temen, xezal û hesp ciwaniya merivan direvînin bi pîrbûnekî ji bîrbûyîn.

“Çûbe temeneke –gorî çavên te-

Deriyê dil vekirî ma, heta dawî radayî

Çend helbest meyan di sirikahiyê de

Hemû evîn li sînorekê diqediyar  
Di deşta payîzê de dîsa tu bi min re mayî!” (r. 22)

Çav sînemaya rihê merivan e. Rihê merivan di çavên merivan de xwe eşkere dike. “li gorî çavan wê yekê temenek çûbe” dibejê.... bi wê çûyînê derê dil nayê girtin û di wê sirikahiyê de çend helbest meyane jî nayê zanîn. Li dû çûna wê şaîr her tim li bendê ye, û derê dilê xwe vekirî hiştiye û helbest nivîsandine. Bi gotina helbestvan be “hemû evîn li sînorekê diqedin” lê “di deşta payîzê de” dîsa ew ji wî re maye. Bi vê gotinê ji sînorekê li evîna xwe danayne.

### **Her êvar**

Mijara vê helbestê jî şexsî ye. Li ser dilbijokiya xwe nivîsiye. Dilê wî li ser çanda welatê wî şeklê xwe girtiye.

“Kereng-mast  
Qelîsêlk  
An nan û pîvaz  
Tasek dewê sar hebe li ber  
Girara te rijî rijî tere xwar” (r. 23)

Ev ristên jor piçekî dişibin helbestên Orhan Veli\*<sup>87</sup>. Navên xwarinan li dû hev rêz kirine û dilbijokiya xwe hinekî kifş kiriye. Her çiqas ji van xarinan hez bike jî mebesta wî ev tişt nînin. Em vê yekê jî ji ristên dû wê hatine dibînin. Qesta wî hezkiriya wî ye û cînsîtiye.

“Birçiyê te me ez birçiyê te  
Qesta goştê te dikim her êvar” (r. 23)

### **Heyrano**

Ji çiyayê Tûjik – ku  
Bi çil qevzî çilçav-  
Ji te re anîme ev çeng av.  
Ka vexwe heyrano,

<sup>87</sup><http://www.insanokur.org/yuz-karasi-degil-komur-karasi-orhan-veli.html>, 25.12.2014

\*Orhan Veli Kanik: Helbestvanekî Tirk e. Di Salên 1914-1950an de jiyaye. Bi navê “Garip” pêşengiya bizaveke edebî ya helbestê kiriye.

Tu tî yî, tu tî!

Û tu birîndarî jî. (r. 24)

Helbest bi van rêzan dest pê dike. Ji navê helbestê xûyaye ku bi şêweyeke bangî didome. Helbest ji pênc beşan pêk tê. Di navbera beşan de sê gazîn hene: heyrano, şervano, şerzano... Bangî “Pezkoviyê Cûdî” dike. Rêza duyemîn û sêyemîn de bi peyva “av”ê qafîye çêbûye. Bi çengek av tîbûna birîndaran nareve.

“Zelal, ava qirr qeşa

Çeng bi çeng bidim te jî

Tu tî yî, tu tî!

Heyrano,

Tu têhn î li qurtek azadî” (r. 24)

Em di van rêzan de dibînin ev tîbûn ne tîbûna avê ye. Av jiyan e; heger tune be jiyan jî tune ye. Heger av hebe azadî tune be ev jiyan jî ne tamam e. Av û azadî bi hev re armoniyek xweş çêdikin. Meriv ji bo av û azadiyê heta bimire an azad bibe li berxwe dide. “Qurtek azadî” erzan nîne.

“Xwîna te ye diherike nolî êrîş bike axê

Têntir ji te xuya dike axa tu lê evîndar

Dirêjî çiyar dibin destên te î rûmetdar;

Bajar bêpêjn dimîne, diyek dike hewar:

Şer

Zaaa

Nooo!...” (r. 25)

Heta ku meriv xwîne nede axê, ax azadiyê nade merivan. Wexta ku xwîna şervan diherike û êrîşê axê dike meriv dibêjî qay ev ax ji şervan tîtir bûye. Şervan têhnî azadiyê ye ax tîne xwîne. Di vê têkoşînê de bajarên bêpêjn mane ji vî halê fêma nakin ku rihê bajarên di bin betonê de miriye.

### **Çarînke**

“Meryema bêrî ye ji gunehan  
Îsa gunehkar e ku bû pêxember!  
Doxinsistiyê mekin stuyê Zuleyxa;  
Bipirsin ji lawîtiya Yûsifê esmer!...” (r. 26)

Çarînên helbestvan piçekî felsefî ne. Li ser qedere û dîrokê şîrove ne. Ev Qisseya ku di Qur’ana pîroz de derbas dibe tîne bîra me<sup>88</sup>. Hz. Yûsif şikl û sîmayê xwe pir bedew e. Zuleyxa ji ber rindbûna wî xwe nagre û aşiqê wî dibe. Helbestvan Zuleyxayê mafdar dibîne.

### **Besê**

Di vê helbestê de pesnê jineke şervan dike. Govanê vê jina camêr çiyayê Munzir e. Çiqas şervan e ewqas jî dîlzîz û ezîz e. Bi sirûştê re heval e, di qîzantiya xwe de keçek delal e.

“Hij bîhna sosinê kir,  
Hij zerahiya nêrgizê  
Hij sorahiya xecê...  
Ji axê hezkirin bêguneh bû!...” (r. 27)

Gunehên wê ev bûne: Ji gul û çiçekan û axê hezkiriye.

### **Dem payîz e**

“Hinar sor in bîhok zer e  
Li dû quling qaz koçber e  
Bi gûzê re j’ gûn diwere  
Gewez bûn pel li çinarê” (r. 28)

Helbestên Arjen Arî bi piranî bi teşeyeke serbest hatine nivîsandin. Lê ev helbest ji pênc çarînan pêk hatiye û bi qafiya “aaab, cccb, dddb, eeb” yê hatiye honandin. Di vê helbestê de meha payîzê ji xwe re kiriye mijar û wêneyê payîzê kişandiye. Helbest lîrik e.

<sup>88</sup> Kuran- Kerim ve Açıklamalı Meali, Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2012.

“Dem payîz e xem payîz e  
Dilînek bi dil dilîze  
Nola hemû daran zîz e  
Hinar û danê êvarê” (r. 28)

Kalbûn û pîrbûna merivan jî mina dema payîzê ye. Meriv xemgîn dibe, tişteke dilê merivan kul dike; danê êvarê wexta ku roj diçe ava temenê merivan jî ber bi goran dimeşe. Hinar sor sorik in dê xwîn jê biherike.

### **Gazîn**

“Çavên min bide, generalê min,  
Tu çavên min bide ji kerema xwe.  
Te du çav hene generalê min;  
Min ew winda kirin û du destên xwe  
Ez Memedê te me, generalê min  
Te ez şandim şer û te negot min  
Şerê ku tu diçiyê çavan jî dixwe!”(r. 29)

Ev helbest rexneya şer dike. Şer jiyanê qirêj dike. Çavan li merivan kûr dike, destan ji merivan jê dike. Meriv bi şêranî dikeve navê lê bi nîv mêrani jê derdikeve. Di şer de ên tîn kuştin an birîndar dibin leşker in, tişt bi fermanîdar û genaralan nabe. Helbestvan vê nakokiyê bi zimanê leşkerekî tîne ziman û dipirse û dibêje kanê?

### **Çarîn**

“Pal li repin berî wî li rojê bû  
Ava tirî bû ya ku vedixwar  
Her risteyê de bi gilî, stemkar  
Xeyyam jî evdalekî Xwedê bû!” (r. 30)

Arjen Arî ji çarînan pir hez dike. Behsa Emer Xeyyamê<sup>89</sup> helbestvanê çarînan dike. Felsefeya Xeyyam li ser valabûna dinê ye û li ser vexwarina şerabê ye.

<sup>89</sup><http://www.hayyam.com/omer-hayyam/secme-dortlukler/> 25.12.2014



### **Tu jî dipê!**

Rastiya çiyân û xewna çiyê naşibe hev. Çiya ji bo arambûna dinê li ser dinê hatine danîn. Mirov ji bo debara xwe hem li çol û deştan hem jî li ser çiyân li dû rizqê xwe ye. Her wiha ajal û heywanên hov jî çiyân ji xwe re dikin hêlîn û mesken. Li ser çiyân pirê caran şer jî derdikevin. Di sedsala XXan de çiya ji pir kesî re bûne gor. Helbestvan bala xwe daye çiyayekî û diheyire. Çimkî her tim dengê top û tîfîngan jê hatiye.

“Bi kendalên bedew, bi guherên xweşik

Warên kewên gozel e...

Li van pezkoviyân binêre hele

Li van asika, li van keriyê xezala

Bi êvarê re siyê baskek avêtiye gîlala!

Û ez dikevim heyrê

Û dipirsim:

Çiyao tu kîj çiya yî?

Tu û vê rewsê!..” (r. 31)

Şa’ir berê dîmenekî dikişîne dide pêşiya me. Meriv dibêje qey kartpostalek e. Lê dilê wî rihet nîne. Bawer nake ku ev çiya li vî welatî be. Di nava vê dîmenê de “dûpişk razayî, mar razayî” ne. *Mî ketine çêre bilûr stranê dide bê.*

### **Çengek ax an jî rojekê helbet**

Ev helbest li ser bîranîna nivîskarê kurd Osman Sebrî hatiye nivîsandin. Her nivîskar hesret û derdên xwe bi xwe re dibin binê axê. Li ser axê dilê wan bi têra dilê xwe nejiyane. Heger xwesteka wan azadî be, navê azadiyê çengek ax e. Di mabeyna axê û termê mirovan de têkiliyek girîng heye. Rihê merivan di nava axa merivan de zîl dide û cardin li ser axê ber bi ezmanan ve fir dide.

“Çengek ax te dawerivîne ji hisretê

Ji biyanetiyê ger te derîne çengek ax” (r. 33)

Hinek têrî dinê nabin. Hinek bi hisreta çengek ax diçin. Heger çengek ax hebe dê tu hisret nemîne ji Mîrza Osman re. Çengek ax hebe kek Osman ji biyaniye xelas bibe. Ax û azadî birayên hev ê cewî ne. Ji hev naqetin. Bilbilê dikin qefesa zêrîn jî ew dibêje ax

welatê min. Welat ax e û azadî ye. Bilbilê şair û Osman Sebrî bi dengê xwe yê xweşik êşa wan a azadiyê dixwîne.

*Endeliyê êşa min û te dixwîne: “Azadî Rind e”*

Piştî van rêzan azadiya dilê xwe rêz dike.

“Azadî kurd e mamô!  
Azadî gerîn e bi fikîn li sirtên Kolik.  
Azadî nêrîn e têr têr li yarê  
Azadî meşîn e di kolanên Amedê de bê tirs  
Û azadî mirin e ji kurd re, mamô  
Nemirine, kî miribe li dû azadî.” (r. 33)

### **Çarîn**

“Bêndera evînê li kê cihlivîn ma?  
Vezilandî bi tenê kî maye li ser?  
Şerê evînê de min dil gorî da  
Bi temenê xwe re mam penaber.” (r. 35)

Ev çarîn dişibe çarînên Xeyyam. Evîn tişteki cuda ye û nakeve binê qeyd û zincîran. Nakeve çarçoveki ku tu dorê lê bigrî. Şa’ir mîna herkesî di şerê evînê de dilê xwe kiriye qurban. Piştî qurbana dilê xwe bi emrê xwe re bûye penaber.

### **Ev çiya rûspî ne**

Gotina pêşyan e, “dar bi pelan digurê”. Hinek welat bi behran digurên, hinek welat bi çiyên digurên; li Mezopotomyayê, li welatê Serhedê çiya bi çiya re destbiran e. Çiya xeml û şoreta welatan in. Çiya dişibin hembêza dayikan. Meriv wexta berê xwe bide çiyên mirin li dû merivan be jî piştî mirov zexm e. Çavkaniya helbesta helbestvan çiya ne; şî’ra wî mîna avek qir qeşa diherike ber bi newalên dilên birîndar ve. Çiya jî piştevan û rûspî ne.

“Li pişteki bigerî, va ne:  
Ev Nemrûd e  
Ev Agirî ye  
Ev Sîpan e.  
Kîjan e nerûspî

Heyran

Bêrûmet kî ji van e?" (r. 36)

Çiya wek rûspî yên civatê ne. Pir roj dîtine, pir êş û elem. Sîpan, Agirî, Nemrûd, Herakol, Cûdî xwediyên dozên mezin in. Bûyerên ecêb li ser pêk hatine. Ji tofana Nûh heta evîna Siyabend û Xecê dostên roja teng in. Di nava mêjûyê dîrokê de pir bi rûmet in.

### **Xalxalokê**

“Xalxalokê, xalxalokê

Pitikreşê, xecxecokê

Tu qird didî kê û kê

Para'm kanî xalxalokê?"

... (r. 38)

Ev helbest dişibê helbestên wêjeya gelerî. Ji pênc çarînan pêkhatiye. Ji aliyê wateyê ve zelal e. Wateya wê vekiriyê. Nîgaş û tiştên alegorîk tê de nînin. Wek lîstikeke piçûktiyê ye. Xalxalok wek kêzîkek qird tê zanîn. Meriv dide ser destên xwe û li firdana wê temaşe dike. Heger li kîjan hêlê here qedera merivan li wê hêlê ye.

### **Ev xwîna rijiyayî**

Xwîna mirovan hertim erd sor kiriye. Xwînrêjê mirovan dîsa mirov in. Xayintiya kewên gozel hertim hebûye. Arjen Arî ji vê yekê digazîne û mirovên wisa di helbesta xwe de wilo bêrûmet dike:

“We,

We ne ol e, we ne Xweda ye

We ne Mûsa ye, we ne Îsa ye

Û Mihemmed dev ji we qeriyaye

Cihê we nemaye

Cihê we nemaye

Cihê we...reşahiya bilaçemka ye.” (r. 40)

Ev mirovên ha bi çavên belçimokan dinêrin; lê, tîrêjên rojê nahêle tu carî serê xwe rakin. Ew her tim dîl û hêsr in di nava wijdanan de. Cihê wan “reşahiya bilaçemka ye.”

### **Hij ceng e**

Cenga hezkirinê bi çavnebariya Qabil dest pê kir. Ev ceng tu carî naqede. Ev ceng ji coş û peroşa dil tê. Cengek bi henek e.

“Gir yên min in, newal ya min e  
Kanî bizên xwêdana min e  
Cotê çargav de gîsin ê min e  
Milkê min e, ev milê min e.” (r. 41)

Şerê hezkirinê li ser dilê axpînî pêktê. Bi gîsin qarix dibe dil, her qarixê de dil diêşe. Êş û hij bi gotinek alegorîk hatiye rîstandin. Hevîrê laşê mirovan ji axê ye ji bo vê yekê ye mirov li ser axê mîna axê tevdigere.

“Sînorê milkê evînê  
Xwe li dawiya şevê dide  
Ber min de xwe pal dide  
Milkê min mîrzîna min” (r. 41)

Di vê çarînê de ji nîgaşên xweş hene. Ji vana yek “Sînorê milkê evînê” ye. Milkê evînê çi ye gelo? Meriv li ser viyanî hinkî bisekine ku ji evîne re sînor çawa tê danîn?

### **Dilodîn im**

Dil tu carî ji sînoran hez nake û qebûl nake. Derdê dilan re tu kes çare nîne. Helbestvan “nivişteke çêbike” jî, berzûrî kê bibe jî çare tune.

“Nivişteke çêbikim, dev girêdanekê?  
Xwe bavêjim kîjan dergehê?  
(...)  
Berzûrî kê nebûm, kî nehisiya?” (r. 42)  
(...)

### **Wêneya berêvarê û sikak**

Honaka vê helbestê li ya çîrokan çûyê. Bi şeweya çiroknivîsê Rûs Çehov rewşa demeke piçûk nîşan daye. Di vê dîmenê de roj li ava ne, zarokan dev ji leyistikê berdane, ji xeynî pisikekî tu kes tune li sikakan. Tenêfî û bédengiya vê sikakê dişibe jiyana nefiyekî.

“Dev ji leyistikê berdan,  
Li şûn xwe histin gok û xarên xwe.  
Xwe bi hij avêtin himbêza diyên xwe.  
Şopên zarokan man li sikakê...” (r. 43)

Rewşa sikakê wiha ye. Şa’ir bi tena serê xwe li dû lingên xwe dimeşe. Êvar ji bo wî ne fîreh e, teng e, sikak xewle ne û “bîhna nefiyekî tê ji vî bajarî.”

“Ji qevzên min re ma tenga êvarê  
Sikak xewle, rohnî li malên xwe  
Min daye dû herdu lingên xwe  
Bîhna nefiyekî tê ji vî bajarî.” (r. 43)

### **Hewar!**

“Xec sor î sorin vebûbin  
Fenek e gwînên wan; xwîn in xwîn in!  
Nêrgîzên stûxwar bi lûlan gevizîn  
Û beybûn peritîn bi destê neyar!” (r. 44)

Ev çarîn bi hewarî hatiye nivîsandin. Hewara gul û çiçekan e. Neyar dijminê xwezayê ne, dijminê nêrgîz û beybûn û xecan in.

### **Çarîn û xewn**

“Xwîn rawest, dem verşiya  
Şûr şikest mertal tewiya  
Ji qada şer şerbaz reviya  
Xewneke me bû, rizgarî!” (r. 45)

Ev çarîn balkêş e. Li ser rizgariyê hatiye nivîsandin. Lê rizgarî ji bo helbestvan xwenekî maye. Di qada şer de şûr hatiye şikandin, mertal tewiya ye, şerbaz reviya ye. Rewş bi giranî ber bi xewekî giran ve meşiyaye.

### **Yarê, bihar e!**

Bihar û yar bi hev re har dikin aşiqên xwe. Xemla biharê bi hezar reng e. Gul bi hezar îşve û naz vedikin. Yar ji xewna zivistanê şiyar dibin. Şa'îr li ber kaniya dilê xwe ji Xwedê dixwaze nanê sêlê, dimsa torê û loqek nîvişk û tasek dew. Li ser vê sifra hanê dixwaze yar jî kerem ke.

“Di eşqê werbûye;  
Bi bêrek ava zêde, dixulxule  
Mîna min bi dil e kaniya jêrî  
Dengê qendîlan digre newalê  
Diya min kilê zêde dike li meşkê  
Berke ji Xwedê;  
Nanê sêlê, dimsa Torê  
Û loqek nîvişk û tasek dew e  
Yarê kerem bike sifra Arjen Arî!” (r. 46)

### **Axa bexşînkar**

(...)

“bibexşîn xayînên qewmekî  
Û min jî, axa bexşînkar!...” (r. 47)

Li ser dilê axê tu tiştêkî xirab tune ye. Dilê wê ji herkesî re vekiriye. Şa'îr bi vê yekê zane û dixwaze wî jî bibexşîne.

### **Kol î poşman**

“Bi parsê ketibim  
Li kolana te evdal  
Li devderiyê te qereçî  
Têr bike vî dilê birçî  
Keçê, ka maçekê!” (r. 48)

Helbest wilo dewam dike. Ji bo hezkiriya xwe nivîsiye. Hinek tişt dixwaze ji yara xwe. Bi şêweyek erotîk û lîrik hatiye nivîsandin. Heger yar bersîvek erênî bidîyê mala wê ava, heger nediyê kolî poşman û dest vala ye.

### **Tu bihata**

“Himbêzek ramûsan man li keviya çêm  
Te gotibû îşev ez têm,  
Îşev, beriya hîv dagere kevan...  
Ma gund raneza, ma se ranezan  
Xayînê tê bihata...  
Dilê min sed carî di sînor werbû!” (r. 50)

Şa’ir li benda evîna xwe ye. Piştî ro biçê avan li binê pirê cihekî xewle de evîndar nêrînên xwe yên dizî li hev tînin. Dil bêsemax in, ronahiya heyvê ditevize nava tariya şevê de, çav diqerimin li mêzekirina rê, lê tu kes naxuyê li hêla rê.

### **5.2. Şêrgele**

Ev pirtûk ji du beşan pêktê. Di beşa yekemîn de mijarên civakî di beşa duduyan de jî mijarên şexsî hene. Pirtûka Şêrgele bi gotina “Ê neçe şer şer e” dest pê dike.

### **Newal**

Çiya behitî, newal heyirî  
Tahtê nekirrî axê neheband  
Pepûkê bihîst, rûçik xirimand  
Û got: pe pû... bû!  
pe pû... bû!  
pe pû... bû!  
Li newalê çi bûbe pepûkê, bi me bû! (r. 10)

Di vê helbestê de çiya, newal û pepûk derdikevin holê. Pepûk çûkeke evsanewî ye di mîtolojiya kurdan de. Di wateya belengaziyê de tê bikaranîn. Çiya bilindin û hertim bala merivan dikişînin, newal li ber pergalên çiyayî xwe dirêj dikin û kêf û helecana dilê merivan zêde dikin. Lê tişteki wisa diqewime çiya dibehitin, newal diheyirin û bi vê yekê

pepûk dihesê û dirok û çîroka pepûk nû dibe. Ev tiştêkî wisa ye ku tahtê nekiriye û axê jî nehebandiye.

### **Hey hewar!**

Di navê helbestê de diyare ku hewarek, gazinek heye. Wexta ku meriv dikeve nava rêzên helbestê rastî peyvên dilkuj ên mîna “xwin, birîn, jêkirin, qesab” tê. Meriv dizane ku şerek qewimiye û helbestvan xwe mîna lehengê di vî şerî de birîndar bûye dibîne. Dibêje ku *termê min di xwîné de bangor, ax sor ezman sor birîn sor...* Bikaranîna rengê sor di hişê merivan de şer disêwirîne. Şer bi piranî li serê çiyayê pêk tê. Çiya govanên şeran in û çiyayê helbestvan *kanî bi kanî vedirişin*.

Helbesta “Hey hewar!”jî sê beşan pêk tê. Honaka helbestê dişibe honaka çirokên klasîk. Destpêk, geşbûn û encam. Di beşa yekem de şer çawa dest pê kiriye pêşkeşî merivan dike. Di beşa duyem de qala geşbûna şer dike û mîna dîmenekî bixwîn dide ber çavê merivan. Beşa sêyem encam e. Dibêje ku ev qesab in.

“Qesab in  
Dest bi qezetore, keftar!  
Segên har in segên har!  
Hey hewar,  
Miriyan jî dikujin di vî şerî de!” (r. 11)

“*Miriyan jî dikujin di vî şerî de!*” Ev rêzik hem ji aliyê watêye ve hem jî ji aliyê helbestê ve pir zexm e. Ev nîgaşek pir mezin e. Him rasteqîna şer tîne berçavan hem jî merivan dide fikirandin. Mirî jixwe mirine, lê ew kesên ku şer dikin xwîné çavên wan girtine û ji kuştinê têr nabin.

### **Hesen**

“Nanê şikêva kir sedqe  
Bi çengan şekir, teşt teşt helawî  
Dieyan neanî hêsrên venegerand  
Pîra Şemsê mir bi kula wî lawî” (r. 12)



Ev helbest çarîn e û mijara wê jî zêmar/mersiye ye. Lehengên wê Pîra Şemsê û lawê wê Hesên e. Zêmarek çar rêz, li ser mirinekî an miriyekî hatiye gotin. Li miriyan dikin hewar. Dayik, dergîstî an jî jin keziyên xwe jê dikin û dibêjin “min gulî birê” lê mirî şûn de nayê. Ew kesên li dû mirî jî zindiyên halê miriyan de ne mîna Pîra Şemsê.

### **Ey ax!**

Tiştêkî balkêş e, Arjen Arî di zêmara ku bi navê “Hesên”nivîsiye, têde peyva mirinê tune, lê wexta ku bangî axê dike şeş caran peyva mirinê bi kar tîne.

“ ...

û mirin... mirin...mirin!

Bi her mirinê mirin bi min şirîntir kirin” (r. 13)

Di van rêzan de tiştêk bala merivan dikişîne. Li dû peyva mirinê sê xalan datîne. Hem ji aliyê kiteyê ve nêzî rêza binî dike hem jî ji aliyê wateyê ve domandina mirinê dide ber çavan. Tiştêkî din jî ew e ku dibêje “mirin” ango ew mirin.

Bangî axê dike. Mirov ji axê hatiye çêkirin û piştê dîsan diçe axê. Helbestvan vê yekê bi awayekî alegorîk tîne ziman. Dibêje “bi qasî bimrin ji te hez kirin”. Ev gotin gotinek manîdar û watedar e. Ji ber ku meriv bixwaze bigihîje axê namire lê wexta ku meriv mirê jî axê zêdetir tu cih tune ji bo merivan. Eyvanê mirovan ji axê ye, mirov ji axê hatine çêkirin. Ji ber vê yekê ye ku ax kêmasiyekê di xwe de dibîne. Vê kêmasiya xwe jî xweliya xwe ya ku daye mirovan bi mirina wan şûnde digre. Dixwaze ku kêmasiya xwe Wexta ku mirovek ji jiyana kêmasiya xwe bibe axê zêde dibe. Helbestvan axê dêyandarê mirovan dibîne.

“Bi kêl bê kêl, kîjan dildarî rakim ji qebrê?

Her yekî temenek bexşî te kirin!” (r. 13)

Di hundurê axê de herkes heye. Hinek gornên wan kifş in bi kêl in, hinek di nav axê de winda bûne. Gelo li ku derê ne gornên dildarên bi nav û deng? Helbestvan miriyan bexşekar dibîne hem jî temenê xwe bexşandine.

### **Sirûda xorto**

Di vê helbestê de pênaseya mirinê û jiyane dîke bi zîmanê helbestê. *Wehêsanek e mirin, jîyan çem e* dibêje. Ev helbest jî aliyê mijarê ve zêmar e. Li dû mirina xortekî hatiye gotin. Helbest diherike di nav wateya jiyane û mirinê de. Bi mirina xorto çiya ne stuxwar in, çem ne bi lem in. Dem zivistan e, ezman bê stêrk e û taristan e, mirin koçî serê Çiyayê Mazî kiriye. Li dû vê mirinê esmerek bi nazi bigirî, welat negirî jî xem nîne. Ango dibêje hemwelatî bêpejn mane, pê nahesin, di vî alî de rexneyek civati ye.

(...)

“Bigirî bila esmerek bigirî li dû bi nazî  
Welato, tu negirî jî ne xem e!”(r. 14)

### **Koyê spî**

Erdnîgarî li ser şa'ir gelek bi bandor e. Şa'ir di bin bandora bûyerên siyasî û civakî de dimîne. Çiya nîgaşeke balkêş e, bilind e, bi heybet e. Wexta ku meriv jî tiştêkê direve an jî bixwaze tiştêkê bike berê xwe dide çiyane. Çiya merivan bi du pêşîran dimêjîne. Di yekî de mirin yekî de jiyane dilopan dîke. Gotina şa'irê tirk ê navdar Necip Fazıl tê bîra merivan: “Lûlik cot in, di yekî de nûr diherike, yekî de qirêj”<sup>90</sup>...Ev helbest jî çar beşan pêk tê. Di beşa yekem de wêneya sirûştê dikişîne. Di wê dîmenê de ewr û ezman û erd spî ne. Demsal zivistan e. Berfê çar rê girtine. Bahoz dîn dînok e.

“Ewr spî ezman spî erd spî  
Ba şûm, bahoz dîn dînok  
Çar rê kor in, çar dor sik î spî  
Û çar hêl çarmedor, heta noqê d' berfê de!” (r. 15)

Ji ber serma û seqemê simbêl li ber devê merivan diterife, pêçiyên dest û lingê merivan dibe mîna darê hişkolek. Lê hê hêvî heye. “ha hêviya min ha!” dibêje. Piştî van rêzan em dibînin ku armanca şa'ir azadî ye. Ji pênuşa helbestvan ev gotin dipekin ser kaxezê: “azadî spî be, mirin jî spî ye.” Têkiliyekê dardixe di mabeyna azadî û mirinê û rengê spî de. Spî tê wateya safbûn û paqijiyê. Cardin rengê kefenê jî spî ye. Berfa spî jî dibe sedema mirinê û dibe kefenek sar û sirûştî. Li dû van rêzan em carek din rastî peyva

<sup>90</sup><http://www.antoloji.com/sakarya-turkusu-siiri/> 26.12.2014

kefen tèn. “Gelek kemînan kefen avêtin pêşiya min” hertişt bûye yek, ji bo vê mirinê. Di vê rêzê de tîpa ‘k’ yê sê caran bi kar tîne û ji aliyê deng ve hunera alîterasyonê çêdike.

### **Vegerim, te nebînim**

Evîn, azadî û çiya bûne sê lingê vê helbestê. Di dilê merivan de evîna dotmamê û ya azadiyê bi hev re cîh bibe meriv du caran dibê hêsîr, dibe girtiyê azadiyê û evînê. Çiya heger piştê bide merivan û ax birçiyê canê merivan nebe, di dawiyê de evîn dibe azadî, azadî jî dibe evîn.

“Li serê çiya bangî dotmama xwe dike.

Ev çiya bagok e

Ev çiya hêlîna baz warê başoke...

Dilê min qurfok e, dotmam

Dilê min qutifok e.” (r. 17)

Ji aliyê teşeyê ve bi dubarekirina peyvên ahengek daye helbesta xwe. “Ev çiya” du caran, “dilê min” du caran dubare kiriye. Di mabeyna peyvên qurfok û qutifokê de jî ji aliyê deng ve manendiyek heye.

Çiya asteng e ji bo helbestvan, nahêle bigihîje dotmama xwe. Ev çiya ne çiyakî jî rêzê ye. Hêlîna baz, warê başok e. Lê dilê wî jî ber evîna dotmame qurfok e, nerm e; ji ber eşqa azadiyê jî qutifok e, li ser çiyên penaber e, kemîn li pêşiyê ne, ditirse nebîne:

“Vegerim û te nebînim dotmam

Vegerim û te nebînim!” (r. 17)

Meriv di mabeyna tiştan de bimîne girtina biryarekê zor tê girtin. Helbestvan di ferqa vê yekê de ye.

“Ez nazdar çiya nazdar tu nazdar...” (r. 17)

Peyva dotmamê ji dîrokê pekiyaye ser zimanê şa’ir. Dotmam çavdîtina merivan a ewil e. Azadî jî ma’ra merivan a ewil e. Newaya stranê merivan dixê rê ber bi hezkirîya merivan dibe. Ê li wê derê “azadî rind, tu rind, çiya bilind e.”

### **Keziyên kulîlkan**

“Porê her yekê guliyek şevê

Qer, qemer, kit kit ferîşte  
Kulîlkên xakekê bûn xwîşkên min û te  
Ji hembêza çiyân kit kit veçinîn”  
... (r. 19)

Helbest wiha dest pê dike. Ji qerbûna guliyên porên keçan behs dike. Kezî an gulî şoreta keç û qîzan e. Şa'ir behsa keçan dike, ji jiyane mîna kulîlkên ji axê tîn çinîn hatine veçinîn. Ev kulîlk li ser çiyân hêşîn bûne. Di mabeyna keç û kulîlkan de manendiyek heye. Lê emrê kulîlkan kin e. Yê keçan jî ne dirêj e. Kulîlkên sirûştê cih nedane kulîlkên penaber.

*“Kulîlkan çil kezî bi ser kê de birin?”*

### **Zayîn**

Kur, azadî û welat... di mabeyna van sê peyvan de tîkiliyek balkêş heye. Welat azad be welat e, azadî bi şervanan ango bi kuran, bi mêran tê parastin. Lê dijîtî ev e ku yê kuran tîne dinê jin e, xwîşk e û dayik e. Helbestvan dixwaze ku hemla xwîşka wî kur be.

“Hemlê hemû dayikan kur  
Kur; kurî kurroj bi navê Azad  
Li ser roja ye xwîşka min  
Ku ev zik kur be,  
Ez ê ramûsim ji eniya welat!” (r. 23)

### **Şêrgele**

Ev pirtûk navê xwe ji vê helbestê digre. Li ser mêranîyê, egîtiyê hatiye nivîsandin. Destaneke mîna pelê gulê li ser hev civiyaye. Helbest bi gotina pêşiyên a “şîrê şêr di eyarê şêr de” dest pê dike. Piştî behsa şêrgelan dike û ji gotineke pêşiyên “çi mê çi nêr” digre. Ev şêrgele dînemêr in, li ber pergale agiriyê ne. Merqeda van şêrgelan çiya ne. Di gora wan de çar hîm hene li dorê, di nav de jî çar hêvî çar welat hene. Ev şêrgele hem jin in hem mêr. Ji bo şêrgeletiyê ceng a bi çekan ne pêwîst e. Di dîrokê de li ser van çiyân kî jiyabe, kê çi kiribe ji bo xwediyê vê erdnîgariyê ew şêrgele ne.

(...)

“Ew ên çeng eylo, ew ên bejn hey lo  
Kî bû lo, kî bûn  
Ew ên dil pola  
Û gurçik risas? !” (r. 27)

Dipirse şa’ir, kî ne? Taybetmendiyan wan hene, dilên wan pola ne, gurçikên wan risas in, çengên wan eylo ne. Helbestvan bixwe wan dinase lê mîna ku wan nas nake tevdigere. Di wêjeyê de ji vê hunerê re ‘tecahularîf’ tê gotin. Belkî armanca helbestvan ew e ku taybetmendiyan wisa di hişê merivan de qeyit bike. Li piştî van rêzan çarînek tê. Çarîn wiha ye:

“Şêrgele hene; bê kêl û bê gorn  
Şêrgele hene; şevçirax û heyve ron  
Şêrgele hene; ji azadiya bi gon  
Di bin axa sar de b’ axîn razayî!” (r. 28)

Di vê çarînê de bi dubarekirina peyvan û dangan ahengeke herikî çêkiriye. Bi qafîyan teşeya helbestê fesilandiye. Di rêza dawî de peyveke hemdeng “ax-axîn” bi kar anîye. Ax xwelî ye, eyvanê însan ax e. Wexta ku dilê merivan bi derd û hesretan tijî dibe meriv axînekî dikişîne. Ji ber ku meriv bîriya eslê xwe kiriye. Dawiya dawîn meriv di bin axê de radizê.

Qeder û mirina van şêrgeleyan “ di bin aşûtek xezeb spî” an jî “ li ber pêlên aveke tezî” de bi dawî bûne. Si’ûda van şêrgeleyên bê qirn dibe nîgaş û îmgeyên qewîn tê ser zimanê şa’ir:

“şev serjê bû bi ser rojê de...”  
“mirinê serê xwe çimand li ber mirina wan”(r. 29)

Mirina şêrgeleyan bûye mirina alemê. Her tişt dikesire. Serê şevê bi ser rojê de tê jêkirin; mirin serê xwe diçimîne. Mirin dikesire vir şûn de kesî namirîne. Helbestvan van egîtan cuda dibîne. Naşibîne kesên din. Caw ji wan re nabe kefen, ew mîna stêrkan in.

Meriv xwe tu carî nagihijîne wan û ew şêrgele pir mezin in; gora wan çiya, kefenê wan ezmanê sayî û şewqa wan mîna şevçirax û heyverona ne.

“Şêrgele hene; kefen ezmanê sayî  
Şêrgele hene; bi qasî stêrkên rijiyayî  
Şêrgele hene; şevçirax û heyve ron  
Li van çiyên bê kêl û gorn windayî! (r. 30)  
“hêvî, bawerî, dogeh, agir” peyvên we”

Jiyanê dişibîne asikeke por ewr. “Jiyan asikeke por ewr bû” Mirin her tim li pey jiyanê ye. Jiyan di alî mirinê de tê xwarin. Asik bi jînê têr û tijî ne, baz didin, dilîzin; lê guhê wan tim li dangan e, çavê wan li hatina ajalek hov e. Ji bo wan kêfa jiyanê û tirsê mirinê bi hev re ne.

### **Hest û êvar**

ezmanê temmûzê vîkî vala  
xeyal hişkî hola, hêvî serberjêr e!  
... (r. 34)

Di vê helbestê de êvarê mîna mirina rojê dibîne. Êvarên demsala havînê bi piranî bi coş derbaz dibin. Lê di vê êvara meha temmûzê de *xeyalên wî hişk î hola ne, hêviyên wî serberjêr in*.

Di wêjeya Tirkan de jî Ahmet Haşim bi piranî li ser êvarê û roja tere ava disekine<sup>91</sup>. Helbestvan bi roja ku ezman diterikîne û li pişt xwe tariyek reş dihêle xemgîn dibe. Di destê êvarê de kefenê rojê dibîne. Ev wext wexta mirina wî û helbestê ye.

“Di destê êvarê de kefenê rojê  
Wextê mirina min û helbestê ye” (r. 34)

---

<sup>91</sup>[http://turkoloji.cu.edu.tr/YENI%20TURK%20EDEBIYATI/mustafa\\_apaydin\\_ahmet\\_hasim.pdf](http://turkoloji.cu.edu.tr/YENI%20TURK%20EDEBIYATI/mustafa_apaydin_ahmet_hasim.pdf),  
01.01.2015

Di meha temmûzê de sîsirk dixwînin bi dengê zelal. Lê helbestvan vî dengî bi awayekî cuda şîrove dike, wateyeke din pêve girêdide. Ev dengê jiyanê jî ji bo wî dibe sirûda xemgîniyê.

“Sirûda xemgîniyê dijenin sîsirk ji dûr ve” (r. 34)

### **Behî**

Di helbesta Arjen Arî de motîfa çiya pir zêde heye. Çiya ne tenê çiya ye. Çiya jiyan e, mirin e, mêlaka diyayan e. Çiya li dû xewna welatekî windayî ye.

“Çiya; bejneke çiya bû!

Çiya; qetek ji mêleka diya bû!

Çiya li dû xewna welatekî...

Tu li diya min; li ber kurekî dikevê!” (r. 35)

### **Hêvî**

hêleke min diqutife ji serme

çiya keleheke asê, dem asê

hêviya min kulîlka bine berfê

ha bel bû ha bel bibê

û berf tê

tê

tê... (r. 36)

Li dû tîrbûna taritiya şevê roj hiltê. Hêvî di wextekî herî zehmet de pêwiste ji merivan re. Hêviya şa'ir jî “kulîlka binê berfê” ye. Berf tê bi ser hev de. Ji ber sermayê hêleke şa'ir diqutife. Lê hêviya wî hertim heye. Bangî kulîlkê û berfê dike:

Bibare berfê

Li ber xwe bide kulîlkê...” (r. 36)

Berf çiqas bibare ewqas baş e. Di demsala biharê de dibe av, dibe jiyan ji bo kulîlkê. Lê wexta ku berf bibare, serma û seqem hebe kulîlk namire, xwe ji biharê re amade dike. Şa'ir kulîlkê baş nas dike. Herdu ji çavkaniyekê ne. Vê yekê jî wisa tîne ziman: “Tu ji vê axê yî, ez ji vê axê!”

## Îremkê

“her zarok terhek bihar  
her zarok stêr stêr qetek hetav  
kulîlka minî çav bi xunav  
hîva min hêviya min îremka min  
tu, qetek nan û tasek av!..” (r. 38)

Helbestek bi navê Îremkê lê ji bo hemû zarokan hatiye nivîsandin. Zarok bihar in, stêr in, hetav in, kulîlk in, hîv in hêvî ne, qetek nan û tasek av in.

## Ey yar

Şa’ir im; qereçiyê pesnê çavên te  
Li dabaşa navê te hevdengê Evdal  
Şûm im hebekî, hinekî zirz  
Min ji Xanî bipirs, min ji Hejar  
Min ji Mella, min ji Hêmin, min ji Dildar  
Sirûd Ey Reqîb im, pênûs ey reqîb!(r. 39)

Evîna şa’ir ji evîna dilê Evdal, Xanî, Mela, Hemîn û Dildar e. Karê hemû şa’iran yek e. Hemû qereçiyên pesnê çavên yarê ne. Dabaşa eşqê di mêzekirina çavan de dibe dîtin.

## Serencam

Li ser temenê komarek bê miraz hatiye gotin ev helbest. Ev komar Komara Mahabadê ye. Lê serencamek bêxêr hatiye serê Mehabadê. Avakarê wê di dawîya dawîn de di sêdarê de hatiye dardakirin. Ji ber ku temenê komarê kin bûye şa’ir ew mîna zarokekî dîtiye:

“...  
Di sêdarê de tifalek bû Mehabad!” (r. 40)

## Hewlêr im ez

Kerbê li xwe bipêçe... û were  
Bi balafirê bask –fere  
bi debabeyên rûxîner re  
...  
Ez zû rev dujmin, ez û rev?



Hewlêr im ez hewlêr im  
Bila çekên te tev tenete be!(r. 41)

Hewlêr bajarek mîna Mehabadê ye. Mehabad navê komarê bû, Hewlêr navê mirinê ye. Qetlîama ku Saddam Husên li wê derê kir tu carî nayê jibîrkin. Hewlêr *kerbê lixwe dipêçe*.

Hewlêr bê çek e, dujmin qewî ye bi debabeyan, bi skorskiyan bi çekên giran mirinê dibarîne. Dujmin mêrxas nîne. Dibe dojeh tê...

### Şîrove

dem di dergûşê de kal bû:  
Hûtê heft-serî, Bozê Rehwan, pîrebok...  
Şevbuhêrk ji şîr vebûn, bi piyan ketin zarok  
Stran negihîştin pere bajaran  
Di mehdika şahristaniyê de welatek:  
Gund bi gund lal bû! (r. 42)

Şîroveya demê ye. Derbasbûna wextê dibe dîrok. Dîrok cûr be cûr e. Dem derbas dibe. Lê tiştek li gor dilê şa'ir naçe. "Dem di dergûşê de kal bû." Heger dem derbas be dergûş jî mezin dibe. Lê dem derbas dibe, kal dibe; gelo dergûş çawa mezin nabe? Derbasbûna demê herî baş li ser temen û laşê mirovan tê temaşekirin. Şa'ir bi vê yekê dizane û wiha dibêje:

"Dem di dergûşê de kal bû."

Belê dem derbas dibe, dergûş kal dibe lê "di mehdika şahristaniyê de welatek" lal dibe. Bi vê gotinê şîrove piçekî zelal dibe. Ev du helbestên berê di vê şîrovê de em dibînin ku Mehabad û Hewlêr hê jî dergûş in. Şa'ir dixwaze bibêje ku nahêlin em bi welatî gir bibin.

### **Kurmikek im**

Ax!!! Hesreteke dirêj e di nava dilê merivan heta dilê axê. Mirov ji axê hatiye afirandin û me'dena wî ji axa welatê wî/ê ye. Pir şa'ir bi vê yekê dizanin. Şa'irê Tirkan Aşık Veysel\* jî li ser rastî û dostiya axê disekine û dibêje<sup>92</sup>:

*Yara min a sadîq ax e!*

“Di hembêza axê de min çavên xwe vekir  
Diya min ax, şîrê min ax, pêçeka min ax  
Kurmikek im ji betnê axê xwarina min ax  
Ax, xakeax, bi ku de biçim, li te vedigerim!  
Ax xakê ax....” (r. 43)

Di alî rastiye de meriv mêze helbestê bike ew kesên ku li gund hatine dinyayê bi piranî di xaniyên axî de jiyane. Şa'ir jî li gundê Mêrdînê di nav axê de çavên xwe vekirine. Berê li vê herêmê ji bo tenduristiye ax di nav agir de sor dikirin û dikirin nav pêçeka zarokan. Wekî din tê gotin ku axa herkesî, Xwedê te'ala ji welatê wan aniye. Di dawiya dawî de meriv dîsa dikeve bin axê. Di mabeyna jiyana û mirina merivan de meriv li ser axê ye. Ax dîroka merivan e lê ne fermî ye.

### **Assam angî oxir**

di kefika koçanîkan de kuçek im  
qîrînek tundrew im, dij dijber  
li Şerîa Rojava, li sikakên Qoser  
dîl mindal, helbest narîncok  
mirinek kezîzer im, li dû zarokan! (r. 44)

Mijara helbesta Arjen Arî bi piranî nixandina civatê û rexnekirina bûyerên ku li ser erdnîgariya welêt pêk tên e. Car car behsa bajarên welatên din jî dike. Ji ber ku qedera hinek bajaran yek e. Şerîaya Rojava jî ji van bajaran e. Bombayên ku li ser sikakên bajaran dibarin jiyana zarokan tarî dikin û ji bo lîstika wan şûnekî nahêlin. Ev helbest rexneya şer e. Hewldana şa'ir ji bo zarokan e. Li dû zarokan dibe “mirinek kezîzer”.

<sup>92</sup><http://www.antoloji.com/kara-toprak-2-siiri/>, 10.01.2015

\*Aşık Veysel Şatıroğlu: Helbestvanekî gel ê zimanê Tirkî ye. Di navberasên 1894-1973 an de jiyaye. Hê piçûk bûye çavên xwe wînda kirine. Helbestên xwe bi muzîka tembûrê xwendine.

### **Ene Beyrût**

Ev nav, navê helbesta Şa'irê Ereb Nizar Qebbanî ye. Qebbanî dibêje “ez Beyrûd im”. Navê helbesteke Arjen Arî jî “ez Hewlêr im” e. Helbestvan, bajarên ku ji aliyê êş û çetiniyan ve bira ne, nas dike. Dizane ku şaristanî û dîrok termê bajaran e. Ev rih di alî mirovan de hatiye dayîn. Hinek bajarên dîrokî hene ku nasnama wan kevirên dîwaran in. Ew neqşên ku li ser keviran hatine çêkirin heta îro hatine. Lê di sed sala bistemîn de çekên agirbar rih û nasnama bajaran jê birine. Ji dîrokê vir de em mêze bajarên navdar û miqeddes bikin di helbesta Arjen Arî de.

“Dirûxê di bin baskê balefiran de taxên bajêr  
Herî pirr li jêr, taxên misilmanan  
Fer fer in qumrî, çiwîk qefl qefl diteriqin  
Ji hezar salî û vir de şerê Ihûd!  
Ez Hewlêr im, tu Beyrûd  
Kîjan keştî dê bar bike weqa însanan

Li ber Hîmê Girî rondikên Mûsa  
Kîjan xak ne Quds e, kîjan bajar ne minewwer?  
Min welatek divê, herûwer!  
Li çola Ken'an, li berpâlên Cûdî  
Çîroka şer ji Harût û Marût  
Ez dibêjim Hewlêr im, qebbanî  
Tu dibêjî: Ene Beyrûd!” (r. 45)

Destpêka helbestê bi “rûxînê” dest pê dike. Helbesta xwe li ser xerabûna bajaran avakiriye. Û piştî dengê balafiran jê tê. Ev deng mirinê dibarîne. Baskên balafiran jî hene lê balafirên bi bask naxwazin qumrî û çivîkên bi bask bijîn. Fer fer, qefl qefl diteriqîn. Şer, şerê hezar salan e. Ji şerê Ihûd vir de dest pê dike û misilman tene kuştin. Belkî penaberiyek, koçberiyek pêwîste ji bo ku ji van axan birevin, li ser avekî di keştiyekî de. Lê “kîjan keştî dê bar bike weqa însanan?”

Helbest didome bi rondikên Mûsa(s.x.l) li ser Hîmê Girî. Li gor dîtina şa'ir hemû xak mîna bajarê Qudsê miqeddes in û minewer in. Tu ferq tune di navbera “çola Ken'an û berpâlên Cûdî de”. Kî li ser kîjan axê jiyabe bi xwe bi wî axê dide nasandin an jî dibe dengê wî bajarî. Di vir de Arjen Arî wiha bangî Nizar Qebbanî dike.

“Ez dibêjim Hewler im, Qebbanî  
Tu dibêjî: Ene Beyrûd!”

**.../07/2006**

Di vê helbestê de em rastî tişteki cuda hatin. Serenavê helbestê dîrokek ne kifşe ye. Mijara helbestê şer e ango şer dibe sedemê çi? Şerê ku di nav însanan de pêk tê dibe sedemê pir tiştan. War û cihê merivan diguherîne û şa'ir jî rexneya vê yekê dike.

“Şer ku teriqandibin kulî  
Koçber bin quling li ser axeke hişk  
Û dûpişk bi xwe vedabe ji kerban  
Li ezmanekî vala megere li kevokan  
Ne guliyek zeytûnê filitî, ne tayek rihan  
Çiyayê xewnan şewitî heyran, çiyayê xewnan!” (r. 46)

Şer ekosîstema dinê jî xirab dike. Kulî diteriqin, quling koçber dibin, dûpişk di nav agir de dimîne û ji kerban xwe vedide. Di vê dîmenê de li ezmanekî şîn û vala kevokên aştiyê nafirin û sembola aştiyê ya din jî guliyê zeytûnê jî tune. Dîmen dilê merivan xerab dike. Rewş ne baş e ji ber ku “çiyayên xewnan şewitiye.”

### **Mamik**

Ba pif dike êgir  
Agir gur, agir gurr  
Gund rijî, çiya komir  
Bi hev re şewitîn hişk û çirr  
Agir vemirî agir mir  
Ba rabû, xwelî bi ku ve bir? (r. 47)

Mamikek şeş rêz e. Meriv dibêje qey bi hêsanî hatiye nivîsandin. Peyvên balkêş ên mîna agir, rijî, çiya, komir, şewitîn, hişk, çirr, xwelî, mirin û vemirinê bi kar anîne. Em dizanin ku bi işk re çirr jî dişewite. Li piştî şewatê xweliya êgir çêdibe. Ba were bela dike. Di pir bûyeran de mirovên bê sûc têne cezakirin û belav dibin li her derê dinê.

### **Beşa duyem**

#### **Sûretên hisretê û keservedan**

##### **Bihar**

Helbestek lîrik e. Di mabeyna yar û biharê de kêfa helbestvan xweş e. Ew û yara xwe li ber çemê Dijleyê xweşhest û sermest in. Piçekî erotik e. Wiha hestên xwe tîne ziman:

“Di bin serê te de balgih e zendekê min  
Yê din li te pêçayî, koremar.  
Li keviyên Dîjle strana ‘hele yar’!  
Xweş hest im Bihar, sermest im Bihar!  
Tu Bihar, dor bihar, ez bi har  
Çî din bixwazim ji Xwedayê bi tenê!” (r. 51)

Di van rêzan de jî kifşe ku navê yara wî Bihar e û demsal jî bihar e. Di nava biharan de piçek har e. Ji vê zêdetir ji Xwedayê tenê tiştêkî naxwaze. Di dawiya rêzan de qafiya “ar” ê çêkiriye. “koremar, yar, Bihar, har”

##### **Û tu neyê?**

“Rûbarekî bibîne, ku ji kaniyekî derneyê  
Rojekê bibîne rojekê, ku bi siharê re hilneyê  
Her roj dimrim di mextela bendemayînê de  
Hêviya hatinekê dipûrisînim, hêvî biqede... û tu neyê?” (r. 52)

Her tişt ji tiştêkî dertê. Roj ji hembêza şevê, rûbar ji çavkaniyan dertên û tîn... lê yar –ew- hê nehatiye. Bendemayîn navê mirinê ye li dine. Hêvî heye were, lê şair hêvî purisandiye di “mextela bendemayînê de” û ditirse ku hêvî jî biqede.. wexta ku meriv vê helbestê dixwîne alîkî merivan ji nav hezkirinê dertê û tê; alîkî merivan jî li benda hatinan e. Îmgeyek mezin e “pûrisandina hatina hêviyekî”. Hêvî di dil de ye û çav li rê ye. Rihê ku

di vî halî de be, tirs û hêviyê bi eynî pêsîrê dimêjîne. Tirs bi ser dikeve û hêviyê dipûrise.  
Bi ser de jî hatin tunebe?

### Şeş rêz gazîn

“ji newaya qumriyan deng biliya  
di şikefta devê min de stranek e “şev çû...”  
ji te, ji welatekî bêxwedî  
ji hezkirinê pê ve min çî kiribû!  
-kitikek min jî nîne-  
Qumrîka dawî jî  
Firî  
Û çû!” (r. 53)

Hezkirineke du qefle ye di dilê Arjen Arî de û sûc û tawana wî ev e. Çi tê serê merivan ji ber hezkirinê tê. Gazina wî ji newaya qumriyan dibile û stran di şikefta devê wî de dibe şev diçe. Devê xwe mîna şikeftê dibîne. Di vê şikeftê de stran dibe wek newaya qumriyan. Ji wê û ji welatekî bêxwedî hez kiriye, dixwaze bibe xwediyê van her du tiştan. Ji bilî vê hezkirinê tiştêkî wî tune. Pisîkek wî jî nîne, qumriya dawî jî firiyaye çûye.-kitikek min jî nîne- ev rêz di helbesta Kemal Burkay de derbas dibe û hunermenda Tirk Sezen Aksu\* jî dixwîne.<sup>93</sup>

Meriv wexta ku xwe berdide nava helbestê dibîne ku nîgaşên xweş bi kar anîne. A yekem devê xwe dişibîne şikeftê. Şikeft pi piranî cihên kesên ku jiyana xwe bi serbestî najîne. An jî cîhê ajalên hov e. Helbestvan dibêje ku stranên min qedexe ne, ez bi rehetî nikarim bibilînim. Navê stranê jî “şev çûye”. Şev û şikeft him di alî dangan de him jî di alî wateyê de bi hev re girêdayî ne. Şev dema bêhnvedanê ye, ew ên ku di şikeftan de dijîn di tariya şevê de jiyana xwe didomînin, wexta ku şev here sibe tê, pêwîste meriv xwe veşêre, stranê xwe bi dizî bêje, stranê di şikeftê de bilorîne. Di alî din de mîna ajalekî hov hatiye vederkirin. Rexneyeke însanî ye lir ser civatê.

Li dû

her ku pirpirînek firiya şaxek hejiya li dû

<sup>93</sup>[http://www.siiir.gen.tr/siir/k/kemal\\_burkay/gulumse.htm](http://www.siiir.gen.tr/siir/k/kemal_burkay/gulumse.htm), 15.01.2015

\*Sezen Aksu: Stranbêjeke Tirk a navdar e, leqeba wê “minik serçe(çivîka biçûk) ye.” Helbesta Kemal Burkayê siyasetmedarê kurd bi kilamî dibêje.

li dû; di çengên siharê de meyan xilolîk

li dû; ne şev ne roj ne kelik...

li dû; dil bi piyan neket dil ji şîr venebû!... (r. 54)

Helbest li ser çûyinê hatiye nivîsandin. Çûyîn li ser rihê mirovan bandorek nerênî çêdike. Meriv li şûna xwe disekine û li dû yên diçe dirêj dirêj mêze dike û tu tişt ji destê merivan nayê. Ev helbest ji çar rêzan pêk hatiye lê ne çarîn e. Di alî teşeyê de bi serbestî hatiye nivîsandin. Peyva “li dû” çar caran bi kar aniye û diyarê me dike ku “li dû” jiyana wî çawa guheriye. Di rêza ewil de çûyin an firîna pîrpirînekê jî li dû tişteki çêdike. Li dû wê di çengên siharê de xilolîk dimeyên, dil ne şev ne roj ne jî kêlikekî ranabe ser piyan û ji şîr venabe. Meriv mitûmat dimîne. Jiyana bi hereket e, lebat e; mirin sekinandiye, bê tevger e. Çûyin bûye mîna mirinê ji bo helbestvan. “Dil bi piyan neket dil ji şîr venebû” ev rêz balkêşe e. Dil mîna dergûşekî piçûk e. Hê şîr vedixwe, hê rê ve nare. Dilê wî bi dilê wê kedî dibe, hezkirina wê ji bo mezinbûna wî şîr e. Lê ew çûye, dil sêwî maye.

### **Bendî**

“Mişt keserî tu hilm bi hilm bêrî

Di nava tiliyên min de rojek din zerirî

Hûtekî heft serî ye di çîrokan de çile

Min dixwe, dil dikevêje, zeman dirûxe

Di kêlikeke jibîrbûyî de te dest biavêta destikê derî...!” (r. 55)

Li piştî helbesta “Li Dû” helbesta “Bendî” temamker e. Em nizanin çi qas wext e çûye, li gor helbestvan ew di demek gelek kevn de çûye. Ev dem dema hûtê heft serî ye. Çîrok nû ava bûne. Di vî zemanî de “ew a ku çûye” bûye keser û bêrîkirin. Her roj, roj di nava tiliyên wî de dizerire. Hûtê heft serî çilek û birçiyê wî û dil û zeman e. Helbestvan bêhêvî maye. Dixwaze ku di kêlikeke jibîrbûyî de dest biavêta derî û vebikira.

Di alî teşeyê de helbest bi nezmek serbest hatiye nivîsandin. Di dawiya rêzan de qafiyê bi tîpên “rî” çêkiriye. Kêfa helbestvan bi dûbarekirina dengên tê. Di vê helbestê de tîpa “r” û “e” yê zêde dûbare kiriye.

## Bêbavê

Çavên te: du binefşên reng tenik  
Di spêde de şîrkî şîrkî, hênîk  
Bayek in: nermik nermik, nişmî  
Bêbavê, di çavên te de vemirîn  
Çil biharên hevrişmî! (r. 56)

Peyva bêbavê di zargotina kurdî de pir zêde hatiye bikaranîn. Ew kesên dilên wan dikeve keçikekê û keçik nazdariyê dike, dilê dildaran diêşe û vê peyvê dibêje: keçê bêbavê... ango dibêje ku meriv dibêje qey bavê te ne kifş e loma tu van eziyetan li min dikî. Helbestvan jî li hember rindbûn û bedewbûna keçikê heyiriye. Çavên yaran dişibin çavên maran, belek in lê bi jehrî li merivan dinêrin. Di kilam û stranên kurdî de çav jî gelek girîng in û bi van şeklan derdikeve pêşiya me: çavreş, çavşîn, çav xezal, çav belek... di edebiyata kevn de jî çav û birî û bijangên dergîstiyê li dijî dildar ceng dikin. Bijang dibin tîr, birî dibin kevan û tîr dilê dildar birîn dikin.

Çavên dergîstiya şa'ir du binefşên reng tenik in, şîrkî şîrkî hênîk in. Bayekî nerm û nişm in; di çavên wê de çil biharên hevrişmî vedimirin. Nêrînen aza ne, ne pûç in. Ba ne, lê ne hişk û rûxiner; ewqas mezin in ku çil biharên hevrişmî têde winda dibin û vedimirin.

## Têm

Hatina ji binê xetê ji bo evînê ye. Serxet û binxet dil jî ji hev cuda kirine. Lê pir kesan ji bo evînê ber bi mirina xwe hesp bezandine mîna Şêxê Kubar. Ev helbest jî di vê babetê de hatiye nivîsandin. Helbestvan sedema hatina xwe wiha diyar dike:

“Di xurcika min de hemû qewîtî:  
Kembera zîvî, hina qeşmîre, heprî...  
Cotê xirxalan ji bîr dikim qet!  
Siwarê hespa kimêt im tîm  
Tîm ku bikim xîzêm Berîka Binxetê!” (r. 57)

Wexta ku çûye binê xetê tûrê xwe tijî bîranîn kirine. Ew qewîtîyên ku girtine tu carî ji bîr nake. Yek ji van kembera zîv e, yek hina qeşmîrê, heprî yek jî cotê xirxalan e. Ev tişt rindbûna yarê hinekî din zêde û xweş dike. Sarê hespê kimêt ji bo ku xîzêm tîxe Berîka Binxetê tê...



### **Kulîlk hene**

Kulîlk evîna şa'ir e. Kulîlka xwe û kulîlkên din dide ber hev. Temenê kulîlkan pir dirêj nînin. Hinek sibê heta êvarê dijîn, hinek kulîlk bejn aza ne çiyayan dilerizînin, hinek reng sor in dilan ji qefesa dil didizin; lê kulîlka wî di guldankan de naçilmise, narize.

“kulîlk hene kulîlka min, di guldanka dil de narizin” (r. 58)

Ev helbesta ku ji çar rêzan pêk hatiye ji serî heta dawiyê behsa kulîlkan dike. Serê her rêzê bi “kulîlk hene” dest pê dike. Mijara wê evînî ye. Qala meziniya hezkirina xwe û cudatiya dilê xwe kiriye.

### **Pirs**

Jiyan heger pirs be mirin jî bersiva wê ye. Hinek mirin hene di tûrê jiyane de ne û li pişt merivan in. Di vir şa'ir pirsekî ji hezkiriyê dilê xwe dipirse. Berê pirsê ji bo wî wateya mirinê çiyê wê dibêje. Mirin a wî bêyî wê bûn e, ji wê dûrbûn, li cem wê nebûn e.

“Mirin bêyî te bûn e  
Mirin ji te dûrbûn, li cem te nebûn e  
Dimirim dimirim bê te  
Ku ez bimirim, tu ê çi bikî bi tenê?” (r. 59)

Peyva mirinê pênc caran dubare kiriye. Di rêza sêyem de du caran li pey hev dibêje “dimirim, dimirim”. Bi vê gotina zixm wateya mirinê tîrsa tenêtiyê dike dilê wê kesa ku li hember wî ye. Dibêje jiyana min bêyî te nabe. Heger tu tunebî ez dimirim, ji aliyê din ve jî meraq dike mirina wî ji bo wê çi îfade dike û vê pîrsa giran û bêbersiv dipirse: dipirse ji ber ku mêr piçekî çavnebar in. Çavê wan li şûn de dimîne.

“Ku ez bimirim, tu ê çi bikîbi tenê” (r. 59)

### **Ji kişweran payîz e niha!**

Helbestên vê pirtûkê bi gelemperî kin in. Helbestên dirêj yek jî va ye. Helbest ji çar beşan pêk hatiye û her sê beşên ewil ji pênc rêzan ya dawiyê ji şeş rêzan ava bûye. Di serî de ithafî yekî kiriye. Gotiyê “bo wê yekê...” helbest bi nîgaşên zixm bi hestên evînî bi derbasbûna demê, dema xwe digre.

“Bo wê yekê...  
 Sal him bi him zeman pîr dikin.  
 Heyv li kevan e geh, geh roj li ava  
 Bi kêlî û saet, bi roj û şev, bi av û hewa  
 Dem kal, ez pîrekal, zeman lal...  
 Delalê, ji kişweran payiz e niha!” (r. 60)

Kişwera payîzê axiriya temenê merivan temsîl dike. Bihar zaroktî be havîn cîwantî ye. Dem pêvajoyeke dirêj e. Ji saniyan, deqîqan, seetan, şev û rojan, hefte û mehan pêk tê. Piçûk piçûk mezin dibe. Derbasbûna demê ketiye nav rîzên helbestê. “Sal him bi him zeman pîr dikin.” Bi rastî pîrbûna demê ne gengaz e lê helbestvan kalbûna xwe dide ser demê. Heyv li kevan be, roj li ava be; kêlî û saet, roj û şev biguhere dem kal bûye, şa’ir pîrekal û zeman jî lal bûye. Wexta ku dibêjê zeman kal bûye li piştî wê rîzê sê xalan datîne. Ev sê xal wateya rîzê temam dikin. Ji ber ku ên lal nikarin bipeyivin, bi îşaretan li hev tên. Kişwera payîzê kalbûna dem û şa’ir e. Şa’ir di vir de jî xwe ji demê azad nagire. Ew û dem bi hev re bûne payîz. Sedema van gotinan jî delalek e.

“Payîz e dem dê xwe veguhere guherêk din  
 Kêlî ê nepirsin ji te bo bibin saet  
 Ê roj dê raneweste li te bo nebe şev;  
 Roj derew, şev derew, zeman nakeve xew...  
 Demsal e... ji kişweran payiz e niha!” (r. 60)

Di vê beşê de ketiye ferqa demê. Dizane ku dem nakeve xewê. “Payîz e dem dê xwe veguhere guherêk din” di vê rîzê de peyva guherê bala merivan dikişîne. Guher di jiyana Kurdan de peyvek ne xerîb e. Şivan pezên xwe şevê li dû çêrandinê dike guherê ango dike mexel. Guher cihê rawestbûnê ye. Piştî payîzê zivistan tê. Zivistan dema mirinê ye rawestgeheke ebedî ye. Naxwaze demê ji wê bipirsin, heger bipirsin kêlî nabin saet, roj nabe şev. Ew dibe sedema sekinandina demê. Lê hin tişt nayên guherandin û vê rastiyê wiha tîne ziman:

*Roj derew, şev derew, zeman nakeve xew...* Ev rîz dibêje ku dem li ser me bibandor e. Dem ne kal dibe, ne lal dibe ne jî disekine.

“Siltanê herwext e, kî ye ne hêsîrê zeman  
 Qurteke av in kêlî, jiyîn hilmek e bêguman  
 Aveke diherike her çem her çem, ber bi derya mirinê ve  
 Ne serî ne binî bi hemînî diherikî li vê  
 Çemek dimiçiqe herhal... ji kîşweran payîz e niha!” (r. 61)

Di destpêka zeman de heta îro pir camêr, pir egît, pir siltan hatine û li ber hukmê demê bi revê ketine. Siltanê siltanan dem e, herkesî kal û pîr dike û ji xwe re dike hêsîr. Kêlîkê dişibîne qurteke av meriv avê vedixwe û av diqede. Kêlîk hêdî hêdî dibe dem. Jiyana nefesek e ku here hew nayê. Jiyîn ber bi derya mirinê ve diherike. Dem payîze temen ber bi mirinê ve herikiye û qediya ye.

“Li xwe vejerî, pelên katjimêrê bidî hev  
 Deh cild roj, deh cild şev dê bêne ser hev!  
 Li şûna temenekî tu ê çi bikî ji tomarek pel?  
 Rûnî bisojinî wan yeko yeko  
 Tu yê temenê min û xwe bisotînî,  
 Tu ê rojekê jî venegerînî ji zeman!” (r. 61)

Meriv çawa li xwe digere, pelê katjimêrê çawa dide hev? Gelo mihaseba temenê xwe dike? Temenê meriv were nivîsandin ji şevan ji rojan çend cild pirtûk dike? Jiyana tê jiyîn û a tê nivîsandin ne yek e. Jiyîn di nava xwezaya xwe de digevize.

Em wexta ku li hemû şî'rê dinêrin di alî wateyê û teşeyê de tevahiyekî dibînin. Di vê helbestê de jî dûbarekirina peyvan domandiye. Minak “dem kal, ez pîrekal, zeman lal...” Ev nîgaş jî di alî wêjeyê de balkêş û nû ne: derya mirinê, qurtek e av in kêlî, jiyîn hilmek e bêguman...

### **Tembî**

“Yan li kendalên dil bikole  
 Yan jî li perên xewle çiyayekî  
 Şerm e şa'îrekî çiyayî dahêjin gornê  
 Li goristaneke kêl kerr

Li ber guhên zirr-bajarekî” (r. 62)

Şa’ir di ferqa mezinahiya xwe de ye. Xwe şa’irekî mîna çiya dibîne, mîna çiyana bilind û biheybet e. Bi mirinê naxwaze jiyana wî bi dawî bibe. Dixwaze ku merqeda wî zindî be wek dilan. Ji ber vê yekê tembî dike, dibêje:

“Yan li kendalên dil bikole  
Yan jî li perên xewle çiyayekî” (r. 62)

Em dikarin bibêjin dudiliyek di dilê wî de heye. Di aliyekî de dixwaze di dil de bijî, neyê jibîrkirin, di aliyê din de çiyayekî xewle dixwaze. Çiyayên xewle jiyana şa’iran temsîl dike. Şa’ir bi piranî mirovên bi serê xwe ne, ji tenêtiyê hez dikin, tenê dijîn. Heger di vî pacê de em lê binêrin em dikarin bibêjin şa’ir bi mirina xwe carek din jî bijî, di nava xewlebûna xwe û çiyê de bibe meraq di nava merqedan de. Çiya hema hema di hemû helbestên şa’ir de derbas dibin.

### Çarîn

“Kê negot, ax! Û neçû?  
Kî nebû ax... û neçû?  
Felek, qajikê bicû  
Arjen jî dil bi dax neçû?” (r. 63)

Di çarînê de peyva “ax”ê bala merivan dikişîne. Ax peyveke pir bi wate ye. Hem tê wateya xweliyê, erdê hem jî tê wateya hesret kişandinê. Di rêza ewil de “kê negot, ax! Û neçû” dibêje. Ango di dilê herkesê de ax û hesret hene. An jî di dilê herkesê de axa welatê wan heye û ev ax dibe axa axê. A dudyan de dibêje “kî nebû ax... neçû?”. Ango herkes bi kişandina axan dimire û di gorna xwe de dibe xwelî, ax. Piştî peyva axê danîna sê xalan jî watedar e tê wateya hetayê, bêdawîtiyê.

Di rêza sêyem de lomek ji felekê hatiye kirin. Felek, tu dibêjî qey tu tişt nebûye wer tevdigere, benûştê xwe dicû, tinazan bi merivan dike. Piştî xwe jî dixwe nava helbestê û dibêje : “Arjen jî dil bi dax neçû?” vê felekê dilê Arjen jî dax kiriye.

## ENCAM

Arjen Arî nivîskar, helbestvan û dilbirînê erdnîgariya wêjeya Kurd e. Erdnîgariya ku li ser dijî çawa asê û perçekirî ye helbesta wî jî asê û perçekirî ye. Di helbesta wî de peyv rola dûrbînê dibînin. Ew li dû tiştê ye, tiştên jê hatine dizîn an jî jê hatine veşartin. Ev tişt; yek azadî ye, yek evîn e, yek jî ax e. Ev her sê mijar di helbesta wî de derdikevin pêş. Azadî bi mirin e, evîn di binê barê erotîzmê de ye, ax jî bi xwîn e.

Herî zêde peyva azadiyê, ya mirinê û ya axê bikar aniye. Ji ber ku li ser axa xwe bi azadî bijî mirin derketiye pêşiya wî.

Zimanê Arjen Arî piçekî giran e. Bandora devoka Mêrdînê li ser e. Meriv dikare ferhenga helbesta wî derbixe. Helbesta wî ji jiyana wî derdikeve. Helbestên wî yên civakî jî ên şexsî jî dişibin erdnîgariya li ser jiyaye. Serpêhatiyên wî, kesên ku di jiyana wî de tesîr kirine ketine nav helbesta wî.

Helbestên wî bi gelemperî kurt in. Ên ku mîna çîrokan dirêj in an bûyerekî vedibêjin an jî teswîra dîmenekê dikin. Di vê xalê de meriv dikare bibêje teknîka sînemayê jî bikar aniye.

Arjen Arî helbestvanekî nûjen be jî piştî xwe bi kevneşopiyê ve nekiriye. Ew bi formata çarînê nêzikî Baba Tahirê Uryan dibe, bikaranîna gotinên pêşiyên û hin helbestên xwe yên gelêrî nêzî stranbêj û dengbêjan dibe. Ew bi sê rihan dijî û bi çavên Evdalê Zeynikê hîs dike.

Navên pirtûkên helbestên wî şî'ra wî didin dest. Di "Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî" de mijarên helbestan bi piranî civakî ne. Di "Ev Çiya Rûspî ne" de jî çiya û civat tevlihev in. Di "Şêrgele" de jî yên civakî û kesayetî bi hev re ne. Di "Çilçarinê" de bi formata çarînan, biwêj û gotinên pêşiyên dide ber çavan. Di "Eroûtîka" yê de jî helbestên erotîk nivîsîne. Di pirtûka xwe ya "Destana Kawa û Azhî Dehaq" de jî destana Kurdan a kevn bi formateke nû nivîsiye. "Şî'ir û Sînor" jî dişibe "Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî" û "Ev Çiya Rûspî ne". Di "Payiza Peyvê" de şeweyên nû ceribandine û mijar neguheriye.

Di alî dirûv de helbesta wî herî zêde bi nezma serbest hatiye nivîsandin. Çarîn, malik û şiklê helbesta gelerî jî bi kar aniye. Helbesta wî lîrîk û epîk e. Ji dubarekirina peyvan hez dike, heta em dikarin bibêjin asonans û aliterasyon îskeletê helbesta wî teşkil dikin. Peyvên nêzî hev, dengên wek hev hema di her şî'ra xwe de bi kar aniye. Nîgaşên zexm, şibandînen xurt di helbesta wî de hene.

Her çiqas ew bibêje “ez şagirtê dibistana Cegerxwîn im” jî em dikarin bibêjin helbestvanekî xweser e. Deng û sedayek xweş hiştiye ji bo helbesta Kurdî. Rasterast di bin bandora kesî de nîne, lê di paşerojê de bandora wî dê gelek zêde bibe ku xelata ku li ser navê wî hatiye danîn jî vê angaştê me piştrast dike. Cihê helbesta wî ya nûjen di nava wêjeya Kurdî de girîngiya xwe diparêze.

## ÇAVKANÎ

- Alan, Remezan, *Bendname Li Ser Rihê Edebiyatekê*, Avesta, İstanbul, 2009.
- Arî, Arjen, *Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî*, Wêşanên Avesta, (Çapa Yekem) Stenbol, 1999.
- Arî, Arjen, *Ev Çiya Rûspi ne*, Wêşanên Avesta, (Çapa Yekem) Stenbol, 2002.
- Arî, Arjen, *Destana Kawa û Azhî Dehaq*(Kurdî-Tirkî), Wêşanên Evrensel Basım Yayın, (Çapa Yekem), İstanbul, 2011.
- Arî, Arjen, *Eroûtika*, Wêşanên Lîs, (Çapa Yekem), Stenbol, 2006.
- Arî, Arjen, *Bakûrê Helbestê/Antolojiya Helbesta Bakûr*, Wêşanên Evrensel Basım Yayın, (Çapa Yekem), İstanbul, 2011.
- Arî, Arjen, *Şêrgele*, Wêşanên Avesta, (Çapa Yekem), İstanbul, 2008.
- Arî, Arjen, *Çil Çarîn*, Wêşanên Enstituya Kurdi ya Amedê, 2009.
- Arî, Arjen, *Payîza Peyvê*, Wêşanên Belkî, (Çapa Yekem), Diyarbakır, 2011.
- Arî, Arjen, *Şi'ir û Sînor*, Evrensel Basım Yayın, (Çapa Yekem), İstanbul, 2013.
- Arî, Arjen, *Bîhoka Li Pişt Sînor*, Çîrok/Bîranîn, Wêşanên Avesta, (Çapa Yekem), Stenbol, 2010.
- Arî, Arjen, *Kulîlkên Be'îvan*, Hevbestîn, Wêşanên Ronahî, (Çapa Yekem), Amed, 2012.
- Arî, Arjen, *Gorî û Bindest*, Vebêjî, Wêşanên Ronahî, (Çapa Yekem), Amed, 2012.
- Arî, Arjen, *Xasenezzer*, Ceribîn, Evrensel Basım Yayın, (Çapa Yekem), Stenbol, 2013.
- Akar, Atilla, *Erotizm*, BDS Yay., İstanbul, 1999.
- Alkan, Erdoğan, *Şiir Sanatı*, İnkılap Kitabevi, İstanbul, 2005.
- Batur, Enis, *Yazının Ucu*, Yapı Kredi Yay., İstanbul, 1993.
- Dilçin, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu yayınları, Ankara, 2004.
- Toklu, M.Osman, *Şiir Dili ve Çevirisi*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2003.
- Korkmaz, Ramazan, *İkarosun Yeni Yüzü Cahit Sırkı Tarancı*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2002.
- Çetin, Nurullah, *Şiir Çözümleme Yöntemi*, Öncü Kitap yayınları, Ankara, 2013.
- Özel, İsmet, *Şiir Okuma Klavuzu*, Şûle Yayınları, İstanbul, 1997.
- Uç, Himmet, *Şiirimize Estetik ve Felsefî Bakışlar*, Bizim Büro Basımevi, Ankara, 2005.
- Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Wêşanên Nûbihar, Stenbol, 2010.

Yalçın, Mehmet, *Şiirin Ortak Paydası I*, İkaros Yayınları, İstanbul, 2010.

Kovara W, jimar 32, Gulan-Puşber 2010.

Kuran- Kerim ve Açıklamalı Meali, Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2012.

<http://web.telia.com/~u63802125/Xaneper/Hemsida/Nivisar/Kurdimak/xanievin.html>  
12.06.2105

<http://www.cekulvakfi.org.tr/haber/insan-yasadigi-yere-benzer>, 24.12.2014

[http://turkishstudies.net/Makaleler/167994447\\_14Ak%C4%B1nC%C3%BCneyt-edb\\_S-185-193.pdf](http://turkishstudies.net/Makaleler/167994447_14Ak%C4%B1nC%C3%BCneyt-edb_S-185-193.pdf), 25.12.2014

<http://turkoloji.cu.edu.tr/YENI%20TURK%20DILI/9.php>, 25.12.2014

<http://kuran.diyaret.gov.tr/Kuran.aspx#12:5>, 26.12.2014

<http://www.hayyam.com/omer-hayyam/secme-dortlukler/> 25.12.2014

<http://www.antoloji.com/sakarya-turkusu-siiri/> 26.12.2014

[http://turkoloji.cu.edu.tr/YENI%20TURK%20EDEBIYATI/mustafa\\_apaydin\\_ahmet\\_hasim.pdf](http://turkoloji.cu.edu.tr/YENI%20TURK%20EDEBIYATI/mustafa_apaydin_ahmet_hasim.pdf) , 01.01.2015

<http://www.antoloji.com/kara-toprak-2-siiri/> , 10.01.2015

<http://www.antoloji.com/ey-savasin-bassehri-beyrut-siiri/> 24.12.2014

<https://tr.wikipedia.org/wiki/%C5%9Eiir> 12.06.2015

<http://dergipark.ulakbim.gov.tr/mersinjl/article/download/> 17.06.2015